DİJİTAL KÜTÜPHANE KANALI

# Keyifli Okumalar Dileriz

Binlerce kategoride milyonlarca PDF e-kitap, ders kitapları, dergiler ve romanlara platformumuz üzerinden ücretsiz ulaşabilirsiniz.

RESMİ WEB SİTEMİZ

https://rantey.org

Yedek ve Duyuru Kanallarımız
Sitemize erişim engeli gelmesi veya adres değişikliği durumunda aşağıdaki kanallardan güncel giriş adresine erişebilirsiniz:

• Telegram: https://t.me/birkitapbir

• WhatsApp Kanalımız : https://whatsapp.com/channel/0029VbDHv8uE50Us4IvMoc0Y

**ME DI DIL DA HEYE NAREK KU DISOJIT SEQERÊ**

XEBATEK DERBARÊ BINPÊKIRINA MAFÊN HUNERMENDÊN KURD LI SER MÎNAKA MUZÎKJEN Û ŞANOGERAN

*Risteyeke Melayê Cizîrî ku di helbesta 'Ey Nesîmê Sibehê' da derbas dibe.

Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

İSMAİL BEŞİKCİ VAKFI

İSMAİL BEŞİKCİ VAKFI

# ME DI DIL DA HEYE NAREK KU DISOJIT SEQERÊ

## XEBATEK DERBARÊ BINPÊKIRINA MAFÊN HUNERMENDÊN KURD LI SER MÎNAKA MUZÎKJEN Û ŞANOGERAN


**WEQFA ÎSMAÎL BEŞÎKÇÎ**

Kuloğlu Mah. İstiklal Cad. Ayhan Işık Sok.

No: 21 – Beyoğlu / İstanbul

TEL: 0 (212) 245 81 43

**Kordînatora Projeyê:** Ayşe Tepe Doğan

**Hevdîtin û Deşîfrasyon:** Tofan Sünbül

**Lêgerîna Medyayê:** Mevlüt Oğuz

**Sêwirandin:** Şener Özmen

TÎRMEH 2021

ismailbesikcivakfi

ibesikcivakfi

ismailbesikcivakfi

www.youtube.com/user/ismailbesikcivakfi

**E-mail:** info@ismailbesikcivakfi.org

www.ismailbesikcivakfi.org

https://kurttarihidergisi.com

Uluslararası İnsan Hakları Çerçevesine Uyumun İzlenmesi için ETKİNİZ AB PROGRAMI

Ev weşan di çaroveya Bernameya YE-Bandora We da bi piştevaniya aborî ya Yekîtiya Ewrûpayê hatiye amadekirin. Weqfa Îsmaîl Beşîkçî (WÎB) bi tena serê xwe ji naveroka vê weşanê berpirsiyar e û bi çu awayî nêrînên Yekîtiya Ewrûpayê temsil nake.



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

# ME DI DIL DA HEYE NAREK KU DISOJIT SEQERÊ

## XEBATEK DERBARÊ BINPÊKIRINA MAFÊN HUNERMENDÊN KURD LI SER MÎNAKA MUZÎKJEN Û ŞANOGERAN

Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

Me risteya “Me di dil da heye narek ku disojit seqerê” ya Melayê Cizîrî ku wek lûtkeya helbesta klasîk a Kurdî tête hesabkirin, kire serenav bo vê xebata ku li ser mînaka muzîkjen û şanogeran bipêkirina mafên hunermendên Kurd dike mijara xwe. Wek ku ev xebat bi xwe jî nîşan dide di dilê hunermendên Kurd da agirekî hunerê heye ku têra hemû astengiyên cehenemî yên li hemberî wan dike. Ew bi hêza vî agirê hunerê hunera Kurdî derbasî roja me dikin.

Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

## NAVEROK


7 KURTEYA RÊVEBIRIYÊ

11 DESTPÊK

13 Qewareya Xebatê

16 Rêbaz û Çarçoweya Teorîk

19 Li Tirkiye'yê Polîtîkayên Çand-Hunerê û Kurteserpêhatiya Hunera bi Kurdî

22 Rabûna Qedexeyên li ser Kurdî

24 Standartên Navneteweyî Yên Bingehîn û Xalên Pêwendîdar Ên Ku Ev Xebata Derbarê Mafan Pala Xwe Didê

25 Peymana Navneteweyî ya Mafên Aborî, Civakî û Çandî ya Neteweyên Yekbûyî (NY)

27 Peymana Derbarê Mafên Medenî û Siyasî

29 Peymana Navneteweyî ji bo Berterefkirina Hercure Cudakariya Nîjadî (IAOKS)

30 Peymana UNESCO'yê ya Parastin û Pêşvebirina Curbicuriya Îfadeyên Çandî

30 Biryara Tembîyê ya UNESCO'yê Derbarê Parastina Statûya Hunermendan

32 BINPÊKIRÊNÊN MAFAN LI HEMBERÎ MUZÎKJENÊN KURD

33 Qedexeya Zimanî û Bandora Wê li ser Arastebûna Hunerê

35 Bandora Bêstatûbûna Zimanê Kurdî li ser Nêrîna Malbat û Derdora Civakî ya Derbarê Hunera Kurdî

38 Binpêkirinên Mafan yên Derbarê Helwestên Fermî û Popûler li hemberî Kurdîyê

40 Zehmetî û Binpêkirinên Mafan yên ku ji Kêmbûna Mekan û Sahneyan Der Tên

43 Binpêkirinên Mafan yên ku ji Îstîsmara Aborî Der Tên

44 Îstîsmara Aborî ya Xwedanên Mekanan

46 Îstîsmarên Aborî yên ku ji Peymanên Telîfê yên Şirîkeyên Muzîkê Der Tên

46 Binpêkirinên Mafan yên ku ji Hewlên Şirîkeyên Muzîkê yên Dîyarkirina Naverokê Der Tên


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

47 Bandorên Neyînî yên Pisgirêkên Aborî li ser Jiyana Civakî ya Hunermendan

48 Helwest û Kiryarên Cudakar yên li Cihê Kar Têne Dîtin

49 "Şîdeta Bêdengiyê": Bêdengîya Otorîteyên Dewletî û Saziyên Hunerê li hember Daxwazan

50 Binpêkirinên Mafan yên ji ber Bayê Siyasî

50 Ji TRT 6 heta TRT KURDÎ'yê Vebûna Dewletê ya Zimanê Kurdî û Sînordariyên Wê

53 Fikra Gefa li ser Ewlehiyê û Hêzên Ewlehiyê yê Dewletê

56 Sansûr û Otosansûr

58 Bidawîbûna "Dîyalog" / "Pêvajoya Çareseriyê" û Vegera "Rewşa Awarte"

62 **BINPÊKIRINA MAFAN LI HEMBERÎ ŞANOGERÊN KURD**

62 Qedexeya Zimanî û Bandorên Wê Li Ser Tercîhkirina Hunerê

66 Azadiya Berteng Bo Kurdî û Bandora Wê Li Ser Meyîlkirina Bo Zimanî

68 Binpêkirina Mafan yên ku ji Zehmetiyên Aborî û Psîkolojîk Der Tên

68 Zehmetiyên Aborî

69 Kêmasî/Nebûna Piştevaniya Sazûmanî

73 Astengiyên Psîkolojîk û Binpêkirina Mafan

74 Kiryarên Cudakar

74 Di Pêşkêşiyên Lîstikên bi Kurdî da Astengiyen Fîilî

77 Şîdeta Bêdengiyê – Min Nedîtîye... Nebihîstîye... Nizanim... Destûrê jî Nadim

80 Bayê Siyasî û Binpêkirina Mafan

85 Sansûr û Otosansûr

87 Mîhrîcan û ji TRT 6'ê ber TRT KURDÎ'yê ve 'Vebûna' Kurdî ya Dewletê

90 **Pêşniyazên Hunermendan Derbarê Berterefkirina Bınpêkirinên Mafan**

92 **Nirxandin û Pêşniyaz**

Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

# KURTEYA RÊVEBIRIYÊ

Ev xebat dike armanç ku binpêkirina mafên muzîkjen û şanogerên ku bêtir hunera xwe bi Kurdî îcra dikin bi rehendên qanûnî, sîyasî û çandî derxîne holê û ferqdariyekê derheqê binpêkirina mafan da pêk bîne. Bi vî awayî xebat hewl dide ku bibe hevparê avakirina polîtîkayeke sivîl û demokratik bo hunermendan ku têda hunera xwe bi awayekî azad îcra bikin.

Heta ku di pêvajoya endamtiya Yekîtiya Ewrûpayê (YE) da bi awayekî piranîparêz hate pênasekirin û hemû zimanên li welatî tên axaftin wergirte nava xwe, li Tirkiyeyê çand û huner tenê li ser zimanê Tirkî dihate pênasekirin. Lê belê îcrayên Kurdan li qada çand û hunerê her diçe zêde dibe, lewma pêwîstî pê çêbû ku pirsgirêkên wan yên li vê qadê bêne analîzkirin. Herçend li hinek raporên vê dawiyê li ser sansûr û qedexeyên qada çand û hunerê hatine amadekirin, cih dabine binpêkiran mafên hunermendên Kurd jî[1] hêj jî li ser binpêkirina mafên hunermendên Kurd xebateke serbixwe nehatiye rêvebirin. Bi vî awayî ev rapora berdest xebata ewil e di qada xwe da.

Li Tirkiye'yê hemû çalakiyên hunerê yên bi Kurdî qedexe bûn heta ku sala 1991an qedexeyên li ser zimanê Kurdî bi awayekî sînordar hatine rakirin. Ji ber nebûna statûyeke fermî ya zimanê Kurdî, hunermendên ku hunera xwe bi Kurdî îcra dikin bêpar mane ji statûyeke ku wan dike xwedî heqê xebatên xwe. Hunermendên ku piştî sala 1991an bi rabûna berteng ya qedexeyên li ser zimanê Kurdî li saziyên çandê yên Kurdan berhevbûne, daxilî vê xebatê bûne digel hunermendên piştî salên 2000î bi berbelavbûna girseyî ya axaftina zimanê Kurdî ve derfet peyda kirine ku li Tirkiye'yê hunera xwe bi Kurdî îcra bikin,

1 Nenivîse! Nelîze! Neaxive! Rapora Derheqê Pestî û Sansûra Qada Çand û Hunerê. Platforma Çand û Hınerê ya CHPê, 2016. [Yazma! Oynama! Konuşma! Kültür ve Sanata Uygulanan Baskı ve Sansür Raporu, CHP Kültür ve Sanat Platformu, 2016.], Li Tirkiyeyê Sansûr û Otosansûr. Rebendan-2019-Mijdar 2019, Bêdeng Nebe 24, Platforma li Hember Sansûr û Otosansûrê. [Türkiye'de Sansür ve Otosansür: Ocak 2019-Kasım 2019, Susma 24, Sansüre ve Otosansüre Karşı Platform]. Portala nûçeyan a bi navê SiyahBand jî -ku kiryarên sansûrê yên qada hunerê lêdikolê, belge dike û analîz dike da ku hafizayekê ava bike- cih dide binpêkirina mafên hunermendên Kurd.



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

Sala 2009an û piştî hingê bo *Kêşeya Kurd* lêgerînên derveyî pevçûnê bûne rojev û pêvajoya danûstendinên endamtiya YE dest pê kir, lewma li Tirkiye'yê serdemeke nû peyda bû ku dê bandoreke mezin li ser jiyana siyasî û hunerî bikira. Dihate gotin ku hewl heye ji bo dûrketina ji polîtîkayên çandî yên binecih ku armanca wan asîmîlekirina gel û komên etnîk yên cuda bû. Xwetemsîlkirin û xweîfadekirina Kurdan bi rêya saziyên legal- di serî da rêvebiriyên herêmî-, li temamî welatî bicihanîna guherînên qanûnî û îdarî ji bo piştevaniya piranîparêziya çandî, hêvî û bendewarî zêde kirin ku Kêşeya Kurd dê bi veguherîna demokratik a Tirkiye'yê ve bête çareserkirin.

Ji ber ku bi "Vebûn" û "Pêvajoya Çareseriyê"yê ve girêdayî hatine bicihanîn, ji bo hunermendên Kurd îstîfadekirina ji mafên çandî li ser rûdanên sîyasî ava dibû. Vesazkirin ji beşdariya aliyên cuda dûr bûn û wekî kiryaya yekalî ya dewletî bûn, lewma jî gava ew bi navê "reform"an dihatine bicihkirin, nemimkûn bû ku kêmasiyên wan ji aliyê civaka sivîl ve bêne kontrolkirin. Çawa ku bi rêveberiya Rewşa Awarte [OHAL] ya ku sala 2016an hatîye îlankirin ve gelek komele, şanoyên taybet, atolyeyên hunerê û saziyên wekî wan yên qada çand û hunerê hatine dadan. Rapor li ser vê pêvajoyê û rûdanên piştî hingê hûr dibe û hewl dide ku sedemên pirsgirêkan analîz bike yên ku ji vesakirinên qanûnî û polîtîkayên hunerî derbûne.

Ji bo xebatê 15 jê muzîkjen û 15 jê şanoger, bi giştî li gel 30 hunermandan hevdîtinên nîv-sazkirî û hevdîtinên berfireh hatine pêkanîn. Herwiha li gel 2 şexsên ku li saziyên çandî yen Kurdan rêveberî kirine jî hevdîtin pêk hatine.

Di raporê da referans heye bo *Hevpeymana Lozanê, Beyannameya Navneteweyî ya Mafên Mirovan ya Neteweyên Yekbûyî (NY), Peymana Navneteweyî ya Mafên Aborî, Civakî û Çandî ya Neteweyên Yekbûyî (NY), Peymana Navneteweyî Derbarê Mafên Medenî û Siyasî, Peymana Navneteweyî ji bo Bertereſkirina Hercure Cudakariya Nîjadî (IAOKS), Peymana UNESCO'yê ya Parastin û Pêşvebirina Curbicuriya Îfadeyên Çandî, Biryara Tenbiyê ya UNESCO'yê Derbarê Parastina Statûya Hunermendan, Peymana Ewrûpî ya Mafên Mirovan*. Tirkiye aligirê van belgeyên navneteweyî ye.

Tirkiye berpirsiyariyên xwe yê ji *Hevpeymana Lozanê* bi cih naîne; digel wê jî ji bo paragrafên 3yem û 4em yên xala 13em ya *Peymana Navne-*



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

*teweyî ya Mafên Aborî, Civakî û Çandî ya Neteweyên Yekbûyî* (NY); ji bo xala 27em ya *Peymana Navneteweyî Derbarê Mafên Medenî û Siyasî* ku mafê sûdewariya ji çanda xwe, mafê bikaranîna zimanên xwe û mafê îbadeta bi dînê xwe ya kêmîneyên (minority) etnîk û dînî vesaz dike; ji bo xala 22yem ya *Peymana Navneteweyî ji bo Berterefkirina Hercure Cudakariya Nîjadî* (IAOKS) ku birina binpêkirina mafan bo Dîwana Adaletê ya Navneteweyî vesaz dike îhtirazên (rezervation) wisa destnîşan kirine ku ruhê peymanan birîn dike û bicihkirina wan nemimkûn dike.

Di lêkolînê da ji beşdaran hate pirsîn ka astengiyên qanûnî û fîlî çi ne li hemberî îcraya hunera bi Kurdî; ka helwesta dewletê û ya saziyên taybet çi ye li hemberî hunera bi Kurdî û ka piştevaniya wan heya yan nîne. Herwiha pirsên wisa jî hatine pirsîn û li ser raporê hatine zêdekirin: Gelo di navbera vesazkirinên qanûnî û polîtîkayên hunerê yên dewletê hevgirî heye? Gelo ew hevgirî û nehevgirî çawa bandorê li binpêkirina mafên hunermendên Kurd dike? Gelo di navbera atmosfera siyasî û binpêkirina mafan da pêwendî heye? Dîsa pêşniyazên beşdaran hatine wergirtin ka dê kîjan vesazkirinên qanûnî wan binpêkirinan berteref bikin.

Di encama xebatê da dîyar bû ku vesazkirinên (regulation) derheqê Kurdî da bi xûmamî ne û vekîrî ne bo şîroveyan û rayedarên dewletê li gorî atmosfera siyasî rewşên awarte ava kirine ku îstîfadekirina ji mafan asteng dikin. Hate dîtin ku qedexe û astengiyên fîlî ne tenê ji aliye saziyên dewletî herwisa ji aliyê sazî û şexsên ku pişta xwe didin polîtîkayên çandî yên dewletê jî têne bicihanîn. Wek encam, ew nêrîn bûne sedemê cudakarî, otosansûr û derdê debarê, lewma îcrakirina hunera bi Kurdî bi zehmet xistine.

Li beşa encam û pêşniyazan hatiye îfadekirin ku bêterefbûna dewletê an jî ihtiraza wê bo peymanên bingehîn û peymanên ku hinek mafan bi taybetî vesaz dikin nayê wateya hindê ku ew nemecbûr e bide pey “qedexeya cudakariyê”, lewma ji Tirkiye’yê tê daxwazkirin ku îhtirazên xwe yên bo peymanên navneteweyî rake. Ev rapora berdest li pişta wê nêrînê ye.

Ji bo ku zimanê Kurdî li qada çand û hunerê cihê xwe yê heqkirî wergire û bi peş bikeve, bi awayekî aşkere divê vesazkirinên qanûnî û pratîkî bêne kirin da ku Kurdî pêşdibistan têda li hemû astên perwer-


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

deyê bê bikaranîn. Lewma hatiye daxuyandin ku ji bo parastin û bipêşvebirina Kurdî û zimanên dîtir, di serî da perwerde, li her qadê vesazkirinên îdarî û fiîlî bêne bicihanîn. Girîng e ku ji bo piştevaniya çalakî û hilberînên hunerî, nêrînên cudakar bên berdan û bikerên kiryarên keyfî bên cizakirin. Hewce ye di serî da konserwatûwara Kurdî, ji bo hemû qadên hunerê li zanîngehan beş bêne vekirin û xebat bêne birêvebirin. Herwisa hewce ye wek ku di peymanên navneteweyî da hatiye garantîkirin, dewlet wisa piştevaniya hunermendan bike da ku ew bigehin asteke aborî bo îcrakirina hunera xwe û hunermendên ku hunera xwe bi Kurdî îcra dikin jî bêyî cudakarî ji wê piştevaniyê sûdê wergirin.


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

# DESTPÊK

Sala 1996an albûma muzîkê ya fîlmê *Mem û Zîn* hate weşandin. Fîlm li ser mesnevîya destana evînê ya klasîk *Mem û Zin*ê hatibû kêşandin ku ji hêla Ehmedê Xanî (1651-1707) ve sedsala 17em bi Kurdî hatiye nîvîsandin. Di despêka albûmê da serpêhatiyeke sala 1943yê ya Musa Anterê ku sala 1991an di fîlmî bi xwe jî da lîstiye, tête weşandin: Wextê ew midûrê Yurda Xwendekaran ya Dicle-Firatê bûye, rojekê polîs bi der yurdê da digirin û wî bi tep û mistan desteser dikin. Anterê bêhay ji sûcê xwe hewl dide meseleyê fehm bike, di wê navberê da qomser jê dipirse ka "*radyo û plaka wan heye*? " Anter dibêjê "*heye* ". Li ser hindê qomser hêrs dibe û dibêje "*Be segê kurê segan, ev qas plakên xweşîk ên bi Tirkî hene, vêca çi gûxwarin e hûn li yurdê bi Kurdî fîtikan vedidin*?" Li dadgehê Musa Anter dibêje wî bi Kurdî stran negotine, tenê fîtîk vedane, li ser hindê jî dadwerê mehkemeyê bi îmayî dibêje "*Jixwe tiştekî ku kêm zêde ji 20 dengan pêk tê nabe ziman*." Musa Anter jî dibêje "*Wexta em zarok bûn mirîşkên me bi xwe ji bîstan zêdetir deng derdixitin dadwer beg … ma me bi qasî mirîşkan jî mejî tune ye*?" Di encama mehkemeyê da Musa Anter bi tewanbariya "Vedana fîtîkên bi Kurdî" tê girtin û bo girtîgehê tê hinartin.

Ev serpêhatiya Musa Anter ku incax sala 1996an di albûmeke da hatiye weşandin, xwedî sewteke dilmayî lê xweşbîn bû derheqê nîşandana cihê hunera Kurdî ku derfetên îfadekirinê ji dest hatine wergirtin.

Dîsa lîstika şanoyê ya bi navê *Birîna Reş* ku Musa Anter di hicrika girtîgehê da nivîsandî û sala 1965an hate weşandin, lê qet derfeta pêşkêşiyê peyda nekir. Herwisa hunermendên wekî Mihemed Arif Cizrawî, Eyşe Şan, Nizamettin Arîç û Şivan Perwer mecbûr man hunera xwe li dûrî welatê xwe îcra bikin û tenê ji bandên ku bi qaçaxê dihatine nava welatî an jî bi ji radyoyên Êrîvan û Bexdayê ku bi saetên sînordar weşan dikirin, dihatin guhdarîkirin.

Li Tirkiyeyê muzîk û şanoya bi Kurdî qedexe bûn heta sala 1991an ku bi vesazkirineke qanûnî qedexeyên li ser zimanê Kurdî bi awayekî berteng hatine rakirin. Digel hebûna atmosfereke azad û demokratik ji bo pêş-


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

veçûna hunerê divê bi zimanê ku huner pê tête îcrakirin perwerde jî bête wergirtin. Gava mirov pêwîstiya binesaziya sazûmanî û piştevaniya aborî jî hisab bike, ziyana qedexeyên li ser hunera bi Kurdî ya bi dehsalan baştir xuya dibe. Îcraya hunera bi Kurdî piştî vesazkirina qanûnî ya sala 1991an ji statûya çalakiyeke der-qanûnî xilas bûye. Piştî hingê sala 1999an li Lûtkeya Helsinkîyê, Tirkiye daxilî pêvajoya danûstendinên emdamtiya YE bû û hunera Kurdî bi rêya vesazkirinên qanûnî yên 'pêvajoya hevahengî/reforman a YE' ve li qada sivîl derfetên xweîfadekirinê peyda kir.

Digel vê yeke, li ser hevdîtinên li gel hunermendên Kurd û herwisa nivîsandin û awayê tetbîqa wan, dê vesazkirinên qanûnî bêne analîzkirin ka gelo ew bûne perçeyek ji polîtîkayên pirçandî yên neteweyî û ka gelo dewlet bi awayekî sazûmanî piştevaniya pêşveçûna hunera Kurdî dike.

Ev xebat dike armanç ku li ber sîya peymanên navneteweyî yên ku Tirkiye'yê jî îmze kirine, li ser binpêkirina mafên muzîkjen û şanogerê Kurd disekine yên ku hunera xwe bi giranî bi Kurdî îcra dikin û hewl dide wan binpêkirinan bi rehendên qanûnî, siyasî û çandî derxîne holê.

Armanceke din a xebatê jî ew e ku ferqdariyekê derheqê binpêkirina mafan da pêk bîne û bi vî awayî bibe hevparê avakirina polîtîkayeke sivîl û demokratik bo hunermendan ku têda hunera xwe bi awayekî azad îcra bikin.

Heta vesazkirinên qanûnî yên ku di pêvajoya endamtiya YE'yê da hatine pêkanîn, li Tirkiye'yê çand û hunera neteweyî tenê li ser zimanê Tirkî dihate pênasekirin. Di pêvajoya hevahengîya YE de hinek pêngav hatine avêtin bo ku çand ji nû ve bi awayekî piranîparêz bête pênasekirin da ku zimanên cuda yên li Tirkiye'yê wergire nava xwe. Lewma bi saya wê pêvajoyê hebûna hunermendên Kurd li qada çand û hunerê her çûye zêdetir xuya bûye. Dîsa jî di tetbîqa vesazkirinên navborî da ji ber pirsgirêkên şexsên ku hêza desthilatê di dest da bû û ji ber politikaya çandî ya yekparêz û neteweperest ya binecih, mifadariya ji mafen qanûnî di fîîliyatê da têne astengkirin. Ji ber hindê, digel hebûna vesazkirinên qanûnî jî, analîza binpêkirina mafên hunermendên ku hunera xwe bi Kurdî îcra dikin, wek pêwîstîyek peyda bû.

Rûdanên binpêkirina mafên hunermendên Kurd di vê xebatê da li ser du bingehan têne analîzkirin: Binpêkirinên mafan yên ku ji formûlekirin û awayê bicihanîna qanûnê heyî der dibin û binpêkirinên mafan yên ku gava dewlet berpirsiyariyên xwe yên asta neteweyî û navneteweyî bo piş-


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

tevaniya huner û hunermendan bi cih naîne, der dibin.

Herçend li hinek raporên vê dawiyê li ser sansûr û qedexeyên qada çand û hunerê hatine amadekirin, cih dabine binpêkiran mafên hunermendên Kurd jî[2] hêj jî li ser binpêkirina mafên hunermendên Kurd xebateke serbixwe nehatiye rêvebirin. Bi vî awayî ev rapora berdest xebata ewil e di qada xwe da ku hewl dide -wextê bi zimanê xwe yê zikmakî hunera xwe îcra dikin- binpêkirina mafên hunermendên Kurd analîz bike. Em hêvîdar in ku ev xebat bibe wesîleya nîqaşên berhemdar ji bo çareserkirina pirsgirêkan; rê li ber xebatên berfirehtir veke û bibe hevparê peydakirina çareseriyan bo pirsgirêkan.

## Qewareya Xebatê

Li Tirkiye'yê hemû çalakiyên hunerê yên bi Kurdî qedexe bûn heta ku sala 1991an qedexeyên li ser zimanê Kurdî bi awayekî sînordar hatine rakirin, lewma jî hunermendên ku hunera xwe bi Kurdî îcra dikin bêpar mane ji statûyeke fermî. Ji ber hema bêstatûbûnê wan nikariye li hemberî qanûnan bibin kirdeyên xwedan maf. Musa Anter ji bo strana Kurdî ya ku bi fîtîkan gotibû û ji bo lîstika şanoyê ya ku li hicrikê nivîsîbû û qet derfet nedîtibû bo pêşkêşiyê qet derfet nedîtiye li mafê xwe bigere. Herwisa hunermendên wekî Nizamettin Arîç û Şivan Perwer nikariye îddîa bikin ku strîna[3] bi Kurdî derqanûnî nîne. Li qada şanoyê ji bilî lîstika Kemal Burkay ya bi navê *Dawiya Deheq* çu geşedan çênebûne[4] û hunermendên wekî Mihemed Arif Cizrawî, Eyşe Şan, Nizamettin Arîç û Şivan Perwer û gelekên dîtir neçar mane hunera xwe ji welatê xwe dûr îcra bikin.

Şanoya Kurdî, li Îraq, Îran, Sûrîye û Sovyeta Kevin li gorî bayê siyasî bûye xwedî geşedanên cuda, lê belê li Tirkiye'yê, ji bilî herdu lîstikên ku

2 Nenivîse! Nelîze! Neaxive! Rapora Derheqê Pestî û Sansûra Qada Çand û Hunerê. Platforma Çand û Hınerê ya CHPê, 2016. [Yazma! Oynama! Konuşma! Kültür ve Sanata Uygulanan Baskı ve Sansür Raporu, CHP Kültür ve Sanat Platformu, 2016.], Li Tirkiyeyê Sansûr û Otosansûr. Rebendan-2019-Mijdar 2019, Bêdeng Nebe 24, Platforma li Hember Sansûr û Otosansûrê. [Türkiye'de Sansür ve Otosansür: Ocak 2019-Kasım 2019, Susma 24, Sansüre ve Otosansüre Karşı Platform]. Portala nûçeyan a bi navê SiyahBand jî -ku kiryarên sansûrê yên qada hunerê lêdikolê, belge dike û analîz dike da ku hafizayekê ava bike- cih dide binpêkirina mafên hunermendên Kurd.

3 Şivan Perwer sala 1975an li şahiyeke li Enqereyê ji ber "Xezal Xezal" ji sehneyê hatiye dûrxistin, dûvra li ser wî lêpirsîn hatiye vekirin, lewma neçar maye sala 1976 Tirkiyeyê terk bike. Nîzamettin Arîç jî sala 1979 ji ber staran "Ehmedo Ronî" bi propagandaya komûnîzm û cudakariyê hatiye tawanbarkirin, lewma ew jî neçar maye piştî mıdaxeleya leşkeri ya 12 Îlonê ji Tirkiyeyê derkeve.

4 Çetoyê Zêdo &Yavuz Akkuzu, Kürt Tiyatro Tarihi, Evrensel Basım Yayın, 2016, r. 10.


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

li jor derbas bûn, heta destpêka salên 1990î çu geşedan çênebûne. Salên 1990î li Tirkiyeyê xebatên şanoyê yên bi Kurdî dîsa dest pê kirine û hem bi metnên telîf hem jî yên werger ve ewil li navêndên çandê, dûvra li şanoyên taybet û şanoyên bajêr hejmareke zêde ya lîstikan hatine pêşkêşkirin. Ji ber ku hewceyî bi pêvajoyeke dûvdirêj ya perwerdeyê heye û hunereke îcraya kolektîf e, ji bo şanoyê piştevaniya sazûmanî û ya aborî gelek girîng e.

Di avakirina komên şanoya Kurdî da mirov dikare du werçerxan nîşan bide: (1) sala 1991an damezrandina şaxê şanoyê li bin banê NÇMê; (2) piştî salên 2000î pêşkêşiya lîstikên bi Kurdî ji aliyê şanoyên bajêr ve li bin banê şaredariyan. Şanoyên şaredariyan wextê "Pêvajoya Çareseriyê" rastî kêmtir binpêkirina mafan hatine û ji şaredariyan piştevaniya sazûmanî wergirtine. Lê belê piştî bidawîbûna "Pêvajoya Çareseriyê" binpêkirinên mafên giran qewîmîne; wekî girtina şanoyan, derxistina lîstikvanan ji kar, destdanandina ser hemû kelûpelan, di serî da ser kostûm û dekoran.

Hunermendên ku hunera xwe li şanoyên taybet îcra dikin di "Pêvajoya Çareseriyê" da ji dewletê piştevaniya berteng wergirtine û wisa dîyar kirine ku ji şaredarî û saziyên pêwendîdar jî zêde piştevanî wernegirtine. Piştî bi dawîbûna "Pêvajoya Çareseriyê" deriyên şanoyên bajaran û navêndên çandê yê girêdayî şaredariyan hatine dadan. Herwisa di pêvajoya OHALê da jî bi rêya Qerarnameyên Hukmê Qanûnê (QHQ)'an hejmareke zêde ya şanoyên taybet hatine girtin[5] û dest danene ser kostûm, afiş û her cure kelûpelan. [6]

Lewma wisa dîyar e ku di serdema "Pêvajoya Çareseriyê" da serbestiyeke sînordar hebûye ji bo şanoyên taybet û şanoyên bajaran ji bo pêşkêşiya lîstikên bi Kurdî, lê dîsa jî beşdaran aniye ser ziman ku dewletê polîtîkayeke wisa nebûye ku bi awayê pozîtîf piştevaniya şanoya bi Kurdî bike. Di wê serdemê da herçend Wezareta Çandê hin caran bo şanoyên taybet

5 Kürtçe Tiyatro OHAL Kıskacında (26 Ocak, 2017), http://www.siyahbant.org/kurtce-tiyatro-ohal-kiskacinda/; Berî hingê bi gelek komeleyên ku faaliyetên wan bi erka OHAL'ê hatibûne rawestan, bi QHQ'yan ve hatine girtin. https://www.evrensel.net/haber/296650/faaliyetleri-durdurulan-dernekler-kapatildi

6 Seyr-i Mesel Tiyatrosuna OHAL Mührü" (13 Kasım, 2016), http://www.siyahbant.org/seyr-i-mesel-tiyatrosuna-ohal-muhru/, Seyr-î Meselden Basın Açıklaması (11 Kasım, 2016), http://www.mimesis-dergi.org/2016/11/seyri-meselden-basin-aciklamasi/; Kürtçeye OHAL Mührü, https://gazetekarinca.com/2016/11/kurtce-tiyatroya-da-ohal-muhru/, Seyr-î Mesel: Bu kez mührü suya düşürdüler, https://www.murekkephaber.com/seyr-mesel-bu-kez-muhru-suya-dusurduler/4575/


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

piştevaniyeke berteng kiribe û salon tehsîs kiribin jî, ew piştevanî ji ber polîtîkayeke çandê wêdetir di wan rewşan da pêk hatiye gava daxwazên hunermendan şid bûne û xwestine dewletê bi gotinên wê rê rûbirû bihêlin.

Ji ber ku ew azadiya sînordar digel kiryarên derhiqûqî û polîtîkayên cudakar yên dewletê -ku bi alavên curbicur ve dimeşîne- hatibû pêşkêşkirin, wê serdemê jî binpêkirinên ciddî yên pek hatine. Ew binpêkirin dê li ser vegotinên beşdaran ji nêz ve bêne analîzkirin.

Hunermendên ku piştî sala 1991an bi rabûna berteng ya qedexeyên li ser zimanê Kurdî li saziyên çandê yên Kurdan berhev bûne jî daxilî vê xebatê bûne digel hunermendên piştî salên 2000î bi berbelavbûna girseyî ya axaftina zimanê Kurdî ve derfet peyda kirine li Tirkiyeyê hunera xwe bi Kurdî îcra bikin,

Ji bo vê xebatê 15 jê muzîkjen û 15 jê şanoger, bi giştî li gel 30 hunermandan hevdîtinên nîv-sazkirî û hevdîtinên berfireh hatine pêkanîn, pirs wisa hatine sazkirin ku hem agahiyên çawanî (qualitative) hem jî yên çendanî (quantitative) bêne wergirtin. Ji hevdîtinan 20 lib ji ber pandemîyê online (li ser xetê) bi rêya bernameya *Zoom*ê pêk hatine, her 10 hevdîtinên din rû bi rû pêk hatine. Ji beşdaran 20 kes zilam û 10 kes jî jin in. Ji ber ku hinek hunermendên ji teklîfên me yên hevpeyvînê qebûl nekirin, di xebatê da hejmara beşdarên jin kêm e.

Ji beşdarên zilam 10 kes wek muzîkjen, 10 kes jî wek şanoger hunera xwe îcra dikin; herçi beşdarên jin in, 4 kes ji wan muzîkjen û 6 kes ji wan jî şanoger in. Ji hunermendên beşdar yek li Parîsê, yek li Londonê hunera xwe îcra dikin, hunermendên din li bajarên wekî Stenbol, Dîyarbekîr, Batman, Mêrdîn, Îzmîr, Enqere, Eskîşehr û Wanê hunera xwe îcra dikin. Ji nava van bajaran bi 14 kesan ve herî zêde beşdarî ji Stenbolê çêbû; herwisa li Dîyarbekirê bi 5 beşdaran; li her yek ji bajarên Batman, Mêrdîn û Îzmîrê bi 2 kesan; li her yek ji bajarên Enqere, Eskîşehr, Wan, Parîs û Londonê bi beşdarekî hevdîtin pêk hatiye. Herdu hunermendên ku li derveyî welat hunera xwe îcra dikin, demên berê hunera xwe li Tirkiye'yê îcra dikirin, lê dûvra ji ber sedemên sîyasî neçar mane ku li derveyî welatî hunera xwe berdewam bikin. Gava koma beşdaran dihate sazkirin hewl hatiye dayîn ku ji van kesan temsîliyet hebe: ji kesên ku li saziyên dewletê perwerdeya fermî ya hunerê wergirtine; ji kesên ku kevneşopiya malbat û derdora çandî berdewam dikin; ji kesên ku li derdora saziyên hunerê yên


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

Kurdan dest bi hunerê kirine; û ji kesên bêyî perwerdeyekê bi derfetên xwe hunerê îcra dikin.

Çend sedemên wê hene ka çima ji Stenbolê hejmara beşdaran ew qas zêde bûye. Gava mirov Stenbolê dide ber bajarên din ên mezin, yên wekî Îzmîrê, kişf dibe ku Stenbol ji aliyê mekanên îcraya hunera bi Kurdî ve bi awantajtir e. Hunermendên ku li Îzmîrê dest bi hunerê kirî, anîne ser ziman ku piştî mideheké wan ji ber 'neteweperestiya spî' ya li wî bajarî ji bo îcraya hunera xwe mekan peyda nekirine, lewma bar kirine Stenbolê. Herwisa hunermendên ku ji bilî muzîk û şanoyê debara xwe bi karekî din dikin, wisa îfade kirine ku ji ber zêdebûna derfetên kar, ew li Stenbolê bi cih bûne. Dîsa ji ber serjimara zêde ya ciwanên zanîngehê û herwisa ji ber ku serjimareke zêde ya Kurdan koçber dihewîne, hunermendên Kurd berê xwe dane Stenbolê. Qismekî hunermendên Kurd yên niştecihên Stenbolê piştî pêla koçê ya salên 90î li wir bi cih bûne, qismê din jî piştî demokratbûna berteng ya piştî salên 2000î pêk hatî, li Stenbolê bi cih bûne. Bajarekî din ku hejmareke zêde ya hunermendên Kurd lê ye Diyarbekir e, ewa xwedî rêjeyeke bilind ya ciwanan. Herwisa Diyarbekir ji sala 1999an pê ve bûye navendeke cezbê ji bo hunermendan ji ber çalakiyên Şaredariya Bajarê Mezin a Diyarbekirê û şaredariyên navçeyan yan çalakiyên bi piştevaniya wan pêk hatine,

Ji bilî hunermendan, bi du kesên ku li saziyên çand û hunerê yên Kurdan rêveberî kirî jî hevpeyvîn hatine pêkanîn da bête fehmkirin ka polîtîkayên saziyên çandê yên Kurdan çawa bandor kiriye li ser çalakîyên hunermendên Kurd. Herwisa ji beşdarên xebatê çar hunermend jî ji wan kesan hatine hilbijartin yên ku avakarên şanoyên bajaran û şanoyên taybet bûne, an jî li wan deran rêveberî kirine.

Ji bo xebatê lêgerîneke medyayê ya taybet nehatiye kirin lê belê nûçeyên li ser binpêkirina mafan di analîza agahiyan da hatine bikaranîn. Hevpeyvîn li gor daxwaza beşdaran bi Tirkî û/an jî bi Kurdî hatine kirin. Dîsa li ser daxwaza beşdaran, navên wan hatine veşartin.

## Rêbaz û Çarçoweya Teorîk

Kiryarên binpêkirina mafên şanoger û muzîkjenên Kurd dê bêne analîzkirin li ser bingeha polîtîkayên fermî yên çandê û vesazkirinên qanûnî û herwisa li gor mafên çandî yên ku bi peymanên navneteweyî parastî ne.

Pirsên ku ji beşdaran ra hatine pirsî ev in:



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

- Gelo li hemberî îcrakirina hunera bi Kurdî astengiyên qanûnî hene? Heke hebin, ew çawa rû didin?
- Dewlet ji aliye qanûnî û sazûmanî di nava helwesteke çawa ye ji bo piştevaniya hunera bi Kurdî?
- Qanûnên ku di pêvajoya Hevahengîya YE de hatine derxistin, bandoreke çawa dikin li ser hunera bi Kurdî?
- Gelo di navbera vesazkirinên qanûnî û polîtîkayên dewletê yên çandî hevgirî heye? Heke hebe ew hevgirî û nehevgirî çawa bandorê dikin li ser binpêkirina mafên hunermendên Kurd?
- Gelo di navbera bayê siyasî û binpêkirina mafan da pêwendî heye?
- Hunermend herî zêdê kîjan binpêkirina mafan dibînin? Binpêkirina mafan ji aliye kê û çawa tête kirin?
- Gelo li hemberî binpekirina mafan rêyên têkoşîna hiqûqî vekirî ne?
- Ji bo berterefkirina binpêkirina mafên hunermendên Kurd di hiqûqa navxweyî û ya navneteweyî da vesazkirinên qanûnî yên çawa divê bêne pêk anîn?

Di encama hevdîtinan da binpêkirinên herî zêde bilêvkirî, li jêr hin serenavan hatine komkirin. Di encamê da hatiye dîtin ku saziyên cuda yên dewletê bi kiryarên 'rewşa awarte' yên fermî û fîlî desthilatiyeke wisa ava kiriye ku di îstîfadekirina ji mafên hiqûqî da bi berdewamî 'halê îstîsna'[7] derxistiye holê. Ev nêrîna desthilatiyê ya ku kesên kurdîaxêv wek kirdeyên rasteqîn yên xwedî maf nabîne, qanûnan asteng dike û rê li ber bicihbûna adaletê digire. [8]

Li hinek rewşên ku li hemberî hunera bi Kurdî çu bergirîyên qanûnî nebin jî, astengiyên fîlî rû didin û li hemberî wan astehgiyên rêyên dadgehî asê ne, lewma aşkere ye ku binpêkina mafan û cudakarî wekî normeke sîyasî û çandî ya kûrtir tetbîq dibe. Saziyên wekî mekteb, medya û sazîyên dînî ku awayên fikirîn û hîsîyatê yên maqûl dîyar dikin, li ber

7 Ev têgeh ji aliyê zanyarê siyasete yê Îtalî Giorgio Agamben ve hatine venûkirin. Bnr. Giorgio Agamben İstisna Hali, Ayrıntı Yayınları, 2. Baskı, 2020; Giorgio Agamben "Olağanüstü Hal", Aykut Çelebi (Haz.) Şiddetin Eleştirisi Üzerine, Metis Yayınları, 2. Baskı, 2010.

8 Di nirxandina li ser hindê ku qanûnên formel 'edaletê garantî nakin, ji xebata ramangerê Fransî Jacques Derrida ya bi navê "Hêza Qanûnê, Bingeha Mîstîk ya Otorîteyê [Yasanın Gücü, Otoritenin Mistik Temeli]" sûd hatiye wergirtin. Bnr. Jacques Derrida, "Yasanın Gücü, Otoritenin Mistik Temeli" Aykut Çelebi (Haz.) Şiddetin Eleştirisi Üzerine, Metis Yayınları, 2. Baskı, 2010.


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

lîteratûra têkilîyên desthilata sîyasî û îdeolojiyê dê bêne analîzkirin ka ew sazî li hemberî îstîfadekirina ji mafên çandî û hunerî yên bi Kurdî pêşdarazîyên çawa ava dikin û binpêkirina mafan bi çi awayî teşwîq û meşrû dikin.

Di beşên rêzê da pêvajoya rakirina qedexeyên li ser Kurdî, di peywenda bandora wê ya li ser bikaranîna Kurdî li çalakiyên hunerê da dê bête analîzkirin. Dûvra dê li belge û vesazkirinên navneteweyî yên derbarê parastina mafên civakî û çandî bêtê nêrîn ka li kîjan qadan binpêkirina mafan pêk hatine. Di beşa dawiyê da jî daneyên lêkolîna qadê dê bêne analîzkirin.

> *Ya rast, di wê pêvajoyê da belgeyên cuda yên polîtîkayên çandê hene ku ji aliye dewletê ve hatine amadekirin. Bo mînak, di serdema Ahmet Davuoğlu da Belgeya Polîtîkayên Çandê hatiye amadekirin. Li gor wê [belgeyê] divê li her bajarî bi beşdariya paydaran raporên polîtîkayên çandê bêne amadekirin. Rêveberiyên herêmî jî wek paydar dihesibîne. Di serdema Nabi Avcı da belgeya Polîtîkayên Çandê yên Sêyemîn Şûraya Çandê heye. PDF'ya belgeyê li ber destên me heye, lê wezaret xwe lê nake xwedan. Herwisa Rapora Neteweyî ya Çandê heye ku Tirkiye'yê sala 2008an dest bi amadekariyên wê kir û sala 2013an pêşkêşî Konseya Ewrûpayê kir. Lê belê rapor ji ser malpera Wezareta Çandê hatiye rakirin. Îro mirov nikare xwe bigehîne malpera projeya 2010 Stenbol Paytextê [Çandê yê] Ewrûpayê. Wisa ye, belgeyên xeyalet hene ku yek ji wan jî ne li ber dest e, mirov nikare xwe bigehîne wan. Dewlet xwe li wan raporan nake xwedan. Ji ber ku ew çalakiyê niha didarazîne, hingê wek armanc û vizyon dabûne ber xwe.*

Di vê xebatê da ji komeke reporên[9] ku di navbera salên 2011-2019an da Weqfa Çand û Hunerê ya Stenbolê (WÇHS) [İstanbul Kültür Sanat Vakfı (İKSV)] ve amade kirî jî hatine analîzkirin. Ew rapor derbarê mijarên rojevê yên wekî polîtîkayeke piranîparêz ya çandê, perwerde û rola rêveberiyên herêmî di plansazîya çandî da hatibûne amadekirin. Di raporên WÇHS da belgeyên UNESCOyê û belgeyên dîtir yên navneteweyî

9 İstanbul'da Kamusal Alanda Sanat Uygulamaları İçin Öneriler 2011; Türkiye'de Sanat Eğitimini (Yeniden) Düşünmek, Aralık 2014; Yerel Yönetimler İçin Kültürel Planlama, 2016; Birlikte Yaşamak: Kültürel Çoğulculuğu Sanat Yoluyla Geliştirmek, Temmuz 2018. Erken Çocukluktan Gençliğe Sanatla Büyümek, Ekim 2019.


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

referans têne wergirtin û li ser mînaka Reşîk û Çermsorên li Emrîkayê têtê nişandan ka polîtîkayên perwerdeyê di mijarên zeyenda civakî û nîjadî da bandoreke çawa neyînî dike li ser nêrîna derheqê 'yên din'. [10] Lê belê li *çu derê raporan* behsa Kurdan û kêmîneyên din nebûye, karakterê yekparêz û vederker yê perwerdeya hunerê yê Tirkiye'yê nehatiye vegotin.

## Li Tirkiye'yê Polîtîkayên Çand-Hunerê û Kurteserpêhatiya Hunera bi Kurdî

Sîyaseta modernbûnê ya Dewleta Osmanî wisa hatiye rêvebirin ku dewleteke navendî ava bike. Wek ku di belgeyên fermî yên dewletê da derbas dibe nîvê ewil yê sedsala 19an Mîrektîyên Kurdan ji holê hatine rakirin û fetha Kurdistanê temam bûye, Eyaleta Kurdistanê wek yekînekeyek îdarî hatiye damezrandin û bûye parçeyek ji axa împeratoriyê, dûvra di serî de mekteb, gelek saziyên dewleta modern li Kurdistana Osmanî hatine avakirin. Sala 1824an di serdema Siltan Mehmûdê II'yem da mekteba seretayî li ser hemû împeratorîyê hatiye ferzkirin û Tirkî wek zimanê perwerdeyê hatiye dîyarkirin. Di makezagona ewil ya bi navê Qanûna Esasî ku sala 1876an hatiye qebûlkirin, Tirkî wek zimanê perwerdeya seretayî hatiye peyîtandin. Digel Tirkîkirina zimanê perwerdeyê, naverokên pirtûkên derse jî li gor Tirkîtî û Misilmantîyê hatine amadekirin.

Li qlûb û komeleyên Kurdan yên ku di atmosfera azadiya berteng ya serdema Meşrûtîyeta II'yem da hatibûn avakirin, xebatên li ser ziman û çanda Kurdan hatine pêkanîn. Di wê serdemê da geşedenên girîng çêbûn di warê weşana rojname, kovar û pirtûkên bi Kurdî da.

Di destpêka sedsala 20an da, wextê ku li Rojhilata Naverast ya modern netewe dewlet peyda dibûn, Kurd bi vesazkirinên navneteweyî ve li Îran, Îraq, Sûrîye û Tirkiye'yê ji statûyeke siyasî bêpar man. Serjimareke zêde ya Kurdan jî li nav sînorên Yekîtiya Sovyetê ma. Wê parçebûna siyasî û bêstatûtîyê bandoreke xirabker kir li ser geşedana ziman û hunera Kurdî û di navbera hunermendên Kurd da jî parvekirina tecrûbeye û derbaskirina kevneşopîyê ya piştbipişt (diachronic) û hemdemî (synchronic) hema bêje nemimkûn bû.

Ji ber ku ji damezrandina komara Tirkiye'yê heta destpêka salên 1990î Kurdî wekî zimanekî qedexekirî bû; şano, muzîk, sinema û edebiyat bi Kurdî jî dikete nav qewareya wê qedexeyê. Lê belê polîtîkayên dewletê bi

10 B.n.b., 28-29.



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

qedexekirinê sînordar nebûn. Bi rêya politikaya çand û hunerê ya daye ber xwe, dewletê nirxên çandî yên wekî stran, metel, lîstik û çîrokên gelêrî yên gelên Kurd, Ermanî, Rûm, Ereb, Laz, Gûrcî û Çerkezan kirine malê Tirkî û li jêr serenavên Muzîka Gelêrî ya Tirkî, Muzîka Klasîk ya Tirkî û Edebiyata Gelêrî ya Tirkî hatine qeydkirin. Ji Ocaxên Tirkan bigire heta Malên Gel, gelek sazîyan wekî navgîna Tirkkiran çandî kar kirine.[11] Digel Xala 39an[12] ya Hevpeymana Lozanê ya ku mafên zimanî yên komên civakî garantî dike, serokên rejîma nû berpirsiyariyên xwe yên ji Hevpeymanê bi cih neanîne û qedexeya zimanî wek parçeyek ji înşaya çandê tetbîq kirine.[13] Wê rewşê ji bo hinek gelan axaftina ziman xwe kiriye sûc û wisa kiriye ku ew axaftina wan li hember yekîtî û yekpareyîya welatî wekî çalakîyeke polîtîk bête hesibandin.

Polîtîkaya çandê ya ku her cure îfadekirina derbarê Kurdayetîyê da qedexe dike û hewl dide Tirkîtiyê serdest bike, destpêka salên 1960î kete qeyranê ji ber hinek geşedanên ku Kurd li nav civakê xuyatir dikirin. Salên 1950yî digel pergala parlamenter ya pir partîyî Kurd û pirsgirêkên wan bi navên 'Rojhilat' û 'Rojhilatî' be jî ketin rojeva sîyaseta Tirkîye'yê. Bi ser wan rûdanan, xweseriya Kurdan ya ku sala 1961ê li Îraqê bi dest xistin, li ser Kurdên li Tirkîye'yê bandoreke sersînorî pêk anî. Ji alîyekî ve weşanên Kurdî yên li Îraqê bi qaçaxî dihatin Tirkîye'yê û ji aliyê din ve jî di serî de muzîkê, hilberên çandî û hunerî rê peyda kirin ku xwe bigehînin Kurdên li Tirkiye'yê.

Hereketa sîyasî ya Kurdan salên 1960î û 1970yî bi hêz dibû, li hember vê yekê berteka dewletê girtina partî û komeleyên Kurdan bû. Herwisa deriyê komeleyên çalakiyên çandê jî hatine dadan û di serî de muzîkjen û edîp, kesên ku çalakiyên derbarê çanda Kurdan dikirin, yan hatine hepiskirin, yan jî ew neçar mane ji welatî derkevin.

Dîsa di salên 1960î da bi berbelavbûna tevgerên azadiya neteweyî yên

[11] Wek ku di mînaka hunermendên Laz û Kurd da tête dîtin, stranên ku kirine malê Tirkî, bi Tirkîyeke aqsanî têne strîn û ew hunermend wekî hunermendên ji Herêma Behra Reş û yên ji Herêma Rojhilatê tên bi binavkirin.

[12] Ji bo çu gelên Tirkiye'yê ne di têkiliyên taybet ne jî yên bazirganiyê de, di dîn, çapemenî an jî her cure mijarên weşanê û civînên vekîrî da çu astengî nayên danîn ku zimanê xwe bi kar bîne. Herçend zimanê fermî yê dewletê hebe jî, ji hemweletiyên Tirkiyeyê yên axêverê zimanekî din, dê alîkaryên guncav bêne kirin da ku li dadgehê zimanên xwe bi devkî kar bînin.

[13] Çağla Kubilay, "Türkiye'de Anadillere Yönelik Düzenlemeler ve Kamusal Alan: Anadil ve Resmi Dil Eşitlemesinin Kırılması" İletişim Araştırmaları, 2005, sf. 66.


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

gelên bindest ve bayekî demokratîkbûnê li Ewrûpayê peyda bû û bandora wê yekê li Rojhilata Naverast jî xuya bû û herçend bi saetên sînordar be jî Radyoya Rewanê, Radyoya Bexdayê û Radyoya Tehranê dest bi weşana Kurdî kirin. Bi taybetî Radyoya Rewanê û ya Bexdayê bûne mecrayek bo hunermendên ji herêmên Kurd yên Tirkîye, Îran û Îraqê ku lê berhemên xwe îcra dikirin û herwisa li gel şirîkeyên plakan yên li wan bajaran albûm çêdikirin. Ew radyo ji aliyekî ve bûne dibistanek ji bo hunermendên Kurd, ji aliyê din ve jî bi saya taybermendiya xwe ya sersînorî, weşanên radyoyayan kevneşopîya ku ji ber sînorên fermî ve nîvco mabû, derbasî nifşên nû dikir.

Li Tirkîye'yê vesazkirinên piştî derbeya leşkerî ya 12 Îlona 1980yê, nîşaneya asteke nû ya polîtîkayên asîmîlasyonê yên dewletê ne. Cara ewil vê serdemê zimanên ji bilî Tirkî bi rêya qanûnan ve rasterast hatine qedexekirin û qedexeyên li ser zimanî bi taybetî li gel terora cudakar hatine pêwendîdarkirin û hatine berdewamkirin.[14] Qanûna jimar 2932 ya bi navê 'Qanûna Derbarê Weşanên ji bilî Tirkî' xwedan taybetmendîyeke wisa ye ku dikare endîşeyên dewletê yên derheqê zimanê Kurdî da bi hemû rexan ve temsil bike.

Xala yekem ya qanûnê diyar dike ku ew 'bingeh û rêgezên derbarê zimanên qedexekirî yên aşkerekirin û belavkirina fikr û ramanan' vesaz dike 'bi armanca parastina neparçebûna dewletê bi milet û welatê xwe, parastina desthilatdariya millî, parastina komarê, parastina ewlehîya millî, parastina serûberiya gel'. Li gor xala duyem ya qanûnê qedexe ye ku 'fikr û raman bi zimanê fermî yê yekem yê dewletên ku ji aliyê Devleta Tirk ve tê nasîn pêvetir bi çu zimanên din bêne aşkerekirin, berbelavkirin û weşandin'. Bi wî awayî axaftina bi zimanên din ên li Tirkiyeyê û hilberîna hunerê bi wan zimanan û belavkirina wan berheman bi awayekî fermî hatiye qedexekirin. Xala sêyem ya qanûnê jî rasterast dibêje ku 'Zimanê dayîkê yê hemwelatiyê Tirk, Tirkî ye.' Herwisa li gorî vê qanûnê her cure çalakiyên bikaranîn û berbelavkirina zimanên dayikê yên ji bilî Tirkî; di civîn û meşên xwepêşandanan da rakirina afiş, panqart, dowîz, lewha û hwd. yên ku bi zimanekî ji bilî Tirkî hatine amadekirin û bi zimanên ji bilî Tirkî weşan û belavkirina bi rêya plaq, bandên deng û dîmenan û her cure alav û amûrên vegotinê hatine qedexekirin. Ji bo çalaki û tevgerên dijî vê

14 B.n.b., 71.


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

qanûnê cizayên heps û pere hatine dîyarkirinê,[15] bi wî awayî qedexeyeke berfireh hatiye danîn. Baskın Oran balê dikêşîne ser nivîsandina xala duyem ya vê qanûnê. Bi ya Oran, gotina 'Zimanê fermî yê yekem' ve zimanê duyê yê fermî yê Îraqê, ku Kurdî ye, bi bîr dixe û bi pîvana 'nasîna ji aliye dewleta Tirk ve' jî îhtimala nasîna dewleteke Kurd ya paşerojê tê bertereфkirin.[16] Derheqê bikaranîna Kurdî da endîşeyên Tirkîye'yê yên sersînorî tenê bo Îraqê nebûn. Bo mînak, gava sala 1957an li Radyoya Qahîreyê dest bi weşanên Kurdî kir, Tirkiye'yê aciziya xwe bi rêya balyozê xwe ve ragihandibû Cemal Ebdil Nasir.

Bandoreke herî tehrîbkar ya nasîna axaftina bi Kurdî û îcrakirina hunerê bi Kurdî wek sûcekî, di derbaskirina zimanî ji nifşekî bo nifşekî dîtir da derketiye holê. Gelek malbatan Kurdî hînî zarokên xwe nekirine û rê li ber daxwazên wan yên îcraya hunera bi Kurdî girtine da ku ew 'nekevin nav sûcan' û bi sicîleke paqij ya malbatê bibin xwedan derfetên perwerde û kar. Wek ku di beşên rêzê da dê bê dîtin, ji nava hunermendên beşdar ji bilî çend kesên ku malbatên wan jî bi hunerê ve eleqedar bûne, yên din anîne ser ziman ku ew ji aliyê malbat û derdora xwe ve nehatine teşwîqkirin bo çalakiyê hunerê.

Ji ser hemû halan ra ji ber ku bikaranîna zimanê dayîkê ne wekî mafekî xwezayî, lê wek çalakiyeke polîtîk hatiye dîtin, di serî da yên bi Kurdî, naveroka hemû çalakiyên bi zimanên din ên ji bilî Tirkî ji aliyê mercîyên fermî ve hatine serûbinkirin, lewma xweîfadikirin û hilberîna hunerî ya bi zimanên din bêtir li bin pestîyê da bûye.

## Rabûna Qedexeyên li ser Kurdî

Heta 25î Çileya 1991an ku bi biryareke Lijneya Wezîran ve bo Kurdî azadiyeke berteng hatiye ragihandin û qedexeya li ser axaftin û strîna bi Kurdî hatiye rakirin, daneheva muzîkî û hunerî ya bi Kurdî nekarî xwe li ser bingeheke qanûnî ji nûve hilberîne û xwe derbasî nifşên di rêzê da bike. Piştî ku sala 1991an bo zimanê Kurdî azadiyeke sînordar hate ragihandin, qenalên televîzyonê yên ku li ser peykê weşand dikirin (Med TV, Kurdistan TV û Kurdsat) û herwisa band û plakên bi Kurdî yên êdî serbest bûn, rê li ber vekirin da ku daneheva muzîka Kurdî derbasî nifşên nû bibe. Herçend piçekê hêdî be jî, şanoya Kurdî ji wê azadiya berteng û hev-

15 B.n.b., 72.
16 Ji Oran, bêtarîx 14-15 vgz. Kubilay, op.cit. 73.


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

karîgerîya sersînorî sûd wergirt û çalakiyen xwe pêk anîn. Digel avakirina Navenda Çanda Mezopotamya (NÇM), di serî da yên muzîk, şano û sinemayê, çalakiyên gelek qadên huneren din li bin banê heman saziyê kom bûn. Li NÇM'ê ji aliyekî ve perwerdeya hunerê dihat rêvebirin, ji aliyê din ve polîtîkayeke sazûmanî dihat tetbîqkirin ji bo çalakîyên arşîvkirina hunera Kurdî ya ku bi dehan salan bû dihate talankirin. Sala 1992yan Enstîtûya Kurdî ya Stenbolê hate damezrandin û li wir xebatên li ser çand û hunera Kurdî û xebatên arşîvê hatine destpêkirin.

Vesazkirinên ku qedexeya Kurdî rakirine xwedan hukmên aşkere yên derbarê azadiya Kurdî nebûn. Herwisa têda vesazkirinên wisa nebûn ku Kurdîyê bi awayê pozîtîf vejîne û pêşve bibe. Ew vesazkirinên pêwendîdar bi paketên hevahengîyê yên ku sala 2002yê di pêvajoya endamtîya YE'de hatibûne bicihkirin.

Bi Paketa 3yem ya Hevahengîya YE'yê, digel zimanê Tirkî yê fermî, rê hate vekirin ku bi ziman û zaravayên dîtir yên ku hemwelatî di jiyana xwe ya rojane da bi kar tînin jî weşan bê kirin. Bi saya hinek vesazkirinên navbera salên 2004 û 2009an qenaleke televîzyonê ya fermî hate vekirin ku tenê bi Kurdî weşan dikir. Herwisa ji bo lêkolînên li ser ziman û zaravayên cuda rê hate vekirin ku enstîtû bêne vekirin û li xwendingehê navîn dersên hilbijartî bêne dayîn.[17] Di wê çarçoveyê da ewil sala 2009an li bin banê Zanîngeha Mardîn Artûklûyê enstîtûyeke bi navê Enstîtûya Zimanên Zindî yên li Tirkiye'yê (EZZT) hate damezrandin. Girêdayî wê enstîtûyê Şaxamakezanista Ziman û Çanda Kurdî hate vekirin û bi wî awayî perwerdeya serlîsansê ya bi Kurdî mimkûn bû. Piştî hingê li zanîngehên li bajarên Diyarbekîr, Bîngol, Mûş û Wanê enstîtû, beş an jî şaxamakezanist vebûn ji bo perwerdeya asta serlîsans û lisansa bi Kurdî.[18] Hin berhemên edebiyata klasîk ya Kurdî, wekî *Mem û Zîn*, ji aliyê Wezareta Çand û Tûrîzmê hatine weşandin. Dîsa bo cara ewil filmekî ku têda dîyalogên Kurdî zêde ne, anku filmê bi navê 'Du Ziman û Çenteyek' ji aliyên Lijneya Piştevaniya Sînemayê ya Wezareta Çand û Tûrîzmê piştevaniya darayî wergirt. Ji sala 2012an pê ve xwendekarên polên 5, 6, 7, 8an yên dibistanên navîn îmkan peyda kirin ku li gor mifredata Lijneya Perwerde û Terbîyeyê hefteyê du saetan dersên Kurdî wergirin. Peydabûna Kurdî li

17 Navê wan dersan bi temamî ev bû: "Ziman û zaravayên zindî"

18 Şehmus Kurt. Türkiye'de Kürtçe Öğretim Deneyiminin İncelenmesi (1968-2018). Yayınlanmamış Doktora Tezi, Diyarbakır: Dicle Üniversitesi Sosyal Bilimle Enstitüsü, Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı, 2020.


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

zanîngehan ji bo xebatên akademîk û li dibistanên navîn wek derseke hilbijartî, piştî polîtîkayên sedsalane yên tunekirin û qedexeyê prestîja Kurdîyê zêde kiriye û xuyabariya wê li nav civakê zêde kiriye. Vê yeke kiriye ku, di serî da bo edebiyat, muzîk û şanoyê, qebûla Kurdîyê wek zimanê hilberînên hunerî berbelavir bibe.

Digel van geşedanan, HADEPa ku di navenda wê da temsîlîyeta Kurdan hebû, di hilbijartinên herêmî yên sala 1999an da, di serî da li Diyarbekîr, Batman û Mardînê, li gelek bajaran şaredarî bi dest xistin. Vê yekê jî kir ku Kurdî di civakê de bêtir xuya bibe û bête bikaranîn. Gerînendeyên Çandê yên van şaredarîyan cih dane xebatên edebiyat û hunerê yên bi Kurdî. Li jêr banê şaredarîyan yekîneyên şanoyê û konservatûwar hatine avakirin. Bi rêya mîhrîcan û çalakiyên edebîyatê nivîskar û hunermendên Kurd derfet peyda kirin ku berhemên xwe bigehînin koma guhdar û xwendevanan.

Bidawîbûna pêvajoya ku ji aliyê hikûmeta AKPê wekî "*Pêvajoya Çareseriyê*" dihat binavkirin û gelek aliyên piştevaniya wê dikir û herwisa teşebûsa derbeya leşkerî ya 15ê Tîrmeha 2016an bûne destpêka serdemeke nû. Qayûm danene ser şaredarîyan û gelek qenalên radyo û televîzyonê yên taybet hatine girtin. Herçend enstîtû û beşên perwerdeya Kurdî nehatibin girtin jî ew ji piştevaniya qadroyê hatine bêparkirin û hema bêje hatine bêerkkirin. Ji ber ku Wezareta perwerdeyê mamoste tayin nekirin, herçend li gelek xwendingehan daxwaz hebe jî, ew dersên Kurdî yên hefteyê 2 saetan wek derseke hilbijartî dihatine dayîn, bi awayekî fîîlî nehatine kirin. Bi Kurdî axaftin, nivîsandin, strîn, kêşana fîlman, pêşkêşiya lîstikên şanoyê ji nû ve nehatine qedexekirin lê belê li hemberî îcraya wan astehgiyên mezin yên pratik hatine danîn. Li ser van hemûyan, dewletê piştevaniya xwe ya gelek berteng bo hunera bi Kurdî, bi temamî paşve kişand.

## Standartên Navneteweyî Yên Bingehîn û Xalên Pêwendîdar Ên Ku Ev Xebata Derbarê Mafan Pala Xwe Didê

Rapora li gor van peymanên bingehên hatiye amadekirin: *Peymana Navneteweyî ya Mafên Aborî, Civakî û Çandî ya Neteweyên Yekbûyî (NY), Peymana Navneteweyî Derbarê Mafên Medenî û Siyasî, Peymana Navneteweyî ji bo Berterefkirina Hercure Cudakariya Nîjadî (IAOKS), Peymana UNESCO'yê ya Parastin û Pêşvebirina Curbicuriya Îfadeyên*


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

*Çandî, Biryara Tembiyê ya UNESCO'yê Derbarê Parastina Statûya Hunermendan, Peymana Ewrûpî ya Mafên Mirovan.*

## Peymana Navneteweyî ya Mafên Aborî, Civakî û Çandî ya Neteweyên Yekbûyî (NY)

Tirkiye sala 2003yan bûye terefdara vê peymana ku sala 1976an hatiye qebûlkirin. Li qismê despêkê yê Peymana Mafên Civakî û Çandî, li navbera mafên mirovan yên bingehîn ku ji zayînê tên û avakirina azadî, aştî û edaletê têkîlîyeke rasterast tê avakirin. Li gor peymanê heke şert û mercên îstîfadekirina ji mafên aborî, civakî û çandî bêne avakirin, hingê îdeala mirovê azad jî tê hilberîn ku dikare azadiya xilasiya xwe ji tirsê û belengaziyê bi dest dixe.

Xala 1em ya peymanê îfade dike ku "gelan mafê dîyarkirina çareseriya xwe heye". Wisa tê îfadekirin ku bi rêya vî mafî gel dikarin statûya xwe ya siyasî bi serbestî tayin bikin û dikarin geşedenên xwe yên aborî, civakî û siyasî bi azadane berdewam bikin. Di xala 2yem da tê îfadekirin ku dewletên terefdar qewil dikin ku ew mafên di peymanê da diyarkirî bêne bikaranîn bêyî cudakarîya statûya nîjad, reng, zayend, ziman, fikra sîyasî an jî fikreke dîtir, eslê neteweyî an jî civakî, milkîyet û zayînê. Xala 13em mafê perwerdeyê, xala 14em berpirsîyarîya temîna perwerdeya seretayî, xala 15em mafê daxilbûna jiyana çandî vesaz dike.

Di xala 13em da tê îfadekirin ku *derbarê perwerdeyeke wisa li hev hatiye kirin ku rêya herkesê veke ji bo beşdarbûna civaka azadîxwaz, di navbera hemû neteweyan û hemû komên nîjadî, etnîk û dînî feraset, xweşbînî û dostanîyê peşve dibe.*

Li jêr vê xalê aşkere ye ku mifredata ku perwerdeyê tenê bi zimanekî dide û li ser mezhebekî tenê ava dike, nikare li navbera komên nîjadî, etnîk û dînî xweşbînî û dostaniyê pêş ve bibe. Lewma tête dîtin ku biryarên piştî hingî ji bo venûkirina Peymanê hatine wergirtin, bi taybetî li ser hindê disekinin; divê perwerde wisa bête vesazkirin da ku bikare awayekî piranîparêz yê çandê ava bike.

Komeke belge û protokolên serhevî hatine amadekirin da ku dewlet nikarin peyvên vesazkirinan manûpûle bikin û li hemberê ruhê Peymanê tevbigerin.[19] Belgeya UNCCPR ya ku Nîsana 1994ê hatiye qebûlkirin îfa-

19 Peymannameya Navneteweyî ya Mafên Civîl û Mafên Giştî yên Siyasî ya Neteweyên Yekbûyî, 26î Nîsana 1994an; Peymannameya Navneteweyî ya Mafên Civîl û Mafên Siyasî ya Neteweyên Yekbûyî (UNCPP_1). Mijdara 1994an; Konseya Aborî û Civakî ya Neteweyên Yekbûyî, 2yê Tîrmeha 2009an; Komîteya Mafên Aborî, Civakî û Çandî, Xeleka çil û duyem, 4-22yê Gulana 2009an; Şîroveya giştî


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

de dike ku *di rewşên wisa da ku komek bi awayekî qanûnî xwedan statûya kêmîneyîyê nebe jî, gava bi awayekî objektif xwedan şert û mercên kêmînetîye be, hingê mafê wan e ku ji hemû mafên kêmîneyan îstîfade bikin*. Dîsa belgeya bi navê *Peymannameya Navneteweyî ya Mafên Civîl û Mafên Siyasî ya Neteweyên Yekbûyî* ku di Mijdara 1994ê da hetiye qebûlkirin, li ser azadiya sûdwergirtina tam û têkûz ji mafên kêmîneya disekine. Sala 2009an bi belgeya *Komîteya Mafên Aborî, Civakî û Çandî, Xeleka çil û duyem* her cûre cudakarî tête qedexekirin. Xala 21em ya belgeyê ku derbarê ziman da ye îfade dike ku "astengîya zimanî rê li ber bikaranîna gelek mafan digire, bo mînaka mafê beşdarîya jiyana çandî ku di xala 15em ya belgeyê da hatiye garantîkirin". Dîsa xala 23yem ya belgeyê da tê îfadekirin ku "divê fikrên siyasî û fikrên dîtir nebin bingeha miameleyeke cudakar."

Wek ku di qismê analîzkirina daneyan da jî dê bête rojevê, zehmetîyeke mezin ya hunermendên Kurd jî ew e ku astengî û qedexeyên li ser îcraya hunera wan qaşo ne ji ber zimanê tête bikaranîn, lê ji ber peyama polîtîk a zimanî bi xwe ye. Ew nêrîn dibe sedem ku hunermendên otosansûreke zêde bikin li ser naveroka berhemên xwe. Di vê qadê da binpêkineke din jî ew e ku bikaranîna Kurdî ne wekî bikaranîneke mafekî xwezayî, lê wekî çalakîyeke siyasî ya bi qestî tête dîtin, lewma naveroka zimanî bi berdewamî dibe mijara venêrîna siyasî.

Peymana Mafên Civakî û Çandî xwedî tuwancên girîng e ji bo parastin û pêşvebirina mafan. Ewil ji bo parastin û pêşvebirina mafan vesazkirina qanûnî wek mecbûrîyet dîtiye û ew mecbûrîyet kiriye xala yekemin da ku di îstîfadekirina ji mafên çandî da rê li ber îhtîmala astengîyên keyfî yên desthilatan bigire. Dîsa ew Peyman îstîfadekirina ji mafên çandî bi îstîfadekirina ji mafên aborî û civakî ve girê dide. Li gor peymanê heke komek ji îstîfadekirina ji mafên civakî û aborî bê astengkirin an jî têra xwe piştevaniya wan mafan neye kirin, hingê ew astengkirina îstîfadekirina ji mafên çandî jî ye.

j. 20: Li hember cudakarîya aborî, civakî û çandî (xal. 2, paragraf 2 ya Konseya Aborî û Civakî ya Neteweyên Yekbûyî); Konseya Aborî û Civakî ya Neteweyên Yekbûyî, 21ê Berfanbara 2009an: Komîteya Mafên Aborî, Civakî û Çandî, Xeleka çil û sêyem 2-20ê Mijdara 2009an; Şîroveya giştî j.21: Mafê her kese heye ji bo daxilbûna jiyana çandî (xal. 15, paragraf 1 ya Konseya Aborî û Civakî ya Neteweyên Yekbûyî). Konseya Mafên Mirovan ya Meclîsa Giştî ya Neteweyên Yekbûyî, Xeleka çil û çaran, 15 Hezîran-3 Tîrmeha 2020an, Xala rojevê 3: Berbelavkirin û parastin û pêşvebirina hemû mafên mirovan, mafên sivîl, siyasî, aborî, civakî û çandî. Rapora Lêkolînê li ser Azadiya Hunerî ya Îfadekirinê; Research Report on Artistic Freedom of Expression; Language Rights of Minorities: A Practical Guide for Implementation, United Nations Special Rapporteur on Minority Issues, 2017.


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

Tirkîye'yê ji bo *paragrafên 3yem û 4em yên xala 13em ya* peymanê îhtîraz kiriye û gotîye ew xal *dê di çarçoveya hukmên xalên 3yem, 14em û 42yem yên Makezagona Komara Tirkîye'yê bêne tetbîqkirin.* Ew paragrafên îhtîrazkirî derbarê avakirina saziyên perwerdeyê û azadiya perwerdeya dînî û exlaqî da ne.

Lêkolîna derbarê binpêkirina mafên hunermendên Kurd dê li ser şîroveyên azadîxwaz yên li belgeyên nûvejenkirî tête pêkanîn. Di belgeyên ji aliye Komîteyê ve hatine amadekirin da, gava Tirkîye'yê Peyman îmze kirîye, di heman demê da erkên Komîteyê jî qebûl kiriye, lewma ew qewil dike ku biryar û şîroveyên Komîteyê jî qebûl bike. Konseya Ewrûpayê jî xwedan belgeya derbarê mafên ziman e. Tirkîye'yê hêj ew belge îmze nekiriye. Dîsa jî, ji ber ku mafên di wê belgeyê da hatibe behskirin, wek mafên mirovan yên bingehîn hatine qebûlkirin, mirov dikare bêje ku Tirkîye mecbûr e wan mafan tetbîq bike. Li ser hemûyê ra, nabe ku neterefdarîya Tirkîye'yê bo peymanan an jî îhtirazên wê li dijî "qedexeya cudakarîyê" be. *Qedexeya cudakariyê* mafekî bingehîn e. Ji ber ku bi îmzekirina belgeyên navneteweyî ve wê qewil kiriye ku cudakariyê neke, lewma nikare îdîa bike ku bi wan xalan ve girêdayî nîne.

## Peymana Derbarê Mafên Medenî û Siyasî

Li qismê 1em yê xala 2yem a Peymanê bi vê vesazkirina li jêr ve cudakarî bi zimanekî qet'î hatiye qedexekirin:

> *"Her Dewleta terefdara vê Peymanê mecbûr in mafên di vê Peymanê da diyarkirî ji bo her kesê li welatê wan dijî û li bin hukmê wan e temin bikin û ji wan mafan ra rêzdar bin bêyî cudakariya statûya nîjad, reng, zayend, ziman, fikra sîyasî an jî fikreke dîtir, eslê neteweyî an jî civakî, milkîyet, zayînê an jî statûyeke din."*

Li gor vê xalê, dewletên terefdarên Peymanê divê hiqûqa xwe ya nevxweyî li gor hindê hevaheng bikin ku van mafan bi cih bînin.

Qismên 1em yên xalên 4em[20] û 5em[21] yên Peymanê mafên bingehîn pênase dikin ku nabe di Reşwên Awarte jî da bêne binpêkirin. Herwisa

20 Heke jiyana gel bête tehdîtkirin û rewşeke awarte ya fermî hebe, hingê bêyî ku li dijî berpirsîyariyên din yên hiqûqa navneteweyî bin û cudakarîyeke ji nîjad, reng, zayend, ziman, fikra sîyasî an jî fikreke dîtir têde nebe, dewletên terefdarên vê Peymanê dikarîn li gor pîvana rewşê tedbîrên derî vê peymanê wergirin.

21 Nabe ku ev çu hukmên ve Peymanê wisa bêne şîrovekirin ku dewlet, kom an jî şexs hinek azadiyên peymanê ji holê rakin an jî xebatên wisa bikin ku ji sînorên vê peymanê berfirehtir wan mafan asteng bikin.



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

mecbûr dike ku di astengiyên mafan da li kesê cudakarî neye kirin.

Di xala 26an da dîsa li ser tê sekinandin ku herkes li ber qanûnan wekhev e, bêyî çu cudakariyan divê herkes ji aliye qanûnan ve wekhev bête parastin. [22]

Di xala 27em ya Peymanê da wiha tê gotin,

> *"Li dewletên ku têda kêmîneyên etnîk, dînî an jî zimanî hene, nabe ku kesên ji van kêmîneyan digel endamên din yên koma xwe bêne pêparkirin ji mafên sûdwergirtina ji çanda xwe ji, bawerikirina bi dînê xwe û îbadetkirina li gor vî dînî, û herwiha ji mafê bikaranîna zimanê xwe."*

Tirkîye 23yê Îlona 2003yan bûye terefdarê vê Peymanê. Lê belê derbarê Peymanê da wê îzah û îhtîrazeke wê heye: Îhtîraz:

> *"Komara Tirkîye'yê xwedan wî mafî ye ku xala 27em ya Peymanê li gor hikmên Hevpeymana Lozanê ya 24î Tîrmeha 1923yan û pêvekên wê tetbîq bike."* [23]

Ew îhtîraz hatine rexnekirin ji ber ku li dijî qedexeya cudakarîyê bûn û dibe ku ruhê peymanê birîndar bikin. [24] Komîteya Mafên Mirovan ya ku endama venêrînê ya Peymana Mafên Medenî û Siyasî (PMMS) ye, di metnê encama venêrînan da ku sala 2011an weşandibû, dîyar dikir ku îhtîraza Tirkîyeyê bo PMMSê *rê vekiriye ku hinek komên kêmîne yên wekî Kurd û Romanan tûşî cudakarîyê bên û mafên wan asteng bibin û lewma bi awayekî neyînî bandor li ser kiriye ku ew kom çanda xwe bi cih neyînin û zimanên xwe bi kar neyînin*. Ew komîte dîyar dike ku her dewleta terefdara Peymanê mecbûr e hemû komên xwe yên etnîk, dînî û zimanî li hemberî cudakariyê biparêze û rê veke da ku ew kom ji mafên xwe sûdê wergirin. Lewma li gor fikra Komîteyê, divê Tirkîye ji bo bicihanîna mecbûrîyetên xwe, îhtîraza li ser xala 27em rake. Herwisa Komîte amaje bi astengîya ergnîgarî ya ku Tirkîye'yê danaye jî dike û bal dikîşîne ser wê hindê ku derbarê herkesê ku dikeve bin erka darazandinê, mafên wan temîn bike. [25]

Tirkîye'yê tembîyên lê hatine kirin red kiriye, bi taybetî tembîyê der-

22 Ji bo kesên ku bi Kurdî stran gotîne, an jî wek ku li hinek rewşên derketine ser medyayê jî dîyar dibe, ji bo kesên ku tenê bi Kurdî axivîne û şidet dîtine an jî hatine kuştin pêvajoya darazandinê nayê tetbîqkirin. Pratîkê wisa yên darazandinê şideta li hember koma pêwendîdar zêde dike.

23 Zeynep Elibol, Türkiye'nin Uluslararası İnsan Hakları Sözleşmelerine Koyduğu Çekinceler, İnsan Hakları Ortak Platformu [İHOP], 2015, sf. 8.

24 B.n.b., r. 8-9.

25 B.n.b. r. 15.


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

barê Kurdan û kêmîneyên din.[26] Komîteyê pêşnîyaz kiriye ku ji bo mafên Kurdan û yên kêmîneyên din bi temamî bê nasîn, divê Tirkîye îhtîraza xala 27em ya PMMSê têda, reforman bi cih bîne. Komîteya Mafên Mirovan Cotmeha 2012an endîşeyên xwe îfade kiriye derbarê cudakariya li hember kêmîneyan, bi taybetî ya li hember Kurd û Romanan, bicihanîna çanda wan û bikaranîna zimanê wan. Lewma hatiye îfadekirin ku hewce ye digel rakirina îhtîrazên navborî, mekanîzmayeke bandordar li hember cudakariyê bê avakirin û derbarê zimanê 3kerbê û sucên kerbê da, herwisa derbarê xwegihandina mafê perwerde û mafê milkîyetê da vesazkirinên hiqûqî bêne kirin. [27]

## Peymana Navneteweyî ji bo Berterefkirina Hercure Cudakariya Nîjadî (IAOKS)

Tirkîyeyê sala 1972yan da ev Peyman îmze kiriye û 16î Îlona 2002yan da ji meclîsê derbas kiriye û bûye terefdarê we:

Di xala 1em ya Peymanê da wiha tê gotin:

> *"Têgeha 'Cudakarîya nîjadî' her cure cudahî, vederkirin, astengkirin an jî tercih e li ser bingeha nîjad, reng, binyat, an reha neteweyî an jî etnîk ji bo lawazkirin an jî tunekirina nasîn, bicihkirina maf û azadiyên bingehîn yên siyasî, aborî, civakî, çandî an jî qadek ji qadên jiyana civatî sûdewergirtina ji van maf û azadiyan"*

Di xala 22yem ya Peymanê da wiha tê gotin:

Gava du yan jî zêdetir Dewletên Terefdar ên vê peymanê li ser şîrovekirin an jî bicihkirina Peymanê li hev nekin û ew lihevnekirin bi rêbazên aşkere yên Peymanê nehatine çareserkirin û herdu teref li ser çu rêyên din yên çareserkirinê pek neyên, hingê bi daxwaza yek ji Dewletên Terefdar, ew doz ji bo biryarê derbasî Dîwana Edaletê ya Navneteweyî dibe.

Tirkîye'yê îhtîraza xala 22yem kiriye û xwe ji bin berpirsiyarîya wê xalê vekişîyaye û şertekî wisa danaye ku gava Komara Tirkîye bû terefa lihevnekirinekê, berî ku doz derbasî Dîwana Edaletê ya Navneteweyî bibe, divê di her rewşê da muvafaqeta zelal ya Tirkîye'yê pêk bê. [28]

Komîteya Berterefkirina Cudakariya Nîjadî, di metna xwe ya dawî ya venêrînê da ku sala 2009an weşandîye, li ser hindê gotiye ku îhtîraz û beyanên Tirkîye'yê ziyanê didin tetbîqa temamê Peymanê. Lewma dîyar

26 B.n.b., s. 24-25.
27 r. 26
28 B.n.b., r. 7.


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

kirîye ku digel rakirina îhtîrazan divê astengîya ergnîgarî jî bête rakirin û ji Tirkîye'yê xwestiyê ku di nava salekê da derbarê mijarê wan agahdar bike. Tirkîye'yê hêj jî ev berpirsîyarîya xwe bi cih neanîye.[29]

Rapora Vekolîna Perîyodîk ya Navneteweyî ku li ber ronîya belgeyên navneteweyî yên wekî NY, Şertê NY, Beyannameya Mafên Mirovan ya Navneteweyî, tetbîqên Mafên Mirovan yên Tirkîyeyê dişopîne, 167 tembîyan li Tirkîye'yê dike. Ji wan 167 tembîyan 26 lib hatine bicihkirin, 41 qismen hatine bicihkirin û 81 lib jî qet nehatine bicihkirin. Ew tembîyên qet nehatine bicihkirin di van biwaran da ne: Mafên jinan, micadeleya li hember terorê, mafên zarokan, windakirinên bi darê zorê, cudakarîyar nîjadî, edalet, azadiya fikr û îfadeyê, miameleya şkence, tehdeyî an jî biçûkxistinê, kêmîne, perwerdeya mafên mirovan, azadiya dîn û baweriyê, meyla zayendî û nasnameya zayendî, azadiya civînê û ya avakirina komeleyê, penaber, miltecî, azadiya çapemenîyê, parêzerên mafên mirovan, civaka sivîl, hiqûqa mirovî ya navneteweyî, binpêkirinên mafan yên ku ji aliyê sixûrên dewletê ve têne kirin, miafiyeta ji cizayî, astengdarî, mercên girtîbûnê, ticareta mirovan.[30]

Îhtîrazên Tirkîye'yê bo xalên Peymanan û tembîyên ku qet bi cih neanîne, yek ji sedemên binpekirina mafên hunermendên Kurd e.

## Peymana UNESCO'yê ya Parastin û Pêşvebirina Curbicuriya Îfadeyên Çandî

Tirkîye sala 2018an bûye terefdarê vê peymana ku sala 2005an hatiye qebûlkirin. Xala 1em ya Peymanê parastin û pêşvebirina curbicuriya îfadeyên çandî wek armanca bingehîn dîyar dike û xala 2yem jî çandên kêmîneyan û yên gelên herêmî jî têda îtîbar û rêzeke hevaheng bo hemû çandan wek rêzikek dîyar dike û li dewletan tembî dike da ku di nav reftarên wisa da bin ku piştevaniya hevkarîgerî û dîyaloga navber çandî dike.

## Biryara Tembîyê ya UNESCO'yê Derbarê Parastina Statûya Hunermendan

Li biryara tembîyê ya ku li Civîna Belgradê ya sala 1980yan hatîye qebûlkirin, “hunermend” wisa hatiye pênasekirin: Hunermend ew kes e ku diafirîne an jî îfadeya afirîner peşkeş dike, an jî berhemên hunerî ji nû ve şîrove dike, afirînerîya hunerî wek parçeyek jêneger yê jiyana xwe

29 B.n.b., r. 15
30 B.n.b. r. 27.


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

dibîne û bi wî şiklî tevkarîya pêşveçûna huner û çandê dike, girêdayî kargehekê an jî komeleyekê bibe jî nebe jî wek hunermend tê pênasekirin an jî dixwaze bê pênasekirin. Herwisa peyva “statû” wek ku li jor hatiye dîyarkirin, li aliyekî wekî rêzdarîya bo hunermendî tête îfadekirin ji ber cihê wî yê li civakê û girîngiya bo rola wî, li aliyê din *bi referansa taybet bo mijarên dahat û ewlehîya civakî wekî nasyarîya maf û azadiya exlaqî, aborî û civakî ku hunermend jê sûd werdigire,* tê îfadekirin.

Di raporê da li qismê “analîza daneyan” hem li ber ronîya Peymanan, hem li ber ronîya *biryarên tembîyê* dê lê bête nêrîn ka dewletê piştevaniya pêwîst daye hunermendên Kurd bo xweîfadekirinê li nava civaka ku xwe parçeyek jê dibinin.


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

# BINPÊKIRÊNÊN MAFAN LI HEMBERÎ MUZÎKJENÊN KURD

Ji beşdaran şert û mercên wan ên destpêkirina hunerê hate pirsin. Herwisa ji wan hate pirsîn ka di wê pêvajoyê da malbat, derdora civakî û dewletê piştevaniya wan kirîye yan nekiriye. Dîsa ji beşdaran pirsên wisa hatine pirsîn da ku binpêkirinên îcrakirina hunerê yên ji zehmetîyên aborî, psikolojik, betalkirina bername û konsertan, îstîsmara kedê, şîdeta fîzîkî û devkî bêne xuyakirin. Bi wî awayî digel rehenda qanûnî me hewl da rehendên civakî, siyasî, aborî û çandî jî bêne fehmkirin.

Li kêleka pirsên hevpar bo muzîkjen û şanogeran, hinek pirsên cuda jî hatine pirsîn da ku binpêkinên taybet bo her qada hunerê bêne tesbîtkirin, Pirs li bin banê serenavên dîyarkirî hatine pirsîn û navê beşdaran hatiye qodkirin û bersivên wan li paragrafên cuda cuda hatine dayîn.

Hemû beşdaran gotine ew nikarin bi rêya hunera Kurdî debara xwe bikin. 5 beşdaran dîyarkirin ew bi karên formel yên wekî mamostetî û karkerîya şaredarîyê dikin, 11 beşdaran gotin ew karên serbest ên wekî karkerîya înşaatê, garsonî û pazarcîtîyê dikin. 3 kesan gotin ku wan berê li rêveberîyên herêmî li karekî bi muzîk û şanoyê ve eleqedar dixebitîn lê belê qayûman ew ji kar avêtine. 7 kesan gotin ew debara xwe bi karên wekî bernameyên sahneye, konsert û mamostetîya muzîkê ya taybet dikin ku bi karûbarên muzîkê ve eleqedar in. Beşdaran wisa îfadekirin ku ji ber îlana Rewşa Awarte û pandemîya COVID-19'yê îmkan nemaye ji bo îcraya hunerê bi rêya konsert, mîhrîcan û çalakîyên din. Çar beşdaran îfade kirin ku di wê pêvajoyê da ewil hevserên wan, eqrebayên wan alîkarî danê ji bo berdewamiya jiyana wan ya hunerî.

Di encama hevdîtînan da peyda bû ku piranîya binpêkirinên mafan ji binpêkirina qedexeya cudakarîyê pêk tê. Nêrînên cudakar yên di dîyarkirina polîtîkaya çandê û di pêvajoya qanûnkirinê da derdikevin holê, di gelek astên cuda da xwe xuya dikin wekî nedayîna sahneyan li şanoyên dewletê, bêpiştevaniya aborî bo îcraya hunera bi Kurdî û helwestên hêzên ewlehiyê yên qedexekirina keyfî ya îcrakirina hunera bi Kurdî.


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

Şîdeta fîzîkî, îstîsmara kedê, zehmetîya peydakirina platformekê ji bo îcraya hunera xwe tê wateya binpêkirina qewlê dewletê yê xala 15em ya Peymana Navneteweyî ya Mafên Aborî, Civakî û Çandî ya NY ku berpirsîyariya piştevaniya çand û hunerê bi awayekî wisa dike ku jiyaneke çandê ya piranîparêz derkeve holê. Herwisa ew kiryarên xerabker binpêkirina qewlê piştevaniya hunermendan û jiyana hunerî ku di qismê destpêkê û di xala 64em ya Makezagona Tirkîye'yê da hatine destnîşankirin.

Di destpêka hevdîtinan da ji beşdaran motîvasyona wan ya derbarê Kurdî û hunera Kurdî û herwisa fikrên wan yen derbarê pratîkên hunera wan hate pirsîn.

## Qedexeya Zimanî û Bandora Wê li ser Arastebûna Hunerê

**Muzîkjen (M)1:** *Kurdî min ji aliyên manewî û psikolojik ve têr dike. Tu dizanî ku tu li nav gelê xwe yî… Tu pêdivî dibînî ku xwe bi rehên xwe ve gire bidî ku bi perwerde, televizyon û alavên wekî wan ve hatine qetandin. Lê ev yek bi hêsanî nabe. Li muzîka rojavayê, muzîka klasîk aramî heye. Lê belê li muzîka Kurdî hêrs heye… Mirov dixwaze ji bo ku tenê muzîkê bike xwe jê dûr bixe, lê tu çend xwe bidî aliyekî jî ji bo hevyekbûnê divê tu bikevî navê.*

**M6:** *Ji ber ku ez Kurd im. Ez li malbateke Kurdperwer bi ruhekî Kurdewar hatime mezinkirin. Diya min j imin re digot divê mirov ji berê xwe xwarina xwe bixwe, ne ji berê kesê din. Kurdî jî berê min e. Li Ewrûpa'yê gelek derfetên strîna bi zimanên din peyda bûn û perwerdeya min ya navneteweyî jî bingeha vê ji bo min saz dikir. Lê hem ez ji tiştekî wisa tirsîyam hem jî ew li giyanê min nehat. Min xwest li ser rêya xwe berdewam bikim ku ez ji bo hatime mezinkirin.*

**M9:** *Gava min bi Kurdî Ciwan Haco, Şivan Perwer, Nîzamedîn Arîç, Mihemed Şêxo û gelek hunermend û dengbêjên din ên Kurd guhdar kir, ez bi hêz û dewlemendiya muzîka Kurdî sêhrî bûm. Lê dûvra min nihêrî haya kesê ji vê muzîkê nîne. Lewma min biryar da bi awayekî profesyonel bi muzîka Kurdî mijûl*


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

*bibim û vê muzîkê bi hemû dewlemendiya xwe ve bi dinyayê bidim nasîn.*

**M4.** *Ez li derveyî Kurdistanê mezin bûm. Lewma her kesereke zimanî heye li cem min. Pîrka min kilamên gelek xweşîk digotin û çîrok vedigotin. Lewma axaftina bi Kurdî bi xwe jî bo min her tiştekî efsûnî bû.*

**M8:** *Ez li Kurdistana Başûr ji dayîk bûm. Lewma muzîka Kurdî ji bo min tercihek nebû. Jixwe em bi Kurdî diaxiftin. Me bi Kurdî stran digotin. Piştî min bar kire Tirkîye'yê, min dît ku îcraya muzîka Kurdî meseleyeke tercîhê ye.*

Ji beşdaran yên ku 'emrê wan têrê dike û ew salên qedexeyê tên bîra wan, derbarê wan salên qedexeyê û serpêhatîyên wan ka çawa rû daye li muzîka wan wiha gotine:

**M3:** *Du motîvasyonên min hene. Yek înkara ziman û çanda Kurdî ye. Ew dibe ajoyek ji bo lêxwedîbûn û keşfkirina zimanê xwe. Ajoya din jî hebûna Kurdan e ku dewlet wan asîmîle dike û ziman û çanda wan înkar dike. Bi ya min, bi taybetî piştî salên 2000î xetereya herî mezin ev bû. Min xwest bi muzîka xwe ve bersiva vê yeke bidim.*

**M5:** *Mirov di atmosefereke polîtîk da muzîka Kurdî nas dike. Muzîk hem mecrayeke ku tu çîroka xwe ya siyasî guhdar dikî hem jî têda xwe dibînî û îfade dikî. Lê ev ji Kurdan tercihek nîne, ew bi sere wan hat. Muzîkê di nava şerî de şêwaz û wateya xwe peyda kir… Ez bi rêya muzîkê hewl didim li hember şerî bisekinim û muzîkê wek alternatîfa şerî ava bikim.*

**M11:** *Heke mijara axaftinê hewceyî zimanekî akademîk be, hingê ez xwe bi Tirkî çêtir îfade dikim. Ji ber ku min bi zimanê xwe yê dayikê perwerde nedît. Lewma gava muzîka bi Kurdî icra dikim, divê zêdetir ked bidim. Ew cihê xemgîniyê*


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

*ye, lê gele watedar e. Bo min watedartir e ku ez tiştekî bi zimanê xwe pêk bînim û bi ya min pêwîstiya vê heye. Ya din jî, di dibistana seretayî da, heftya ewil min bi xwe da mîz kiribû, ji ber ku min nedikarî xwe îfade bikim. Ew bi serê gelek zarokan tê. Ez dibêm belkî ez muzîka xwe ji ber hindê dikim da ku ew tişt dubare nekin.*

**M12:** *Salên 90î gundê me şewitandin. Em hatine Stenbolê. Min peyveke Tirkî jî nedizanî. Li kolanan herkes bi Tirkî diaxivî. Bo min tiştekî ecêb bû. Tê bîra min, navê 'Mert' bo min ecêb bû. Min digote xwe Tirkan çi navên ecêb hene. Piştî wextekî min mekteb jî berda. Li pêşîya Fakûlteya Tibê ya Cerrahpaşayê min mendil difirotin, min ji xwe ra stran digotin. Hinek xwendekar hebûn, ji min hez dikirin. Bo min gîtarek kirîn û ez elimandime lêdana wê. Û hişmendîyek jî dane min. Wisa wisa min dest pê kir, lê ez ji Kurdî jî dûr bûbûm. Min li kafeyan felan bi Tirkî stran digotin. Ez çûme eskerîyê hatim. Min dîsa bi Tirkî muzîk îcra dikir, paşî rojekê min bihîst ku li derve sirûdên bi Kurdî dixwînin, wê gelek bandor li min kir. Zaroktîya min hate bîra min, cihê jê hatime. Min dest pê kir hêdî hêdî bi Kurdî got. Hezkirîyeke min hebû. Hindî min bi Kurdî got, ew ji min dûr ket. Derdora min ya bere hemû ji min dûr ketin. Min jî piştî midehekê dev ji gotina Tirkî berda. Yanî dikarim bêjim ku wan bi temamî berê min da îcraya muzîka bi Kurdî* (dikene).

## Bandora Bêstatûbûna Zimanê Kurdî li ser Nêrîna Malbat û Derdora Civakî ya Derbarê Hunera Kurdî

Ji beşdaran hate pirsîn ka malbatên wan bûne pişta daxwazên wan ên hunermendbûnê û sedemên hinde jî jê hatine pirsîn. Ji bilî du malbatên ku bi xwe jî bi hunerê ve eleqedar in, yên mayî yan bi temamî li dijî daxwazên zarokên xwe bûne yan jî piştgirî nedanê. Tête dîtin nebûna dahateke aborî ya muzîka Kurdî û nebûna statûya wê ya sosyal û herwisa endîşeyên malbatan yên siyasî sedemên sereke ne bo helwesta neyînî ya malbatan. Endîşeyên berdewam yên derbarê îcraya muzîka Kurdî girêdayî


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

ye bi bîra dîrokî ya tijî şkence ya nifşên berê yên îcrakarên muzîka Kurdî. Nizimbûna statûyê û derdê debarê ajoyên din in ku bandorê li ser helwesta malbat û derdora civakî dikin.

**M1:** *Wan berê min da cihekî wisa ku bibim xwedan meslekek da bikarim karekî wisa bikim ku debara xwe pê bikim. Lê eleqeya min bi hunerê hebû. Ez jî çûme lîseya 'hunerên ciwan'. Wek encam dikarim bêjim min çu piştevaniya malbata xwe nedît.*

**M2:** *Li malbat û derdora eqrebayan ez muzîkjenê ewil im. Min dixwest muzîkê wek karekî profesyonel îcra bikim, di serî da ew daxwaza min bo malbata min ecêb hat. Li gorî wan muzîkjenî mijûliya mitriban bû, li herêma me bi piranî mitriban muzîkjenî dikir. Lewma gelek caran henekên xwe bi min dikirin û digotin 'hema ji malbata me mitribek kêm bû, ew jî temam bû.' Lê niha gava lê dinerim, hurmeta hemûyan heye bo karê min, ji bo zarokên xwe enstrûmanan dikirin û wan dişînin kursên muzîkê.*

**M3:** *Malbata min neyînî bû, min gelek zehmetî dîtin. Lê min berdewam kir ji ber ku muzîk bo min ne kar lê perpirsîyarîyek bû.*

**M5:** *Dibe ku ji ber mekanên îcraya muzîka Kurdî be, lê piştî şeva ewil ya performansa min, bavê min hat tif kire min.*

**M11:** *Malbata min nebûn asteng, lê nebûn pişta min jî. Li herêma ma muzîkjen ew kes e yê ku li dawetan lê dide, dibêje, lewma wek karekî baş nayê dîtin. Salên xwendekariya zanîngehê gava diya min dît ku ez li gîtarê dixim got 'ma tu li ser dersên xwe bixebitî çêtir nîne?'. Gava min banda xwe ya yekem bi bavê xwe da guhdarî kirin, qet hez ji şêweya nûjen ya muzîkê hez nekir û got 'ew qas kilam û stranên me hene, vêca ev çiye?'.*
**M7:** Min, wek keça muzîkjenekî, di emrekî biçûk da muzîk nas kir. Bavê min wiha gote min *"Ez û tu gelek dişibin hevdu, lê*


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

*ferqeke me heye. Bavê te destûrê dide, lê bavê min destûr nedida."*

**M6:** *Ji ber ku ez li malbateke Kurdperwer û hunermend ji dayîk bûm, malbata min bûne pişta min û hêj zarok bûm perwerdeya muzîk û dansê bi min dane wergirtin.*

**M8:** *Ez li malbateke hezkirîyên muzîka Kurdî hatime dinyayê, lê ji ber sedemên aborîyê bavê min nedixwest karê me yê eslî bibe muzîkjenî. Lewma min di mektebeke wisa da xwend ku bibim xwedan meslek, lê dilê min jî hişê min jî her li cihekî dî ma.*

**M9:** *Min endazyarî û dûvra jî perwerdeya mamostetîya muzîkê nivco hêla. Malbata min li hemberî min bû ji ber ku bêyî meslekek ez bi muzîkê ve eleqedar dibûm. Nîyeta wan xerab nebû, wan dixwest min biparêzin. Ji ber ku herdu jî di îcraya muzîka gelêrî da xwedan behre bûn, wan israr xwe zêde berdewam nekirin.*

**M4:** *Malbata min li dij nebûn, lê piştevanî jî nekirin. Wan got mekteba xwe xilas bike, bo xwe bibe xwedan karekî. Lê ji ber ku ez ji malbateke berfireh bûm, endazlariya malbatê li ser min gelek bû. Piştî ez piçekê navdar bûm û derketime ser televîzyonê, wan girîngîya karê min fehm kir û helwesta wan guherî.*

**M13:** *Ji ber ku ez qîz bûm wan nexwest bi muzîkê ve eleqedar bibim, lê piştî hezkirîna min bo muzîkê dîtin, li ber min nesekînin.*

Du hêman derdikevin pêş ji bo berêxwedana muzîka Kurdî. Yek berpirsiyariya li hember Kurdî ye ku ji trawmaya xweneîfadekirina bi zimanê dayika xwe der tê. Ya duyêm jî piştevaniya malbatê ye bo Kurdî û hunera bi Kurdî. Encameke din ya hevdîtinan ew e ku rakirina qedexeyên li ser zimanî îcraya muzîka Kurdî din av civakê da mumkin kirîye, lê dewletê çu


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

hunermend derbarê muzîka Kurdî da teşwîq nekirine û piştevaniya wan jî nekiriye. Herçend qedexeyên li ser Kurdî bi awayekî berteng hatibin rakirin jî, aşkere bûye ku ji bo piştevaniya geşedana hunerî ya bi zimanekî ku 70 salan qedexekirî, çu polîtîkayên telafîkirinê nehatine birêvebirin.

Hinek malbatên bi muzîkê ve eleqedar bi xwe jî nexwestine zarokên wan muzîka bi Kurdî îcra bikin. Helbe mirov nikare vê bêdilîya wan malbatan bi hêcetên şexsî ve îzeh bike. Bi ya me, ji ber ku muzîka Kurdî karekî bêdahat e, statûya wê ya li nav civakê kêm e û ji qedexeyan jî para xwe werdigire, lewma malbatan helwesteke wisa heye. Ew rewş dîyar dike ku dewlet derbarê nasîna hunermenên Kurd û piştevaniya wan bi polîtîkayên dewletî berpirsîyariyên xwe yên ji belgeyên navneteweyî neanîne cih, di serî da berpirsîyariyên ji *Biryara Tembîyê ya UNESCO'yê Derbarê Parastina Statûya Hunermendan*.

## Binpêkirinên Mafan yên Derbarê Helwestên Fermî û Popûler li hemberî Kurdîyê

Herçend qedexeyên li ser Kurdî bi awaeyekî sînordar hatibin rakirin jî, di hevdîtîna da hate dîyarkirin ku astengîyên psikolojik yên li ber îcraya muzîka bi Kurdî hêj jî berdewam in. Ji muzîkjenên beşdar 6 kesan anîne ser ziman ku ew ji bilî Kurdî, di serî da bi Tirkî, Ermenkî û Erebî jî muzîkê îcra dikin. 3 beşdaran jî gotin ku herçend ew di konsert û bernameyên xwe da bi zimanên din (bêtir bi Tirkî) stranan bêjin jî di albûmên xwe da ew tene cih didine stranên bi Kurdî. 6 beşdarên mayî gotin ku ew di hemû çalakîyên xwe da tenê bi Kurdîyê emel dikin. Sedemê sereke yê ku hunermend li gel Kurdî, bi Tirkî jî strana dibêjin derdê debarê ye, ji ber ku gava tenê bi Kurdî dibêjin, nikarin bi hêsanî sehneyan peyda bikin ji bo îcraya hunera xwe. Bi vê ve pêwendîdar, sedemeke din jî ew e ku bayê civakî û siyasî îcraya tenê bi Kurdî wekî gef û qebahetekî dibîne. Beşdaran anî ser ziman ku ji bilî zordariya piyasayê, xwedanên mekanan, guhdaran û organîzatorên konsert û mîhrîcanan li ser wan zordarî kiriye ku bi Tirkî jî staranan bêjin.

> **M1:** *Li bajarê berê lê dimam mumkin nebû ku muzîka Kurdî îcra bikim. Wan muzîka bi Kurdî dijberî nirxên komarê didîtin. Lewma ez hatime Stenbolê. Lê, li vir jî gava bi Kurdî dibêjim, miheqeq ji min dixwazin ku bi Tirkî jî bibêjim. Hin caran*



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

*xwedanên mekanan destûrê didin, lê gava guhdaran mirûzê xwe tehl kirin, bernameyên rêzê da têne betalkirin. Gava tu bi Kurdî dibêjî, ew wisa hisab dikin ku tu li pîrozîyên wan sixêfan dikî. Yan jî yê guhdar çepgir e, gava tu bi Kurdî dibêjî, ew ji te ra dibêjin 'şowen'. Carekê di rewşeke wisa da êrîş anîn ser min da li min bidin.*

**M9:** *Li ber Kurdî astengîyên psikolojik hatine avakirin. Îcraya bi Kurdî bi xwe wekî sûcekî li hember welat û dewletê tête dîtin. Li mekanên sekûler yê bi alkol jî rewş wisa ye. Mirovî didene zorê ji bo ku bi Tirkî bibêjin, heke nebêjî, an jî nizanî bêjî, dibe alozî... Li mekaneke wisa da me bi Kurdî stran digotin, hinek guhdar rabûn strana 'Ölürüm Türkiyem' xwestin. Yanî tu stranên anonîm ên bi Kurdî dibêjî, ew vê yekê wek êrîşeke li ser welatê xwe dibînе. Tu dibêjî em stranên siyasî nabêjin, ew dibêje daxwaza min siyasî nîne, ew strana hezkirina welatî ye. Tu jî dibêjî erê berê wisa bû, lê niha guherîye, ya siyasî ye, dikevî nav nîqaşên tahl. Li hinek mekanan jî gava staranên bi Tirkî dixwazin, tu dibêjî nizanim, paşî ew gelek aciz dibin. Bo mînak li Dîyarbekîrê, li Batmanê bernameyê çêdikî... guhdar exleb Kurd in, lê hinek caran yek du hemşîre an jî karmend jî hene li nav guhdaran. Dibêjin bi Tirkî jî bêje. Baş e, dibêjî, ezê bêjim lê çima didî zorê. Ma gava tu diçî Fransayê, tu dibêjî ez Tirk im, bi Tirkî bêje? Ma we qet bihîstîye ku li cihekî din ê dinyayê hunermendekî didin zorê ku bi zimanêkî din jî stranan bibêje? Li vir pirsgirêk zordarî ye.*

**M4:** *Me li dibistaneke baş muzîkeke pirzimanî îcra dikir. Em navdar bûbûn. Dîsa jî çavên gumanê her li ser me bûn. Rektor carekî tene jî nehate konserteke me. Gava zêde bi Kurdî guhdar dike, ew dixwaze bi Tirkî jî bibîhîze. Heçkû tiştek ji destan diçe. Dibên te îro zêde bi Kurdî got (dikene).*

**M8:** *Niha tu serlêdana mîhrîcanekê dikî. Ji me repertûwar dixwazin. Em jî dişinin. Repertûwara tenê bi Kurdî qet qebûl nakin. Dibêjin bi Tirkî jî bêje. Jixwe heke festîwaleke li*



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

*herêmên Ege û Behra Reş be, stranên bi Kurdî qet qebûl nakin. Kurdî wek zimanekî Tirkîye'yê nayê hesibandin. Ev jî hejmara mekanên te kêm dike. Çawa ku streneke bi Tirkî li her derê tê îcrakirin, divê ya bi Kurdî jî li Ege'yê, li Behra Reş bê îcrakirin, ne tenê li herêm û bajarên Kurdnişîn.*

**M7:** *Kesên ji gelê me bi xwe jî, yên Kurd jî ew qas asîmîle bûne ku bi zimanê xwe nizanin, lê ji guhdariya Kurdî hez dikin. Mînak navê yekê Dîlan e, ji min re dibêje 'ez gelek ji te hez dikim, lê ji strana te fehm nakim, ka ji bo min wergerîne.' Navê wê Dîlan e, ji guhdariya Kurdî hez dike, lê jê fehm nake. Li nav guhdarên Kurd vêca hewldana Tirkîkirinê jî heye. Strana mirovî bi mirovî didin wergerandin. Ez tenê ji bo xwe nabêjim, gava malperên hevalên din ên hunermend dişopînim ez vê yekê gelek caran dibinim. Gelekan li bin stranên xwe wergera wan a Tirkî jî nivîsandine. Kesek ji Sezen Aksu'yê re nabêje 'ez ji te fehm nakim, ka vê wergerîne ser Îngîlîzî'. Ji ber ku bi wî zimanî ji wê hez dikin lê li ba me wisa nîne. Herdem li ser wergerê zordarîyek heye. Em bi israr hewl didin muzîka Kurdî îcra bikin, bi israrî wî zimanî li ser wan ferz dikin. Ji ber ku em dixwazin lê bibin xwedan, ji ber ku xeyalên me, xewnên me bi wî zimanî ne. Lê mixabin rewşeke wisa ya zordarîyê heye.*

Mirov dikare acizîya guhdaran ji muzîka Kurdî an jî dîtîna wê wekî gefekê, wekî encama siyaseta çandê ya yekker û vederker bibine. Herwisa mirov dikare bêje ku dewlet bêdil û têkçûyî ye ji bo berbelavkirin û bicihkirina siyaseta nû ya çandê li nav hemû hemwelatîyên xwe, ew siyaseta ku hewl dabû di pêvajoya endamtîya YE'yê de bi cih bîne. Zordarîya guhdarên Kurd bo wergera stranên Tirkî bo Kurdî jî nîşaneya bandordarbûna polîtîkayên asîmîlasyonê ye.

## Zehmetî û Binpêkirinên Mafan yên ku ji Kêmbûna Mekan û Sahneyan Der Tên

Beşdaran anîn ser ziman ku mekanên guncav bo îcraya hunera wan gelek kêm in. Kêmbûna mekanên guncav wekî sedemê sereke hate nişan-



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

dan ji bo tengasîyên aborî ku jê bêzar in. Di encama hevdîtinan da derkete holê ku ji ber psîkolojîya neyînî ya polîtîkayên çandê û herwisa ji ber ku dewlet perpirsîyariyên xwe yên ku bi qanûn û peymanên navneteweyî qewil kirîye, bi cih naînê, tengasîyên derbarê mekan û sehneyan û binpêkirinên mafan yên pêwendîdar der tên.

> **M1:** *Li kolanê muzîkê îcra dikî, gava guhdar ferq dikin ku bi Kurdî ye, bertekan nîşan didin. Hin caran em ji hevalên muzîkjen daxwaz dikin ku li bernameyên me enstrûmanan lê xin, ew dibêjin heke bi Kurdî bibêjî, nabe. Lewre heke bi Kurdî muzîkê îcra bikî, wisa difikirin ku 'nîyeteke' te ya ji bilî îcraya muzîkê heye. Tengasîya herî mezin jî ev e: gava yek bi Kurdî stranan bibêje, hejmara mekanan bi yekûkek kêm dibe. Lewma derfet namîne ji nav mekanên ku jixwe kêm in, em ya bi dilê xwe hilbijêrin… Ez hunermendeke jin im… Gava bi Kurdî stranan dibêjim, hinekan îma kirin ku 'Ez xiyanetê li nîmetên Komarê û Atatürk dikim ku weki jineke xwendî ez qaşo (dikene) hebûna xwe deyndarê wî me… Niha bi taybetî li nav çepgiran neteweperestîyeke neîtîrafkirî heye. Bo mînak mîhrîcanên qedirbilind hene. Em serî lê didin, lê bersiva wan neyînî ye û sedemê wê jî nabêjin.*

> **M9:** *Ma ez ê muzîka xwe li ku îcra bikim? Ez li kafeyan muzîkê îcra dikim, konsertan didim. Ez gelek li ber xwe dikevim ku li kafeyan ji bo 'menûya fîks' stranan dibêjim. Carekê di navbera bernameyê da li balkonê bo halê xwe girîyam. Gelek li min giran tê ku ji bo kesên guhdariya min nekin, wek pêxwarinê stranan bêjim. Li şûna hindê ez dixwazim biçim welatê xwe, stranan berhev bikim, besteyan çêbikim. Lê niha ew derfeta min nîne. Ya me, ne lobîya me heye ne piştevanên me… Em keda xwe didin karên derveyî muzîkê. Êdî naxwazim li kafeyan muzîkê îcra bikim, lewma ji bo xwe li karekî digerim.*

> **M8:** *Mekan bi piştevanîya sazûmanî ve girêdayî ye. Ji bo hunermendan mekanên herî baş, mekanên saziyên wekî şa-*



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

*redarîyan in ku xwedan sehneyên mezin û şiyana amadekirina çalakîyên mezin in. Lê hunermendên Kurd bi piranî ji vê yekê bêpar in. Me li Stenbolê ji bo konserteke serî li şaredarîyê da, gotin ka em li repertuwara we binêrîn û paşî jî gotin hûn her bi Kurdî dibêjin û destûr nedan. Hinek hevalên me karmend bûn lewma me nexwest mijarên dirêj bikin û hev aciz bikin.* [31]

**M4:** *Me xwest li bajarên cuda yên Tirkîye'yê konsertan bidin. Mesela em ê biçûna Îzmîrê. Xwedanê mekanê Kurd e, wiha dest bi gotinê dike: 'Em gelek ji we hez dikin, lê tu girseya me dizanî. Em niha we derbixin…' Ew naxwazin ji guhdarên Tirk bibin. Li vir pirsgirêkeke wisa heye. Gelo mirov dikare vê yekê bi guhdarên Kurd ve telafi bike? Nexêr. Ji ber ku guhdarên Kurd gelek li bin bandora konjûkturê ye, heke bayê siyasetê biçek xerab be, nayên guhdariyê. Heke piyasaya muzîka Kurdî nebe, xwedanên mekanan jî naxwazin cih bidin hunermendên Kurd. Li Stenbolê xwedanên gelek mekanan Kurd in, lê piştevaniya muzîka Kurdî nakin. Erê rast e, zordariya dewletê heye, tirs heye… Lê te jî burjûvazîyeke neteweyî ava nekiriye. Dewlemendên te hene, lê burjuvaya te nîne. Li Diyarbekîrê, li Geverê bi xwe jî em zehmetiyê dikêşin bo peydakirina mekanan. Li Geverê hevalan serlêdana mekanekê kiriye, wan jî gotiye ' Niha ev dê tenê bi Kurdî muzîkê bikin' û serlêdana me qebûl nekirine. Niha heke te burjuvaziyek hebe û polîtîkayeke te ya hunerê hebe, tu miletekî bi 20 mîlyon kesan î, divê tengasîya mekanan nebe. Here 3 mekanan veke, bi kar nebin jî bêje hema dê muzîka Kurdî bête kirin.*

**M3:** *Jixwe gava muzîka Kurdî îcra dikî, tu jî rehet nînî, xwedanên mekanan jî. Dillerzîyek heye heçkû her gav dê pirsgirêkek biqewime. Mirov mecbûr e herdem derdorê kontrol bike.*
M5: *Stenbol, Îzmîr, Enqere ferq nake, xwedanên mekanên ku em lê derdikevin sehneyê bi piranî ji me ne. Guhdar jî wisa.*

31 Li jêr, li qismê çalakiyên lêgerîna mafan li hemberî binpêkirina mafan, di daxwaza mafan da mijara 'ji bo ku hev zêdir aciz nekin' dê bêtir bête rojevê.


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

*Derfet nîne ku mirov li mekanên cuda derkeve û xwe bigehîne girseyeke gelek cuda. Û ew jî heye, gava muzîka Kurdî îcra dikî, gelek caran mecbûr î bileta xwe bi xwe bifiroşî.*

**M7:** *Heke muzîka bi Kurdî bikî, derfeta te nîne li mekanên gelek mezin derkevî. Mirov li mekanên biçûk xitabî hejmareke kêm ya guhdaran dike. Gava wisa be hem nikarî pere qezenç bikî hem jî di eslê xwe da wisa hîs nakî ku te xwe gihandiye guhdaran.*

**M12:** *Min bi muzîkjenîya kolanê dest pê kir. Li rawestgeha metroyê ya li ser rêya balafirgehê û li gelek rawestgehên din jî min muzîk îcra dikir. Bi hezaran kes ji wan deran derbas dibûn. Gava min dest pê kir bi Kurdî jî got, şefê rawestgehê hat hişyarî da min. Binêrin, min got, bi hezaran kes ji van deran derbas dibin, hemû jî Tirk nînin, çend baş e ku muzîka pirzimanî îcra dikim. Gotin bi Kurdî nebêje. Ew qas zordarî kirin, min jî got le'net lê be, û jê geriyam. Li Şîrinevlerê jî min muzîkjeniya kolanê dikir. Navbera min li gel esnafan baş bû. Ji min hez dikirin. Dûvra min hêdî hêdî bi Kurdî jî got. Helwestên wan guherîn. Û dûvra derbasî helwesteke neyînî bûn. Min li Îstîklalê dest bi gotinê kir. Polîs her dihatin, digotin tişt û miştên xwe rake ji vir. Rojekê min gotê 'Ji bo xatra Xwedê, li ser vê cadeyê muzîkjenên ku bi Erebî û Farisî jî dibêjin hene, çima ji wan re tiştekî nabêjin.'*

## Binpêkirinên Mafan yên ku ji Îstîsmara Aborî Der Tên

Beşdaran îfade kirin ku muzîkjenên Kurd van salên dawiyê dest pê kirine tevnên hevkariyê ava dikin û bi hev ra micadeleya lêgerîna mafan dikin. Wan gotin ku di serdemeke ku têda gelek berhemên bi Kurdî hatîne Tirkîzekirin û li ser navên kesên din hatine tomarkirin da micadeleya mafên telîfê û yên tescîlê hîna nû tê destpêkirin. Herwisa hate îfadekirin ku saziyên dewletî mekan û sehneyên xwe ji bo îcraya muzîkê nadine muzîkjenên Kurd, lewma ew bêtir lawaz in li ber îstîsmara piyasayê.


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

## Îstîsmara Aborî ya Xwedanên Mekanan

**M9:** *Ez li mekanekê derketim sehneyê. Ji ber ku pereyên min nedane min, ez çar mehan bê xanî mam. Her roj li maleke cuda dimam. Min go ez ji konsertan pere qezenç bikim, gava navê min ditîne, konsert betal kirine. Van salên dawiyê bi gotineke mıhafezakartir konsertan betal dikin. Dibêjin jin û zilam têne ba hev, araqê vedixwin û bêedebîyê dikin, lewma konsertan betal dikin. … Helbet îstîsmara kedê heye, lê îspatkirina wê û li hember wê lêgerîna mafan gelek zehmet e, ji ber ku piranîya hunermendên Kurd bêpeyman dixebitin. Ez dizanim, wisa gelek zêde windakirina mafan çêdibin.*

**M8:** *Ji ber kêmbûna sehneyan em tenê li hinek cihên diyarkîrî derdikevin. Em li Sehneya Stenbol Moda'yê derketin, mala wan ava, sehne dan, lê salona wan teng e, kêm mirovan werdigire. Sehnekirin karekî bi mesref e. Dawiya konsertê lê dinêrî ku te ji berîka xwe pere daye. Ya rast, di vê rewşê da divê em çu bernameyan çênekin.*

**M1:** *Mirov tê wê radeyê, dibêje hema ez mekanekê peyda bikim ji bo parvekirina hunera xwe, temam e. Xwedanê mekanê jî dizane derfeta te ya mekanên din nîne û tu nikarî bazarê bikî. Lewma dibêje ji %60 pereyê daketinê û ji %30 pereyê vexwarinan dê wergirim. Hingê bo me qet pere namîne. Heta gelek caran heqê muzîkjenên li gel te derketine sehneyê jî ez bi xwe didim. Heke karekî min yê bimeaş nebûya, min nedikarî vî karî bikim.*

**M4:** *Di îcraya Kurdî da pirsgirêkeke wisa heye. Cihên bi prestij hesastir in ku cih nedin Kurdîyê. Ji ber ku hem nexwazin xwe têxin xetereyê, hem jî dibe ku profîla guhdaran bibêje em hatine kêf bikin, dilê xwe xweş bikin, vêca Kurdî ji kû derket. Hingê bo me jî tenê mekanên biçûk dimînin. Ya wan jî qewareya wan, aborîya wan dîyar e. Nemimkûn e ku em jê pere qezenç bikin.*



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

**M3:** *Gava mirov muzîkê dike, dixwaze vê bi komeke guhdaran ra parve bike. Gava mirov li mekanekê bernameyê çêdike, kêf û coşa strînê ya kêfkirinê gelek zêde ye. Ji bo wan bi xwe jî hin caran mirov ji bêrîka xwe pere dide. Ez bi xemgînî dibêjim ku min bi xwe, piştî gelek bernameyan heqê hevalên muzîkjen ji karta xwe ya qredîyê kêşaye û daye wan an jî herçend min bi xwe tiştek wernegirtibe jî kêm jî be heqê hevalan daye wan. Ew tecrûbeyên rûreşker bûn, lê mixabin wisa çêbû. Belkî jî ewê wisa berdewam bike, nizanim. Ji bilî kêmbûna heqdestî, îstîsmara rasterast jî dibe helbet. Me carekê bernameyek çêkir. Xwedanê mekanê got 'Bira hûn dibinin, rewşa me jî baş nîne, em heqê we dûvra bidin' û helbet dûvra nedan. Cara duyê, me pereyê xwe pêşîn xwest, me go wisa nabe.*

**M10:** *Li mekana hevalêkî ku xwe mixalîf didît, ew ên qaşo hem rola çînî hem jî ya nasnameyî baş helandiye, em derketin sehneyê û wî bi awayekî aşkere heqê me xwar. Em saet 8ê derketin. Bernameya me du saet bû. Ew mekan jî cihekî bi alkol bû. Û me berê nedizanî ka muzîka me dê li wir bê yan neye. Ji ber ku em muzîka guhdariyê îcra dikin, ne ya barê. Got xelk dixwaze we bibine, israr kir, em jî çûn. Mekan tijî bû, em saet 8ê derketin sahneyê, saet 10ê hatine xwarê, em ê derketana. Got 'Keko ma hê zû nîne?' Min go ma tu li hêviya çi bûyî? Got 'Hinêkên din jî, hin komên din jî li vir derketin, 4 saetan man… Mûşterî hê rûnîştî ne, ew pere nadin, ez jî nikarim pere bidim we'. Min go mûşterî dê kengî rabin, got 'nizanim'. Min go çawa nizanî, ma heke ew heta saet 2yê bimînin, em ê li hêvîya wan bin. 'Êêê bi mecbûrî' got. Çû adisyon anîn ber me, go 'Binêrin me ev qas pere qezenç kiriye, ev qas araq firotîye.' Min adisyon dayê û gotê eve ne karê min e, ez û tu li ser kaşeyê li hev hatin. Ev kar wisa nabin. Heqdestê me neda, me jî lê da em çûn. Hevalan gotin 'Em vî qeşmerî îfşa bikin, û pereyî wernegirîn.' Hat pereyekî kêm jî min re anî, go 'Yê mayî jî îşte ez ê ji we ra bişînim. Nexêr min gotê, em pereyê xwe dixwazin. Ew jî yekî muzîkjen e, niha naxwazim navê wî bidin, lê yekê naskirî ye.*


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

## Îstîsmarên Aborî yên ku ji Peymanên Telîfê yên Şirîkeyên Muzîkê Der Tên

> **M6:** *Gava mirov albûmekê çêdike, peymaneke wisa bi we didin îmzekirin ku ji aliyê aborî ve ji we ra tiştek nemine. Şirîkeyên plakan ji rêjeya firotinê dinerin, heke tiştekî popûler nebe yan plakê çênakin an ji çu pere nadin we. Ji aliyekî ve mirovî didin zorê bo karên popûler. Ez sentezeke şêweyên caz û bluesê bi formên muzîka Kurdî ya klasîk çêdikim. Ev şêweyek nû ye û zêde bikirên wê jî nînin. Lewma şirîkeyên muzîkê zêde xwe nadin ber. Ez jî vê dawiyê albûmen xwe li ser sîstema online bar dikim, anku êdî telîf aîdî min in. Lê helbet mimkûn nîne li gor hejmara temaşevanan li ser Youtube'ê em pere qezenç bikin.*

## Binpêkirinên Mafan yên ku ji Hewlên Şirîkeyên Muzîkê yên Dîyarkirina Naverokê Der Tên

Hinek beşdaran gotin ji ber ku 'Kurdî pere qezenç nake', şirîkeyên muzîkê berê wan dane karên bi Tirkî yên popûler.

> **M8:** *Gava piştevanîyeke sazûmanî nebe, mirov dikeve ber bextê piyasayê. Hingê zêde mimkûn nabe hûn karên bi dilê xwe bikin. Em çûne hevdîtina li gel şirîkeyeke plakan. Xwedanê şirîkeyê got "Birako wextê van tiştan derbas bû. Êdî kes bi Kurdî guhdar nake, were em ji te ra straneke gelêrî ya Tirkî aranje bikin, klîbekî bikêşin, te di rêzefîlmekî da te bidin leyîzandin, em muzîkên rêzefîlmî jî çêbikin… binêre ka ji nişkê ve çawa şopînerên te zêde bûne, me dest pê bi pereqezençkirinê kiriye…" Ez li hemberî Tirkî an jî zimanekî dîtir nînim. Lê li vir pirsa eslî ev e; ez çima nikarim bi Kurdî rêzefîlman çekim, çima nikarim bi Kurdî albûman çekim. Çima derfetên min ên wisa nînin? Gava zordariya piyasayê berê hunermendên Kurd dide karên popûler hingê hunerê jî xerab dike. Hûn dizanin, Youtube platformeke gelek mezin e. Li wir jî pestîya şopîneran heye. Heke hejmara şopîneran qelîteya karan girîngtir be,*



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

*hingê karên popûler derdikevin holê, wisa jî huner xerab dibe.* M1: *Ji min re gotin "Dengê te û terzê te gelek xweş e lê ev qas bi Kurdî nebêjî, rêya te vekirîtir e." Min go ew ê çawa be? Gotin binêre, tu dikarî muzîka rêzefîlman çêkî, bingeha te ya muzîkal heye… em navê te didin, lê dinerin ku te bi Kurdî jî gotiye. Hingê ditirsin, jêdigerin. Bi wî awayî berê mirovî didin îcrakirina muzîka bi Tirkî.*

## Bandorên Neyînî yên Pisgirêkên Aborî li Jiyana Civakî ya Hunermendan

Pirsgirêkên aborî ne tenê li ser îcraya hunerê, lê li ser jiyana malbatî ya civakî jî xwedan bandorên neyînî yên mezin in. Hunermendên ku ji neçarî bi alîkariya malbatên xwe jiyana xwe berdewam dikin, li ser xwe zordarîyeke mezin ya psikolojik û civakî dibinin û wisa wisa baweriya wan bi karê wan kêm dibe.

**M6:** *Ez debara xwe bi muzîkê nakim. Xanima min ji alîyê aborî ve alîkariya min dike. Dibê tu ji bo Kurdan hunerê dikî, ez jî bo te bibim alîkar. Mixabin herkes qasî min bi şans nîne. Heke ew ev qas dilrehm nebûya min nedikarî xebatên xwe wisa berdewam bikim.*

**M8:** *Min li şaredariyê kar dikir, piştî qayûm, min xwe li wan negirt ku min ji kar pavêjin, min bi xwe îstîfa kir. Ev çar sal e bê kar im. Konsertên me tên betalkirin, mekanên em lê derdikevin kêm in, jixwe em nikarin ji wan pere bistînin. Ev çar sal e xanima min debara me dike. Mirov gelek li ber xwe dikeve gava wisa dibe bar li ser milên xanima xwe. Mirov karê xwe wekî tiştekî lûks dibîne. Dibêji mafê min nîne vê bikim. Ya din jî me qodên feodal li dûv xwe helan, lê zor e heke nikarî nanekî bînî mala xwe. Civak, malbat bi wî çavî li te dinêre. Tu wisa nafikirî, xanima te wisa nafikire lê piştî wextekî ew awayên fikirînî tên te ji cihekî ve zeft dikin. Gelek hevalên wisa hene.*

**M10:** *Gava tu nikarî ji karê xwe pere qezenç bikî, malbata te û derdora civakî bi çavekî din li te dinêre. Te wek têkçûyî dibi-*


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

*nin. Wek ku hûn karekî fizûlî dikin. Wextê derdiketim konsert û bernameyan min û xanima xwe debara malê dikir. Lê qayûman, pandemîyê rewş xerabtir kir. Niha tenê xanima min dixebite. Em bi meaşê wê kiraya xwe didin. Mirov gelek li ber xanima xwe û keda wê dikeve.*

Tengasîyên aborî nahêlin hunermendên Kurd bi temamî ked û bala xwe bidin ser çalakiyên xwe yên hunerî. Ji ber ku mîhrîcan û organîzasyonên bi qelîte cih nadin wan, saziyên dewletî sahne û mekanên xwe ji wan ra venakin û şirîkeyên muzîkê berê wan didin didin karên ku jê pere tên, bingeha hunermendên Kurd ya aborî û psîkolojîk ku ji bo hunera wan elzem e, ziyaneke mezin dibîne. Tengasîyên aborî yên ev qas mezin nîşan didin ku ji bo piştenvaniya huner û hunermendan dewlet berpirsîyariyên xwe yên li asta neteweyî û navneteweyî qewilkirî bi cih nayîne.

## Helwest û Kiryarên Cudakar yên li Cihê Kar Têne Dîtin

Hinek beşdaran diyar kirin ku ew li mektebên dewletî yan jî taybet mamostetîyê dikin, hinekên din jî gotin ku ew di serî da li şaredarî, li sazîyên cuda wek karker dixebitin. Herçend xebitîna li karekî derveyî muzîkê ku qezenceke berdewam temîn dike û xebatên wan yên muzîkê finanse dike jî li gor gotina beşdaran 'hesasîyeta Kurdî' ya dewlet û hevkarên wan zêde dibe û ew tûşî tacîzên devkî û êrîşên wekî wan bûne.

**M1:** *Li mektebê, li jûra mamosteyan î, dibînî ku bi çavekî dîtir li te dinerin. Hinek cara tacîz û êrîşên bi devkî jî dibin. Mirov bi dillerzîyeke wisa dikeve dersan jî. Mirov nizane ka xwendekar dê çawa tevbigerin. Gava tansiyona sîyasî bilind dibe, mirov zêdetir dilteng dibe. Ev hemû jî di eslê xwe da cureyên şîdetê ne… Yên ku bi rêya klîbekî min dizanin ku ez Kurd im dibêjin 'Mamoste te bi Kurdî gotiye, ma tu Kurd bûyî?'. Mirov nizane ka pirsê bi kîjan nîyetê dipirse.*

**M3:** *Jixwe li hemberî bertekên neyînî ji ber îcraya we ya muzîka bi Kurdî, hûn dixwazin xwe bidin hezkirin. Hûn dixwazin ew wekî mirovekî we nas bikin. Ewil ez li ser fikirîm ka*


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

*ew nêrîn tawîzdayîn e yan nîne. Dûvra min got divê rastiyan paşguh nekim û di nav danûstendineke bandordar bim. Û wisa li bajarê lê dimam, min eleqeyeke baş dît. Qet nebe ji aliyê mirovî ve… lê diyar e ku ew nêrîna neteweperest bête tekbirin…*

**M2:** *Li aliyekî li saziyekî fermî dixebitî. Li aliyên din jî muzîka Kurdî îcra dikî û albûman derdixî. Helbet ev rewş bi awayekî xwezayî dibe cihê diltirsiyê. Lê ji aliyê din ji ber ku mirov bi karê xwe bawer e, jê venagere. Ez jî jênegerîyam… Û ji karê xwe yê bi salan, bi qerarnameyeke dewletê ve hatime avêtin.*

## "Şîdeta Bêdengiyê": Bêdengîya Otorîteyên Dewletî û Saziyên Hunerê li hember Daxwazan

Têgeheke herî bandordar jî 'şîdeta bêdengîyê' bû ku di hevdîtinan da derkete holê. Herçend ji aliyê şanogeran ve zêdetir hatibe gotin jî, qismekî muzîkjenan jî dîyar kirin ku tûşî van cure binpêkirina mafan bûne.

Bi vê têgehê ve armanc bêdengîya dewletê, ya saziyên medyayê yên neteweyî û organîzasyonên hunerê ye li hemberî daxwazên hunermendên Kurd, di serî da daxwazên mekan û sehneyê. Ji ber ku ew daxwazên hunermendên Kurd qanûnî ne li şûna ku wan bi awayekî aşkere û fermî qedexe bikin an jî wan bi neyînî bersivînin, ew sazî daxwazan paşguh dikin û wisa bi awayekî fiîlî dibin asteng. Ji ber berdewamîya wê astengîya fiîlî mirov dibêje qey ew bûye polîtîkayeke çandî. Ew sazîyên pêwendîdar yan qet bersivê nadin daxwazan an jî di serî da dibêjin sehne guncav nîne, ceryan an jî av hatiye birîn û gava daxwaz hatin dubarekirin jî bersiva wan nadin.

**M1:** *Cureyekî şîdetê heye, dibêjinê 'şîdeta bêdengiyê'. Min xwest derkevim ser NTV'yê, lê bêyî sedem em dernexistin. Kesên gelek bêwesiftir derdikevin. Lê em nikarin derkevin. Ji ber ku dizanin kiryarên wan ji aliyê hunerê ve nayê qebûlkirin, bi awayekî fermî daxwazan red nakin. Dibêjin rojeva me mijûl e, em ê li we bigerin û qed venagerin. Gava ji bo sehneyê pê ra diaxivî ewil erênî ne, lê encam her neyînî ye.*


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

## Binpêkirinên Mafan yên ji ber Bayê Siyasî

Mirov dikare bibêje ku têkîliya nêzîk ya îstîfadekirina ji mafên çandî û bayê siyasî nîşaneya wê hindê ye ku li Tirkîye'yê huner xweser nîne. Sînorên xweserîya huner û hunermendan ji aliyê otorîteyên dewletî ve bi awayekî yekalî tê dîyarkirin, ev yek ji sedemên herî girîng ên binpêkirinên mafan e.

Qismekî beşdaran dîyar kirin ku ew serdema di navbera salên 2009-2015an da wek "vebûna demokratîk" an jî "*Pêvajoya Çareseriyê*" dihate binavkirin, ji bo îstîfadekirina ji mafên çandî serdemeke erênî bû, lê belê qismekî din gotin ku ew reformên wê serdemê bi xwe jî xwedan sînordarîyên berfireh bûn û li cihên ku azadiya zimanî hebû jî polîtîkaya hunerê ya ku asimilasyona çandî dike armanç bi hinek alavên dîtir dihate birêvebirin. Hinek beşdaran dîyar kirin ku ew tûşî şîdetê an jî gefa şîdetê bûne, piranîya hunermendan heta radeyekê sansûr û otosansûr kiriye da ku hunera xwe berdewam bikin.

## Ji TRT 6 heta TRT KURDÎ'yê Vebûna Dewletê ya Zimanê Kurdî û Sînordariyên Wê

**M1:** *Min bi xwe nekarî derkevim ser TRT 6'ê, lê ez wek pêngaveke erênî dibinim, ji ber ku bikaranîna Kurdî normalîze dike. Hinek kes, Kurd bi xwe jî, dibêjin heke derkeve ser televizyona dewletê jî, hingê cihê tirsê ye. Lewma dikarim bêjim ku ez pêvajoya aştîyê an ya reforman erênî dibinim. Min li ser navê xwe rehetîyek dît. Hetta ez li ser hindê fikîrîm ku ji karê xwe yê fermî îstîfa bikim û tenê bi hunerê ve eleqedar bibim. Lê kiryarên piştî hingê dane dîyarkirin ku sînorekî van tiştan hene. Anku dewlet destûr dide, lê her car dixwaze naverok li bin kontrola wê be. Dixwaze te ji aliyê siyasî ve kontrol bike. Bi ya min heman tişt li sazîyên çandê yên Kurdan jî derbas e. Gava piştevanîya te dikin, ew jî dixwazin li ser hunera te bibin xwedan gotin. Min li NÇM'yan bi xwebexşî fêrkarî kir, lê min çu caran xwe wekî hunermendê tevgerekê bi nav nekir. Gava wisa dibe li mîhrîcan û konsertên şaredariyan jî cih nadin we. Heta ku Kêşeya Kurd ji aliyê siyasî ve neyê çareserkirin, dê hunera Kurdî her wekî çalakîyeke siyasî bête dîtin û dê*



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

*her vekirîbe ji bo manipûlasyona siyasî.*

**M4:** *Em muzîka pirzimanî dikin. Dîsa jî dewlet her guman dike. Gava piştevanîya sazûmanî dide miheqeq xweseriya te ji te distîne. Dixwaze te bike amûrê polîtîkayeke dîyarkirî. Em vê yekê naxwazin. Binêrîn di serdema reforman da Wezîrê Karên Derve albûma me bire Ewrûpayê, da bibêje êdî li ba me Kurdî serbest e. Lê nahêlin tu derkevî ser televizyonê. Binêre, Wezîrê Karên Derve bi xwe jî hakimî welatî nîne, sîstemeke jê kûrtir heye. Me stranek hebû, gotinên wê bi Kurdî û Tirkî bûn. Me li qenalên neteweyî cih peyda nedikir. Wê demê hunermendekî Kurd, yekî ku navbera wî û rayedarên dewletê xweş bû, bo serokê RTÜKê telefon kir. Got, birêz serok, ev heval karên gelek serkeftî dikin, straneke wan ya evînê heye gotinên wê jî Kurdî-Tirkî ye, dipirsin ka çu astengî hene ku li qenalên neteweyî bête weşandin… Serokê RTÜKê got ka bila stranê bişînin em lê binêrin (bi tîqetîk dikene). Yaw qeşmer, tu yê li çi binêrî, stran e, aha me gotiye birû qelem, çav reş felan… Jixwe ji bo wê jî destûr nedan. Tu dizanî ka mesele çi ye? Dewlet ji dil dixwaze te ji aliyê çandî ve asîmîle bike. Qet ji ya xwe nehatiye xwarê. Ji ber hindê ji bo bikaranîna zimanî jî destûreke berteng dide.*

**M2:** *Min salên 1990î dest bi muzîkê kir. Ez li gelek saziyên Kurdan xebitîm. Berî konsertan an jî piştî wan ez gelek caran hatime desteserkirin, min şkence keşa, li girtîgehê mam. Mixabin tenê medyaya Kurdî ew tiştên hingê bi serê me hatî, dîtin û li rûpelên xwe cih dayê. Carekê gava polîsan ez birime girtîgehê gotin ‘êdî tu yê biçî ji girtîyan ra li enstrûmanan bixî û muzîkê îcra bikî. Min nefreta dewletê ya li hember hunera Kurdî, bi taybetî ya li hember muzîka Kurdî hingê çêtir fehm kir. Îro jî meyla dewletê herçend di eslê xwe da eynî be jî, li ser xeteke piçekê cudatir diherike. Berê huner û muzîka muzîkjenên Kurd tune qebûl dikir û her cure zordarî lê dikir, niha jî dîsa wan tune qebûl dike û zordariyê lê dike. Digel hindê jî li ser van tiştan hewl dide wan dejenere bike û pûç bike. Bi van*

*kirinan ve di eslê xwe da baş dizane ku hunerek, bi taybetî jî muzîkeke ku resenî û azadiya wê ji dest hatiye wergirtin nikare pêdivîyên civaka Kurdî temîn bike û dê aîdîyeta civakî ji holê rake. TRT-6 mînakeke qaşo sivîk a vê asîmîlasyona hûr e. Wek gelek hunermendên Kurd, min jî TRT-6 qebûl nekir, ji ber ku wê çu eleqeya xwe bi muzîk an jî hunera Kurdî ra nîne.*

**M3:** *Ez bi xwe, li ser navê xwe dibêjim TRT 6 daxil, pêngavên dewletê alavên sereke ne ji bo asîmîlekirina Kurdan. Çand û huner tenê ziman nîne… Erê destûr dide te ji bo ku bi Kurdî bibêjî, lê teqez dixwaze naveroka gotinê kontrol bike. Ez çawa dikarim wekî hunermendekî destûr bidim vê. Bi kurtasî bi raya min pêvajoya reforman qet feyde neda min. Wisa diyar e nade jî…*

**M10:** *TRT 6 ne qenalekî wisa ye ku cih bide min û muzîka min. Lewma ji wî aliyî ve xêra wê negehişte min û muzîka min. Li ez rasterast li dijî TRT 6'ê nînim. Heke tu bikaribî nasnameya xwe û şêweyê xwe yê muzîkê biparêzî helbet mirov dikare derkeve ser TRT 6'ê û li wir bixebite jî. Lê heke tu çanda xwe veguherînî û wê bikî hevaheng li gel îdeolojîya fermî, helbet ew dibe tiştekî xeternak. Li vir mesele li ser hindê ye ka tu karekî çi qas bi prensîb dikî û bi îmkanên bo te hatine pêşkeşkirin ve jî girêdayî ye. Li ser îmkanên şaredarîyan jî ez heman tiştî difikirim. Helbet mîhrîcan çalakiyên girîng in û mirovî motîve dikin lê belê di hilberîna muzîkal da tiştên wisa nakin ku hûn berhemên resen derxin. Pêwîstiya Kurdan bi akademîyan heye. Hêj jî derdorên siyasî li ser naverok û şêweya muzîka Kurdî nîqaşan dikin. Ew bi xwe dixwazin naverok û sînorên muzîka Kurdî dîyar bikin. Di rewşeke wisa da ku muzîka Ingîlîz û Emrîkî jî diguhere, rast nîne ku mirov hin qodên diyarkirî li ser muzîka Kurdî ferz bike, ew yek bandoreke neyînî dike li ser hilberîna hunerî. Aramî û îmkanên aborî hewce ne ji bo muzîkjenên Kurd da ku bikaribin ji qodên ferzkirî xelas bibin û karên resen hilberînin.*

**M3:** *Muzîka Kurdî ji neçarî bûye muzîkeke siyasî. Muzîkjenê Kurd jî wisa ye. Lewma muzîka Kurdî jî, muzîkjenê Kurd jî vekirî ye ji bo manipûlasyona siyasî. Derbarê TRT 6ê da pirsgirêka bingehîn ev e. Ziman, bele Kurdî ye, lê ew dixwaze dîyar bike ka tu dê bi wî zimanî çi bêjî, çi nebêjî. Heke wisa be, ma mirov dikare bêje Kurdî azad e? Ew azadî bi bedela çi ava dibe. Rast e ku saziyên hunerê yên Kurdan jî dixwazin naveroka muzîkê pênase û 'eyar bikin. Têkoşîneke siyasî tê birêvebirin û çand jî wekî qadek ji qadên têkoşînê tête dîtin. Li ser navê xwe dikarim bêjim ku mirov dikare zehmetiyên wir zûtir çareser bike. Mirov dikare li wir pêvajoyeke rexneyî bide şixulandin. Yanî dibe ku naveroka muzîkê yeka siyasî be, ew nabe pirsgirêk, bi raya min esil xala zehmet ew e ku ew naveroka siyasî wekî qalibên amadekirî bo mirovî bêne pêşkêşkirin. Wek hunermendekî divê mirov ji rewşên wisa haydar be ku azadî û resenîya mirovî ji holê radikin.*

Kontrola berdewam ya naverokî heye li ser berhemên hunerî li TRT 6 û platformên dewletî yên ku destûra îcraya muzîka Kurdî lê heye. Ew rewş bi awayekî aşkere binpêkina Xala 9em, fiqrayên 1em û 2yem ya *Peymana Navneteweyî Derbarê Mafên Medenî û Siyasî* ye. Li wan xalan wiha tê gotin: " Herkesek, bêyî midaxeleya kesekî din xwedan mafê îfadekirina ramanên xwe ye; di nava wî mafî da bêyî sînorên dewletî herkes dikare bi devkî, nivîskî an jî çapkirî, bi şêweyê berhema hunerî an ji şêweyekî din her cure raman û fikran vekole, wergire û derbasî kesên din bike. "

## Fikra Gefa li ser Ewlehiyê û Hêzên Ewlehiyê yê Dewletê

Beşdaran wisa îfade kirin ku muzîka bi Kurdî hêj jî wekî meseleya ewlehîyê tête dîtin. Hatiye gotin ku herçend di 'Pêvajoya Çareseriyê' da kêm jî be, hêzên ewlehîyê midaxeleyên keyfî kirine li cihên konsert û kafeyên ku muzîka Kurdî lê tête îcrakirin. Bi taybetî piştî her pevçûna leşkerî ya bi mirin, derketina ser sehneyê bi zehmet bûye û hinek caran bername hatine betalkirin.

**M1:** *Xwedanên mekanan ditirsin. Ji ber ku bihîstiye, hinek mekanên ku cih dane muzîka Kurdî hatine girtin. Dizanin ku ne ji ber wê ye, lê pêve girêdayî ye. Lewma mekanên ku em lê derkevin kêm dibin. Xelk hasastir bû. Şevekê bernameya me hebû, xeber şandin gotin bername betal bûye. Me go çima? Gotin, pevçûn çêbûye, hin leşker şehîd bûne. Me pirsî ka bernameya bi Tirkî betal bûye? Nexêr. Gava leşker şehîd dibin bernameya bi Kurdî tê betalkirin, ji ber ku hêj jî Kurdîyê bo leşkeran, bo şehîdan wek bêrêzî dibinin. Heke wisa be emê çawa hunera xwe îcra bikin. Dîsa şevekê bernameya me hebû. Li cihekî nêzîk leşkerşandin hebû. Xwedanê mekanê got em bernameyê betal bikin da tiştek neqewime. Ji ber ku girse ber bi wir ve dihat. Mala Xwedê ava, şaredar mirovekî baqil bû, bûyer bêyî ku mezin bibe, rawesta. Hinek caran hêzên ewlehiyê tên dibên bernamê çênekin, an jî bi Kurdî nebêjin. Li gor çi, dîyar nîne. Lê em jî nakin… Nayê bîra me ku biçin li mafê xwe bigerin… Ji ber ku em dizanin bi kêr nayê. Ji bilî van polîsan hin caran konsertên min bi qemerayê qeyd kirin.*

**M4:** *Tiştên ecêb diqewimin. Em li konsertekê bûn. Li herêma Ege'yê. Me dê stranên bi zimanên cuda bigotana. Tam dor hate strana bi Kurdî, cereyan qut bû. Vêca me temîr kir, paşî ji Neşet Ertaş me stranek got. Polîsan jî bi me ra gotin. Yanî niha gava dor tê Kurdî ceryanî dibirin, lê li gel te bi kêf Neşet Ertaş dibêje. Ji ber ku ditirse…. An jî bi ya min nas nake. Belkî hinek wext lazim e, heya ku te, zimanê te û çanda te nas dike… Belê heke heya hingê te bi temamî asîmîle neke* (dikene).

**M2:** *Carekê em li Batmanê bûn. Polîs hate mekanê, li maseyekê rûniştin. Piştî mideheke xebatkerekî mekanê şandin û ji min daxwaz kirin ku straneke bi Tirkî bêjim, min gotê li nav repertûwara me nîne. Piştî çend deqîqeyan dîsa ew xebatkar şandin û heman tişt daxwaz kirin. Min heman bersiv dayê. Ew israra wan pênc caran dubare bû. Herî dîsa ew xebatkar şandin û gotin em dixwazin hevalek ji me derkeve sehneyê. Ew*

*ji sehneyê hatim xwarê, ew hevalê wan derket û ew stranên li gor dilê wan wan gotin. Konsert wisa bi dawî bû.*

**M3:** *Tiştekî gelek ecêb heye. Ji bo konsertekê an jî bernameya li mekanekê em destûr dixwazin. Polîs ji me îkametgahê dixwaze. Yanî heke hûn ê gûyekî bixwin û muzîka Kurdî îcra bikin (dikene) dixwazin bizanin ka dê we li kû peyda bikin. Polîsekî sivîl hebû her dem çalakîyên me dişopandin û qeyd dikirin. Yekî pordirêj bû, caketekî çerm ê reş li xwe dikir. Li bernameyekê me straneke bi Erebî got, wî jî ji serî heta binî li gel me got. Mihtemelen yekî ji Erebên Tirkîye'yê bû. Li nava bajêr hêj jî hin caran wî dibinim. Mesela te bi destên zarokên xwe girtiye … û wî dibînî li sûkê. Ez dikevim nav aciziyeke bête'rîf. Ew ji min re bû travma… Dûvre ez wisa fikirîm… Min go li nav qanûnan nayê gotin ku Kurdî xedexe ye, lê herwisa nayê gotin ku Kurdî serbest e, hemwelatiyên me yên Kurd dikarin ziman û hunera xwe pêşve bibin, dewlet dê di vî warî da piştevanîye bide felan. Belê, nabêje qedexe ye, lê ya rast naxwaze mirov ji wan mafan îstîfade bike. Lewma kare me bizehmet dike.*

**M13:** *Wextê salên 90î da ez li navenda çandê dixebitîm, ez tûşî desteserkirin û lêpirsînan hatim. Van salên dawî li ser min çu lêpirsîn nehatine vekirin. Lê çend caran me ji bo konsertê serî lê da, ji ber hinceta ewlehiyê destûr nedan. Miameleya serdema nû jî wisa ye…*

**M5:** *Li mekana ku ez lê derdiketim hêzên ewlehîyê hatin, bêsedem midaxele kirin. Du caran pê li erza mirov dikin. Ewil wek hunermendek, dûvra wekî Kurdek. Bi rastî herduyan jî bin pê dikin. Du sê caran konsertên me yên li gel hunermendên Tirk ji ber sedema 'ewlehîyê' hatine betalkirin… Were li temaşeyê binêre? Û alîyekî din ê meseleyê heye. Niha ji ber helwestên keyfî yên hêzên ewlehîyê mafên we têne binpêkirin. Derdora we jî ji we lehengiyê dixwaze. Hemaseteke ecêb heye. Halbûkî hûn hunermend in, hûn dixwazin ne bi serpêhatiyên xwe, lê bi hunera xwe li rojevê bin.*

**M12:** *Ez li Mardînê, li kafeyekê bernameyê çêdikim. Polîs û leşker jî têne wir. Gava ez wan dibinim, jixweberî ma'dê min tirş dibe, aciz dibim. Hema wisa disekinin û li sehneyê dinerim, ji bo guhê yekûdu tiştan dibêjin. Belkî ne derheqê me da bin, lê mirov aciz dibe. Carekê ji xwedanê mekanî gotine 'Çima bi Kurdî bernameyê didî çêkirin, ma pêdivîya te bi pereyan heye?' Xwedanê mekanê jî hevalê min e, gotiyê çi eleqe yaw, li vî bajarî Kurdî jî tête guhdarkirin, lewma ez cih didimê.*

Bingehek qanûnî nîne ji bo wan kiryarên fîilî yên hêzên ewlehiyê, lê dîsa jî beşdaran gotin ku ew kiryar gelek caran pêk hatine. Li hemberî wan kiryarên bi temamî keyfî hunermend nikarin ji çu parastinên hiqûqî îstîfade bikin. Herwisa hunermendên ku tûşî wan kiryaran tên ji ber du sedeman serî li rêyê qanûnî nadin: yek, ew ji dil bawer dikin ku nikarin bi rêya qanûnê mafdar derkevin; ya duyem jî ew ditirsin ku zêdetir ziyanê bibinin.

Li gor vê rewşê, Tirkîye bi rastî jî nebûye dewleteke hiqûqê ku gelên cuda têda ji mafên xwe yên çandî îstîfade dikin. Bicihkirina Kurdî li hemberî têgehên wekî şehîdîyê nîşana cihê Kurdî ye li têgehiştina popûler ya neteweperwer. Berbelavbûna wê têgehiştinê û qebûla wê ya girseyî astengkirina îstîfadekirina ji mafan bi alav û polîtîkayên cuda ve hêsantir dike ji bo hêzên ewlehîyê û 'hemwelatiyê asayî' ku li jêr dê bête dîtin.

## Sansûr û Otosansûr

Ji beşdaran hate pirsîn ka ew li hember kiryarên keyfî û astengkirinên qanûnî otosansûrê pêk tînin yan nayînin da em derbixin holê ka ew heta çi radeyê hunera xwe bi azad îcra dikin. Beşdaran bi giştî îfade kirin ku ew hewl didin azadiya xwe biparêzin, lê belê hunermandan anîn ser ziman ku ew li bikaranîna hinek peyvan baldar in û li hinek rewşên taybet da ji neçarî otosansûrê pêk tînin. Hunermandan dîyar kirin ku li hemberî wan du bijartek hene: yan ew dê hunera xwe qet îcra nekin, yan jî bêyî ku ji prensîbên xwe tawîz bidin, ew dê li dor hinek sînoran hunera xwe îcra bikin û ji bo berdewamiya îcraya hunera xwe ew ya bijarteya duyê tercih dikin.

**M3:** *Mesela tu nikarî peyva Kurdistan'ê bi kar bînî. Tu dibêjî 'Gulistan'. Ne tenê ji tirsê, heke tu bitirsî tu muzîkê nakî. Binêrîn carekê li Enqere'yê bernameya min hebû. Hewayekî xweş hebû, li nav guhdaran yên Tirk jî hebûn, me û muzîka me nas dikin lewma tên. Gava me ji Koma Weten*, 'Sînê'ya Kerem Gerdenzerî digot, herçend ew straneke evînê be jî, me nikarî bêjin '... nav ezmanê Kurdistanê', te fehm kir? Tiştekî wisa ye, anku hingê ne ku tu ji xwe ditirsî, lê hingê psîkolojîyeke wisa heye li sehneyê, tu dibêjî qey dê bibe hevrikî li navbera maseyan. Tu li wir ji xwe natirsî, jixwe ew ê hatiye guhdarîya te belkî ji wê peyvê fehm neke, ha fehm bike jî tiştek nabe, lê mirov ji bûyerên derveyî xwe ditirse. Psîkolojîyeke ecêb e... ji zaroktiya mirov tê... ji wê psîkolojiya hingê tê, wextê li mala me, li tenûra me diya min pirtûkên bi Kurdî, ferhengên bi Kurdî dişewitandin. Gava dihate gotin ku îxbar heye, tête bîra min diya min hemû band, ferheng û pirtûkên bi Kurdî şewitandin, ji neçarî wisa kir yanî. Aha ew neçarî li konsertan 'Kurdistanê' bi me wekî 'Gulistan' dide gotin... Tiştên trawmatîk in, zêde trawmatîk.*

**M7:** *Min ji neçarî otosansûr pêk anî. Bo mînak, min her xwestiye ku albûmeke bavê xwe çekim, lê stranên bavê min li gor dewletê zêde radîkal, zêde şoreger in. Ew stranên wisa ne ku gotinên wan piçekê ziyanê bidin henbûn û yekîtîya dewletê (dikene), lewma min nikarî wê albûmê derxînim. Ew hewayê niha nahêlê ez wan stranan parve bikim. Ji ber ku ez li Tirkîye'yê dimînim û hemwelatîyê Komara Tirkîye'yê me hema bêje nemimkûn e ku ez wan stranan parve bikim. Lewre ez dizanim, gava min ew parve kirin, roja paştir tême girtin. Bo mînak stranên ku têda peyva 'Kurdistanê' an jî peyva 'Ala Rengîn' û navên şervanên Kurd têda derbas dibin... Ji ber wan ez nikarim wan stranan bêjim... Min stranek çêkir, li cihekî dibêjim 'axa min'. Lê ji ber ku min nexwest rasterast bêjim 'Kurdistan' min got 'ax'. Li wir 'Kurdistan'eke nebinavkirî heye di eslê xwe da.*

**M2:** *Repertûwara xwe em bi xwe dinivîsinin û dîyar dikin. Ez û hevalên xwe, di karê xwe da, di stranên xwe da hewl didin li bin bandora kesê nebin, bi gotineke rasttir bêyî 'angaje' bibin, em hewl didin ya bi dilê xwe bêjin. Helbet hinek encamên vê sekin û nêrînê jî çêdibin. Me gazî mîhrîcanan nakin, an jî naxwazin me bibinin. Lê em dizanin ka çima naxwazin me bibinin û em wan jî fehm dikin.*

**M12:** *Gelek caran polîs hatiye kafeya ez lê dixebitîm. Tên bernameyê didin sekinandin, ûslûba wan hişk e. Guhdar ditirsin. Ev di 'Pêvajoya Çareseriyê' da çêbûn. Ew dike ku mirov bêtir baldar be. Mesele ez gelek caran peyva 'Kurdistan'ê bêyî mîkrofon bi lêv dikim. Mîkrofonê ji xwe dûr dikim û dibêjim. Ji ber ku ez naxwazim deng biçe derve, an jî serê kesekî din pê biêşe, mekan bê girtin, mekan ziyanekê bibîne, an ez çu ziyanan bibinim. Wisa bi dengekî nizm, bi tirs dikim. … Carekê bi serê hevalekî me hatibû, li vir strana Zana û Andok gotiye, li nêzîkî wan qereqolek hebû, polîsekî ku ji Kurdî fehm dike ew nivîsandiye. Hatiye gotîye 'Ev ji stranên qedexe ye, tu nikarî vê bibêjî' û hewl dane mekanê bigirin. … Anku ne hewce ye îlam tu bêjî 'Kurdistan.' Stranên me her peyameke xwe heye. Em bixwazin, nexwazin piraniya stranên me yên 'şoreşgerî' ne, protest in, alavên ragihandina dengekî, yên peyamekê ne. Jixwe em vê bi qestî jî nakin, stranên me, repertûwara me wisa ne. Em wekî miletekî derbasî rehendeke din nebûne … yanî niha ev heye di nava destên me da. Gava ez stranên evînê jî dibêjim, hin caran lê baldar dibim… dibêjim jixwe zimanê wê Kurdî ye, jê haydar be. Ji ber ku tehemûla wan nîne bo Kurdî.*

## Bidawîbûna "Dîyalog" / "Pêvajoya Çareseriyê" û Vegera "Rewşa Awarte"

Di hevdîtinan da hatiye îfadekirin ku piştî sala 2015an "Pêvajoya Çareseriyê" bi dawî bû û sala 2016an hewla darbeya leşkerî çêbû, atmosfera siyasî xerab bû û ew rewş bû sedemê zêdebûnekê li binpêkirinên mafên hunermendan. Hate gotin ku platformên ku Kurdî têda dihate îfadekirin, di serî da radyo û televizyon, hatine girtin û gelek mekanên taybet ji ber

tirsa 'ziyandîtinê' cih nedane hunermendên Kurd. Beşdaran aşkere kirin ku wan li mekanên ku lê derdiketin sehneyê bi êrişa devkî, astengiya fîîlî û gefa şîdetê bêtir rû bi rû mane.

**M8:** *Piştî bidawîbûna "Pêvajoya Çareseriyê" bû. Ji bo berhevkarîyê çûbûm herêmê. Vegerê da li Amedê ji ber nebûna mekanê me li nava Mallê (AVM) lîstika Mem û Zîn pêşkêş kir. Ez li otobûsê siwar bûm vedigerîyam, polîsan em sekinandin, peya kirin, li teyb, qamera û mîkrofonê mêze kirin. Heçkû amûrê sucdariyê ne, wisa. Min go ez hunermend im, derçûyê konserwatûwarê me, berhevkariyê dikim, guh nedan min. Min got li cîhazan stran hene, ma yê çi hebin, gotin belkî hin tiştên din hebin. Wê miameleyê giyanê min gelek aciz kir. Hemû konsertên me yen li Wan, Amed, Colemêrg û Batmanê bi qamerayê hatine qeydkirin.*

**M4:** *"Pêvajoya Çareseriyê" baştir bû helbet. Ma nabêjin aştîya herî xerab ji şerê herî baş çêtir e. Qada manewrayê ji bo me berfirehtir bû, ev qas astengî nebûn. Wê demê şaredariyên Kurdan hebûn, qeyûm tunebûn. Şaredariyên Kurdan mîhrîcanên xwe li dar dixistin. Em jî beşdar dibûnê. Wan saziyên xwe yên çandê hebûn, wekî Konserwatûwara Cegerxwîn felan. Bifikirin, em ji wan rojan hatin van rojan. Piştî bidawîbûna pêvajoyê her tişt serûbin bû, tiştek ji me ra nema, zordestîyeke ecêb hate kirin, sazî neman, mirov neman, gelek kes hatine girtin. Anku mirov nikare atmosfera niha bide ber ya berê.*

**M2:** *Li Tirkîye'yê êdî meseleyê ji zordarîya meheleyî derbas kiriye, dikarim bêjim zordarîya welatî heye. Mekanên ku berî 10-15 salan em lê derdiketin, me dikarî lê derketana, niha em nikarin lê derkevin. Guhdar ji tirsa nikarin bên konsertên Kurdî. Li Tirkîye'yê li ser navê azadî û demokrasîyê tiştên nivîskî bêwate ne. Mixabin berê jî bêwate bûn, niha zêtir bêwate ne, em herroj di pratîkê da gelek mînakên wê dibinin.*

**M13:** *Piştî ku qayûm avêtine ser şaredariyan, li gelek cihan konsert hatine betalkirin. Kurdî dîsa nehate qedexekirin, lê bele miameleyeke wisa heye ku ew bi fîîlî qedexe ye.*

**M15:** *Piştî qayûm tayînkirine ser şaredariyan, ez ji kar hatime derxistin. Sala ewil sendîkayê alîkariya pereyî dikir lewma jiyan hêsantir bû, lê dûvra ji aliyê aborî ve ez asêtir bûm. Hinek caran bi alîkariya hevalan, hinek caran bi alîkariya aborî, hinek caran min daxilî pereyê kirayê nakin, wisa wisa hewl didim vê pêvajoyê biborînim, lê hêj jî berdewam e. Li QHQ sedemê îxracê nayê diyarkirin, wek tedbîrek ji bo helwest û tevgerên li hemberî ewlehiya dewletê tê nişandan. Ez jî tenê bi muzîkê ve mûjil im. Konsertên min hene, albûmên hene, bernameyên televîzyonê hene. Nizanim ew çawa dibin gef li ewlehiya dewletê.*

**M10:** Em di *"Pêvajoya Çareseriyê" da rehettir bûn lê ne rehetî an jî azadiyeke wisa tam bû. Her tirsek hebû. Ya rast, rewşeke durû heye li meydanê, dewlet qedexe nake lê naxwaze tu ji wî mafî îstîfade bikî. Mirov vê dizanê û jê ditirse. Bi ya min pirsgirêk di hindê da ye ku muzîka Kurdî ev qas girêdayî siyasetê tête nîqaşkirin. Hke li TRT 6'ê derkevî "xayîn" î, heke li cihekî din derkevî "terorîst" î. Êê hingê hûn çima [ji bo aştîyê] li hev civîyan. Te li gel wan qaşo xayînan, wan jî li gel qaşo terorîstan hevdîtin pêk anî. Ma ew tişt ne ji dil bûn? Divê ew qas hêsan nebe mirov hunermendan lekedar bike. Divê hunera Kurdî li derveyî van çarçoveyan bête nîqaşkirin.*

**M11:** *Bayê siyasî gelek bandordar e. Huner, siyaset, aborî, ev hemû saziyên li nav hev in, li hev bandordar in. Gava tansiyona siyasî bilind dibe, huner ji rewacê dikeve, tê bindestkirin. Jixwe huner tiştekî wisa ye ku li qadeke azad, li qadeke aramtir û bêtir aştîyane dikare bipişkive, geşe bide. Ji bo mînak, min du albûm çêkirin. Albûma ewil di "Pêvajoya Çareseriyê" da derket, lê ya din van demên dawiyê derket ku atmosfera*

*siyasî têra xwe xerab bûbû. Herçend di navbera herdu albûman da ji aliyê sound bi xwe jî gelek ferq nebe jî guhdaran bi heye-cantir pêşvaziya albûma ewil kiribûn.*

**M1:** *Salên navbera 2011-2015an demên bi temamî azadiyê bûn bo min. Serdemeke wisa bû ku wek mafekî herî xwezayî min bawer dikir ku ezê bi hesasîyetên xwe, îdeolojiya xwe û bir nasnameya xwe ya etnîk hebim. Lê herwekî dêûbav zarokên xwe wergirin bin nîrê zordariya xwe, dewletê jî got: "Nexêr! Nabe tu bi dilê xwe bî, em çawa bixwazin divê tu wisa bî"*

# BINPÊKIRINA MAFAN LI HEMBERÎ ŞANOGERÊN KURD

Hunermendên beşdarên xebatê li ser hêmanên ku berê wan daye şanoya Kurdî û piştevaniya malbat û derdora civakî da tecrûbeyên xwe bi me ra parve kirin. Ew parvekirin dê alîkar bin ji bo fehmkirina hindê ka vesazkirinên qanûnî û polîtîkayên çandê çawa bandor kirine li ser têgehiştina ziman û îfadeyên hunerî yên zimanî li nav Kurdan.

Qismekî beşdaran gotin ew, wekî zarokên malbatên ku ji ber pevçûnan ji neçarî bar kirine, derbarê Kurdîtî û Kurdîyê xwedî bîreke trawmatîk in, lewma wan bi tesîra hindê berê xwe dane Kurdîyê û şanoya bi Kurdî.

## Qedexeya Zimanî û Bandorên Wê li Ser Tercîhkirina Hunerê

**Şanoger (Ş) 2:** *Ya rast, min bi dizîkî ve dest bi şanoyê kir. Bavê min digo qey ez bi karekî din ve mijûl im. Bavê min je ber endîşeyên polîtîk dixwest ez ji mijûliyên wekî şanoya bi Kurdî dûr bibim. Gava bavê min pê hesiya, me şerekî mezin kir, em mideheke jêk sil bûn. Wî got ez ê te ji ewladiyê pavêjim. Lê min xewn û xeyalên xwe tercîh kirin, min da pey wan. Bavê min çima wisa tevgeriya? Ji ber ku me ji ber zordestiya siyasî bar kiribû, wan ez şandîbûme Stenbolê ku ji wan tiştan dûr bim. Lê waye, ew çîrok dava mirovî bernadin.*

**Ş9:** *Nasnameya me hatiye qedexekirin. Me bivê jî nevê jî ji bo ku em nasnameya xwe bidin qebûlkirin, hewce ye em li ber xwe bidin. Anku helbet em hunerê dikin, min perwerdeya formel ya vî karî jî wergirtiye, lê gava we go şanoya bi Kurdî, ew kar di dawiyê da dibe mijara parastin û pêşvebirina zimanî. Sedemeke din ev e, gava we karekî bi Kurdî kir, mirov xwe bêtir aîdî gelê xwe dibîne û karê xwe memnûn dibe. Ez li hember zimanê kesê nînim, lê ez nikarim lîstikeke bi Tirkî adapteyî*

*sehneyê dikim. Ez wê wekî karê xwe nabînim. Lê dikarim lîstikeke bi Tirkî yan jî bi zimanekî din wergirim û adapteyî Kurdîyê bikim.*

**Ş4:** *Min piştî serpêhatiyeke dijwar berê xwe da şanoya bi Kurdî. Sala 2010ê, grevên birçîbûnê hebûn. Me jî lîstikek pêşkêş kir ji bo piştevanîyê. Em jî di greva birçîbûnê da ne. Berî lîstikê qeydên me yên sicîla edlî hatine xwestin, wextê em ketine salonê bi kuçikan em hatine sehkirin, polîsan lîstikê qeyd dikirine qamerayê. Li lîstikê sehneyeke hestîyar hebû, divê têda bigirîyama. Gava hatime ser wê sehneyê tiştekî ecêb qewimî, heçkû li nava min tiştek bizdîya… Min nikarî bigîrim. Heçkû gava bi Tirkî dilîstim, min ew zilm û rûreşî hemî qebûl kiriye. Gaveke wisa bû ku zêhna min vebû û min fehma hinek tiştan kir. Heçkû kesek bir ser min da hatiye, ez hewl didim derdê xwe bêjim, lê nikarim bo kesê bêjim.. Ez rûniştim, wek ku bi halê xwe digîrim, mine ew sehne bi straneke Kurdî jixweber lîst. Heke min ew lîstik bi Kurdî bilîsta, ew sehne bi Kurdî bûya, dibe ku bigehişta asteke din. Piştî lîstikê em çûn li qehwexaneya li hemeber sehneyê rûniştin. Gava me nûçe guhdar dikirin, me bihîst ku li ser banga Öcalan grevên birçîbûne xilas bûne. Min ji xwe ra got 'eve encama ewil e min ji ber wê strîna bi Kurdî bi dest xist.' Ji wê rojê pê ve li ser lîstina bi Kurdî israr dikim.*

**Ş8:** *Ez li navçeyekê hatime dinyayê. Li mehleya me zarokên leşkeran hebûn. Em diçûn heman xwendingehê. Bavê min ji ber sedemên siyasî ji me dûr dijîya. Em bi diya xwe ra diman. Min ji zimanê diya xwe şerim dikir. Gava li xwendingehê civîna dêûbavan hebûya, min nedixwest bihata. Gava min lîse dixwend, rojê 8 kîlometreyan bi peyatî diçûm, ez hingê li cem pîrka xwe dimam. Rojekê bi tesadûfî pirtûka Fanon ya bi navê Le'netîyên Rûyîzeminê gehişte ber destên min. Gava min ew xwend, ez veciniqim. Min got aha mêtînkarî tiştekî wisa ye, rojê 8 kîlometre rê dide ber te da ku tu ji xwe dûr bikevî. Dûvre*

*me bar kir em hatin navenda Amedê. Ez gelek xweşîk bi Tirkî diaxfitim, Diyarbekîrîyan Tirkîya min xerab kirin (dikene). Piştî hingê min Tirkî hêdî hêdî ji jiyana xwe derxist. Heke kesekî Kurdîaxêv li cem min bi Tirkî biaxivîya, ez li gel wî nediaxiftim. Malbata min ewil piştevanî neda min. Hatime desteserkirin û ez bûm redkarê wîjdanî, vê yekê ew gelek tirsandin. Bavê min got 'Keda me li ber te daye, li te heram be'. Li nava malbatê hem bûbûm mijara endîşeyê hem jî ya tinazan. Sala 2013 an ya 2014an bû, baş nayê bîra min, Mîhrîcana Şanoyê ya Dîyarbekîrê bi lîstika me vebû. Min li pêşiyê bo dê û bavê xwe cih veqetand û li ber çavên wan ez lîstim. Ew xaleke werçerxê bû. Nêrîna wan bo min û karê min guherî û piştevanîya wan her roj zêdetir bû.*

**Ş3:** *Ez endazyar im, lê wextê xwendekar bûm jî bi şanoyê ve eleqedar bûm. Malbata min wek heweseke lê dinêrî, lê piştî dîtin ku têda micid im, gotin wisa neke, endazyariya xwe bike. Wekî gelek malbatên klasîk ên Kurd. Lê gava hatine pêş lîstikan, gotin 'Ya rast karê wî zêde xerab nîne' û hêdî hêdî qebûl kirin. Hêj jî ji min aciz dibin, ji ber ku em ji kar hatine derxsitin. Şano hate girtin. Heçkû dibêjin xwezî te meslega xwe bernedaya… Min şanoya bi Kurdî dereng nas kir. Min metnê ewil yên şanoya bi Kurda 21 saliya xwe da xwend. Lê zêde bandor li min nekir. Jixwe berê qedexe bû. Ji ber ku di lîstika Murathan Mungan a bi navê Mehmûd û Yezîda da straneke Şivan Perwer derbas dibû, lîstik hat qedexekirin û darazandin. Piştî me sînorên xwe yên zimanê Tirkî dîtin, hingê me biryar da bo lîstina bi Kurdî. Zimanê me hemûyan Kurdî bû. Zimanê şanoyê jî Tirkîya Stenbolê ye. Em Tirkîyê bi aksanî diaxivin, ji ber ku fonetîka Kurdî cuda ye. Me hemû bala xwe dida bikaranîna Tirkîyeke têkûz. Û ew jî heye, ziman tenê peyv nîne, gewde jî ye… me dît ku zimanê gewdeya me jî ne Tirkî ye û şanogerîya bi Tirkî bû tiştekî wisa ku me lîstikvanîya xwe kûr nedikir û gelek kêmasiyên estetîk jî derdiketin holê. Me ji sala 2003yan heta sala 2009an şanoya bi Tirkî û Kurdî dikir.*

*Ji 2009an pêve me tenê şanoya bi Kurdî kiriye*

**Ş10:** *Jixwe zêde piştevaniya hunerê nayê kirin. Ya din jî gava mijar dibe Kurd, tirs û endişe jî der tên. Û gava mirov jin be karê me zortir dibe. Dîsa jî wexta hêj zarok bûm min biryara xwe dabû. Ji akademîya navendeke çandê ya girêdayî şaredariyan mezûn bûm û hingê min dest bi şanogerîya profesyonel kir. Lê bi zehmetî. Ji ber ku ji aliyekî ve bi zimanê xwe yê qedexekirî hewl didî hunerê îcra bikî, ku tiştekî zehmet e, û ji aliyê din ve jî hewl didî malbata xwe qanih bikî. Mirov malbata xwe jî fehm dike. Anku, ma kîjan malbat xeyal dike ku keça wan bûye ressam, bûye lîstikvan an jî muzîkjen… Sûcê wan jî nîne. Ji hemû alav û derfetên xiyalkirina hindê hatine beparkirin. Li civaka me huner hatiye bêqîmetkirin. Ma ji bo dengbêjiyê bi xwe jî hin kes nabêjin 'îşê qeşmertiyê ye'.*

**Ş9:** *Li Tirkîye'yê Kurdî bi malan ve hatiye sînordarkirin. Li qada civakî bikaranîna Kurdî heke li bin çavnêrîya dewletê nebe, wekî xetere têtê dîtin. Heke şanoyê bikî tu wekî şanogerên din î, lê heke şanoya xwe bi Kurdî îcra bikî divê li hêviya qedexe/vederkirina herî asayî jî bî. Di halê herî xweş bi xwe da jî divê li sînorên jêrzemînî ji ber çavên sîstemê dûr îcra bikî, an jî divê li sînorên herêmî hebûna xwe berdewam bikî ku têda xetere nebe. Li karên xwe yên bi Tirkî, gava min heman kar bi Tirkî dikir ew li zemîneki maqbûl û bi îtîbar dibin, lê gava bi Kurdî bin divê tu bizanî ku tu li aliyê têkçûyî û ziyandar î. Ew ziyan qada berxwedanê ye. Zemîn û derdê çalakiyên şanoya we her çi bin, heke ziman bi Kurdî be berî her tiştî newekheviya zimanî we dibîne. Ji bo nivîsandin û pêşkêşkirina lîstikeke bi Kurdî qada berxwedanê ye. Me bivê nevê giraniya zimanî hem nasname hem jî pêşengiya hunera me werdigire ser milên xwe. Heke şanoya we bi Kurdî be hûn derqanûnî ne û bimehzûr in. Em ji vê yekê haydar, hewl didin hebûna xwe nîşan bidin û hilberînin.*

## Azadiya Berteng bo Kurdî û Bandora Wê li ser Meyîlkirina bo Zimanî

Hinek beşdarên din jî anîn ser ziman ku wan ji ciwantiyê xwe pê ve meyla xwe bo şanoyê hebûye û bi taybetî jî piştî *"Pêvajoya Çareseriyê"* ku materyalên bi Kurdî zêde bûne, ew jî bi Kurdîya nivîskî çavnas bûne. Ji ber ku di wê pêvajoyê da Kurdî her diçû ji aliye zêdetir kesan ve di serî da yê muzîk û edebiyat, wek zimanê hunerê hatiye bikaranîn, lewma ji wan ra xuya bûye ku mirov dikare bi Kurdî jî şanogerîyê îcra bike.

**Ş6:** *Min heta salên 2010-11an bi Tirkî şanogerî dikir. Heya wan salan Kurdîya nivîskî di jiyana min da zêde nebû. Piştî wan salan her ku Kurdîya nivîskî bêtir kete nav jiyana min, min dît ku şanoya bi Tirkî zêde li min nayê. Herwisa min dît ku Tirkî merama min bi temamî îfade nake. Piştî hingê min dev ji şanogeriya Tirkî berda. Şano jixwe di jiyana min da hebû, lê gava ez bi zimanê xwe dilîzim, heçkû giyanê min li gewdeyê xwe bi cih dibe. Gava Tirkîya wê bifikirim, ji min ra sexte tê. Hem di "Pêvajoya Çareseriyê" da materyalên bi Kurdî zêde bûn hem jî şaredariyan polîtîkayeke azadtir meşand, lewma ez dikarim bêjim ku wê serdemê bandoreke erênî heye li ser şanogeriya min a bi Kurdî.*

**Ş5:** *Xwendekariya min piştî sala 2005an e. Min gelek hez ji axaftin û xwendina bi Kurdî dikir. Giyanê min bi Kurdî bêtir bextewar dibû, têrtir dibû. Li ser navê xwe dibêjim, divê huner, bi taybetî şano divê bi zimanê dayîkê bê îcra kirin. Lewma sala 2010an min qeyda xwe li Navenda Çandê ya Cegerxwîn çêkir, ez yek ji xwendekarên ewil im. Me ji aliyekî ve perwerde didît, ji aliye din ve lîstikên bi Kurdî amade dikir. Malbata min ewil rexne kir. Got karekî te yê wekî gulekê heye, çi karê te heye li şanogeriyê. Lê di nava demê da fikra wan guherî. Bi min şanaz bûn. Ya rastî heke tirsa wan nebe, mijûliya min a bi karûbarên Kurdî ji bo wan cihê şanaziyê ye. Êdî gava behsa min dikin, tenê ji karê min ê biprestîj naaxivin* (dikene), *dibêjin bi şanoyê re jî eleqedar e.*

**Ş7:** *Li bajarê em lê diman, malbata min ez birim li qismê zarokan an jî ciwanan yê NÇM'ê qeyd kirim. Lewma dikarim bêjim ji destpêkê heta niha ez vî karî bi piştgirîya malbata xwe ve bi rêve dibim. Meyla min li ser şanoyê bû, dawiya salên 1990î li gel komeke şanoyê min dest bi lîstikvaniyê kir. Min rasterat bi Kurdî dest bi şanogeriyê kir, digel ku min zimanê xwe dûvra zanîye jî. Ez gelek pê aciz dibûm ku nikaribûm bi zimanê xwe biaxivim. Lê hînbûna zimanî, bi hemû îfade û jestan hînbûn gelek zehmet bû. Gava zarok dihatine tamaşeya lîstikên me yên bi Kurdî, ez gelek kêfxweş dibûm.*

**Ş8:** *Piştî lîseyê min li Navenda Çandê ya Cegerxwînê qeyda xwe çêkir û heman serdemê di komeke şanoya bi Kurdî da min dest bi lîstikvaniyê kir. Sala 2015an di heyama pevçûnan da min belgefîlmek li nav Sûrê dikêşand, hingê hatime desteserkirin. Hem di wextê desteserkirinê da hem jî di desteserkirinê da hatime îşkencekirin. Hinek ziyanên min yên fîzîkî çêbûn û mideheke ji xebatan dûr ketim. Lewma karekî min jî hebû, lê piştî desteserkirinê, ji ber hinceta endamtîya rêxistina terorî ez hatime îxrackirin. Dest danane ser hemû qeydên min û li mehkemeyê wek delil hatine bikaranîn. Helbet min ji wê dozê ber'et kir ji ber ku ji bo belgefîlmê ji Walîtîyê destûra min hebû û ji bo kêşanê min hemû prosedûr bi cih anîbûn.*

Ew tecrûbeyên destnîşankirî mînakên têkîlîya trawmatîk a hunermendên Kurd e li gel zimanî. Ji ber ku wan Tirkî li şûna zimanê xwe yê dayikê, anku Kurdî hînbûne, bikaranîna herdu zimanan bo wan bûye xwedî nirxên tijî sembol. Ji ber ku lîstikvanên ku bi Tirkî dest bi şanoyê kirine, girîngiya zimanê dayîkê ya di warê îfadeya hunerî da li wextê performansa lîstikvaniyê dîtine, ew rewş pêşbîniyên girîng dide derbarê pêwendiya huner û zimanê dayikê.

Komara Tirkîye'yê berpirsîyariya xwe ya "temînkirina perwerdeyê bi şêweyekî wisa ku piştevaniya piranîya çandî dike" bi cih nayine ku li Peymana Navneteweyî ya Mafên Aborî, Civakî û Çandî û li Protokolen Pêvek hatiye destnîşankirin. Lewma bingeha hindê hatiye amadekirin ku cudahiya zimanî bibe sedemê tirs û vederkirinê.

## Binpêkirina Mafan yên ku ji Zehmetiyên Aborî û Psîkolojîk Der Tên

Beşdaran dîyar kirin ku wan di xebatên xwe da gelek zehmetîyên aborî û psikolojîk dîtine. Hate gotin ku ji ber kêmbûna sehneyan û biçûkbûna sehneyên heyî, nemimkûn e ku tenê bi pêşkeşiya lîstikan ve pere qezenç bikin. Hinek beşdaran gotin ji ber hebûna karekî din yê dahatê, ew dikarin şanogeriyê bikin. Hinekan jî gotin wan li şanoyên bajêr yên girêdayî Şaredarîyan bi meaş kar dikir û debara xwe dikir, lê piştî qayûman ji kar hatine avêtin. Di serî da astengiyên fiîlî yên li hember lîstikên bi Kurdî û helwestên cudakar jî zehmetîyên psikolojik in.

## Zehmetiyên Aborî

**Ş5:** *Hunermendên Kurd hina nikarin pereyên ceryan û ava xwe bidin. Ewê çawa rabin di şanoyê da li ser tîp û lehengan bifikirin. Ew neçar in di nav astengiyên mezin yên aborî da çalakiyên xwe bi rêve bibin… Kostûm heye, dekor heye, makyaj heye… bo şanoyê perekî zêde lazim e. Heke karekî min ê din bo debara min nebûya, mixabin min nedikarî şanogeriyê bikim. Helbet gava bi şanoya Kurdî ve mijûl bibî, her dem risk heye ku ji karê xwe bêyî avêtin. Bi rastî ez bi wan tirsan ve kar nakim, lê heke şert û merc gelek xerab bibin, ez dizanim risk heye ku ji karê xwe bêm avêtin.*

**Ş4:** *Van çar salên dawiyê li înşaatan xebitîm û dûvra jî li şirîkeyekê min bar dibirin, wisa min debara xwe dikir. Ev çend meh in jî bi werger, nûçe, hevpeyvîn û telîfa karên berê debara xwe dikim. Min çu caran ji şanoyê debara xwe nekir û li nav van şert û mercan jî mimkûn nîne ez debara xwe pê bikim.*
*Ji ber polîtîkaya çandê ya dewletê, li Kurdistanê mekanên îcraya hunerê gelek kêm in. Mirov tenê dikare sehneyên navêndên çandên komeleyên sivîl û taybet bi kar bîne, lê ew jî hem kêm in hem jî derfetên wan baş nînin. Gelek zehmet e ku em li navendên çandê yên girêdayî walîtiyê cihî peyda bikin. Tenê carekê derfeta me çêbû ku li sehneyên wan lîstikekê pêşkêş bikin, ew jî di “Pêvajoya Çareseriyê” da bû.*

## Kêmasî/Nebûna Piştevaniya Sazûmanî

**Ş12:** *Kêmasiya piştevaniya sazûmanî rê dide zehmetiyê mezin ên aborî û ji wê wêdetir nahêle ku mirov bi temamî xwe bide ser karê xwe. Divê gund bi gund bigerim, berhevkariyan bikim da ku zimanê xwe yê şanoyê dewlemendtir bikim. Divê li gundan bimînin û bibînim ka ew zimanî çawa bi kar tînin, divê çavdêriya lîstikên temaşeyê bikim û wan qeyd bikim. Lê di halê hazir da nikarim hîç yek ji van bikim ji ber ku xwedan îmkanên aborî nînim.*

**Ş8:** *Maeşekî min hebû, jixwe me girêdayî saziyên çandê kar dikir. Jiyaneke me ya rengê komînal hebû. Me pere qezenç nedikir, bi rêya hunerê me jiyana xwe berdewam dikir.*

**Ş7:** *Çend projeyên biçûk hebûn ku me ji YE wergirtibûn. Û odeyên pîşeyan û saziyên sivîl piştevaniya hinek projeyên me kirin, lê heya niha ne ji dewletê ne jî ji saziyên wan me çu alîkarî wernegirtiye.*

**Ş5:** *Me serlêdana saziyên dewletî nekir. Sedemeke wê jî ev e, me xebatên xwe girêdayî saziyên çandê bi rêve dibirin û wan jî biryarên hişk hebûn bo serlênedana saziyên dewletî. Eve midehek e em wekî şanoya taybet dixebitin. Belkî ji niha pêda em dê serî lê bidin. Şaredarîyan piştevaniyên baş kirin. Sehne tehsîs kirin, ji bo seferên lîstikan otobûs dan, li mîhrîcanan cih dan, ew hemû jî piştevaniyên gelek girîng bûn.*

**Ş4:** *Dewlet piştevaniya sazûmanî nade. Em jî gelek ji dil nînin bo serlêdanê. Ew jî ji ber helwesta dewletê ya li hember hunera bi Kurdî ye. Dewlet kêm caran rêya qedexeyê dişopîne da ku wekî qedexeker neyê binavkirin, lê belê rêyên cuda dide ber xwe da ku bi awayekî fiîlî qedexe bike. Bo mînak li bajarekî lîstikeke me hebe, bo heman rojê, heman saetê lîstikeke din datîne û bilêtên wê jî erzantir difiroşe. Yan jî heke em li meheleyan lîstikekê bilîzîn, gotegotê derdixin ku dê pevçûn çêbin,*

*lewma gelek kes nayên, an jî em ji neçarî lîstika xwe betal dikin… Em mekanekê kirê dikin, dûvra bêyî sedemeke maqûl peymanê betal dikin. Gava em piçekê li dûv diçin, em dibinin ku emnîyetê hişyarî daye wan. Hema xwedanên mekanan bi xwe dibêjin ew hatine hişyarkirin lewma ew çavtirsyayî bûne û peyman betal kirine. Ew dizanin heke mekana xwe bi kirêdarî bidine me, ew dê bêne cizakirin û ji aliyê aborî ve dê ziyanê bigehe wan… Gava em serlêdana Saziyên Sivîl ên Tirkan dikin, ew jî mercê qezenckirina debarê bi vî karî derdixin pêşiya me. Lê me derfeteke wisa nîne. Ez li înşaatan dixebitim bo debara xwe. Lewma ew astehgiyên prosedûrî yên saziyên sivîl mexdûrîyeta me ji holê ranakin. Herçend berteng jî be komên xwendekaran û hinek şexs mesrefên bilêt û organîzasyonê didin û bi wî awayî alîkariya me dikin.*

Derbarê piştevaniya sazûmanî li gel kesên ku li saziyên çandê yên Kurdan reveberî kirî jî hevdîtin pêk hatin. Daneyên ji wan hevdîtinan hatine bidestxistin pêşbîniyên girîng temîn dikin derbarê bandora qedexeyên bi salane û zordariya giran a siyasetê li ser polîtîkayên çandê yên siyasetmedarên Kurd û saziyên Kurdan yên çandê.

**Rêvebirê Şanoyê (RŞ) 1:** *Gava me destpêka salên 1990î NÇM ava kir, armanceke me jî ew bû ku em çanda Kurdan ya talankirî berhev bikin û ji nû ve li xwedanê wê Kurdan vegerînin. Armanceke din jî ew bû ku wek xwendingehekê bixebitin û li ser çand û hunera Kurdî xebatên akademîk bi rêve bibin. Ji bo wê armancê me Lijneyeke Zanistê ava kir. Li wê Lijneya Zanistî ku têda kesên wek Îsmaîl Beşîkçî, Cemşîd Bender, Mûsa Enter, Feqî Huseyn Sagniç hebûn, dersên zimanê Kurdî, dersên edebiyat, dîrok û sosyolojiye hatine dayîn. Li kêleka wan xebatan, ji bo xebatên sinema û şanoyê jî me yekîne ava kirin. Me kovareke bi navê Rewşen derxist. Me dixwest em bibin saziyeke neteweyî ya çandê, lewma di avakirinê da me hewl da hemû aliyên Kurdan û wisa jî saziyeke ku xwedî hêzeke temsîlîyetê ya bilind derket holê. Li nav me hevalên ciwan jî*

*hebûn, lê kesên wekî Mûsa Enter jî hebûn ku nifşê rewşenbîrên Kurd ên destpêka sedsala 20an digehandin salên 1990î. Kesên wekî Ebdûrrehman Durre jî hebûn ku perwerdeya klasîk a medreseyê dîtibûn û edebiyat û çanda klasîk a Kurdan dizanî. Rêvebir jî ji aliyên cuda bûn. Me dixwest karên demdirêj ên mayînde bikin. Me her çar salên ewil karên gelek baş pêk anîn. Lê piştî hingê meyleke wisa çêbû ku saziyê rasterast bi aliyekî siyasî û têgihiştina wê ve girê bide. Piştî wê di hilberîna hunerî da hişkî û lawazî peyda bû. Saziyê ew taybetmendiya xwe ya tevgir ya destpêkê ji dest da û bû saziyeke wisa ku tenê mirovên xwedî meyleke siyasî ya diyarkirî têda kar dikir. Bi rastî derfet û ew ked hemû çûne ber avê. Ez bi xemgînî dibêjim ku li hemû parçeyên Kurdistanê sazî û polîtîkayên çand û hunerê yên dewletan hene, lê belê sazîyên Kurdan ên çandê û polîtîkayeke wan ya neteweyî ya çandê tuneye.*

**RŞ2:** *Ewil bi rêya reformên hevahengiya YE'yê dûvra di serdema "Pêvajoya Çareseriyê" herçend berteng jî be, dewletê destûr dabû bikaranîna Kurdî. Lê belê geşedanên qada çandê yên wisa nebûn ku bi dîyaloga li gel dewletê û bi piştevaniya wê çênedibûn. Bo mînak em ji bo lîstikek şanoyê derdiketin îhaleyê, me digot 'lîstika şanoyê', heke me bigota şanoya bi Kurdî hingê belkî dewletê destûr nedidayê. Heke rastiyê bixwazî, me rewşên fiîlî ava kirin û gelek kar jî pêk anîn. Ew geşedenên wisa nebûn ku dewlet bi temamî pê qayil dibû û destûr didayê. Ji aliyê din ve hêviya hevalên li siyaseta Kurdan û rêveberiya şaredariyan cuda bû. Gava Navenda Çandê ya Cegerxwîn û Konservatûwara Aram Tigran hatine avakirin, armanca me ew bû ku em giraniyê bidine ser perwerdeyê û bingehên hilberîneke çandî ya domdirêj ava bikin û bi rastî jî em bi siyaseta rojane ve zêde mijûl nedibûn.*
*Gava ew sazî ava bûn, ji nişka ve hesreta bi dehan salan peyda bû. Me xwest gelek karan pêk bînin. Cara ewil me dê bêyî tirsa qedexeyê çand û hunera xwe îcra bikira. Lê hem tecrûbeya me ya pratîk nebû ka ev kar çawa pêk tên, hem jî binesaziya me*

*ya sazûmanî nebû. Me dît ka polîtîkayên fermî yên dewletê em çawa hejar û bêamadehî hiştine. Lewma me biryar da ku em giraniyê bidine perwerdeyê û hilberîna demdirêj ya polîtîkayên çandê. Lê bûrokrasî û qadroyên me yên siyasî ji aliyekî ve karên popûler, kurtedemî û xuyabar yên wekî atolye, konsert û mîhrîcan dixwestin ji bo beralîkirina girseyê. Ji aliyê din ve jî li konservatûwaran perwerdeyeke sê salane piçekê lûks bû li gor fikra wan hevalên ku bi çavkaniyên berteng ve hewl didan pirsgirêkên acîl yên bajarî çareser bikin, ew bajarê ku bi salan hatiye îhmalkirin û bi aciziyan wisa re micadele dike ku bi şer û koçê ve girantir bûne. Wisa bû, hêvî û daxwazên xebatkarên qada çandê û siyasetmedar û bûrokratan li hev nedihatin. Atolyêyên hunerî nîşanî me da ka perwerdeya hunarê ya zimanê dayikê çi qas girîng e. Lewma me baş dizanî ku bêyî perwerdeyên demdirêj konsert û mîhrîcan dê ji berê heyî xwarana û piştî midehekê qada çandê dê hişk bikirana, ji ber ku em li qadê bûn, me mesele dizanî. Tiştê me texeyûl dikir, incax bi polîtîkayên dewletê dikarîbûn bihatana îcrakirin. Lê ji ber ku dewletê derfeteke wisa nedida çand û hunera Kurdî, em wekî dewletê tevdigerîyan. Perwerdeyên demdirêj yên gihandina mamoste û xwendekaran rê nade ku berhemên we ji bo polîtîkayên rojane bêne bikaranîn. Lewma piştî demekê hevalên ji siyasetê di dilê xwe da gotin ma em çima pere radizênin vê qadê. Ew bi lêv jî kirin. Ew bi bertengiya çavkaniyan ve jî girêdayî ye. Hûn projeyekê jê ra dibin, ew dibêje ez dikarim bi vî pereyî avê bibime sê gundan. Li gor wan xuyabariya karê me nebû. Bo me pêşniyaza wan ev bû: li şûna ku li akademiyê sê salan perwerdeyê bidine pêncî xwendekaran, perwerdeyên şeş mehane bidine şeş sed xwendekaran. Piştî 6 mehan jî li hêvîyê bûn ku her kesê li kemanê xista. Hisabeke wan a ecêb hebû. Lê belê me dixwest kesên wisa bigehin ku ne tenê enstrûmanan baş dijenin, lê bibin kesên xwedan zanîn û çanda muzîkê û heke hewce kir perwerdeya wî karî bidin. Ji aliyekî ve jî me materyalên perwerdeya bi Kurdî amade dikirin. Wan nedidît ku nêrîneke wisa di maweya demdirêj da bêtir bandordar in. Em bêjin piştî sê salan sê xwendekarên te mezûn bûn. Ew sê xwendekar tên wê astê ku bikarin perwer-*

*deyê bidin 40 xwendekaran. Wisa bi rêya derbaskirina zanîn û tecrûbeya di navbera nifşan da tu çanda xwe pêş ve dibî û mayînde dikî. Ji wî aliyî ve gelek acizî çêbûn ji ber ku bi ça-vekî navgînî li çandê dihate mêzandin.*

Tecrûbeyên şanogerên Kurd nîşan didin ku dewlet piştevaniya hunera bi Kurdî û hunermendên Kurd nake û ji wê wêdetir xwedan helwesteke astengker e. Ew kiryarên dewletê binpêkirina xalên 12-27em yên Beyan-nameya Mafên Mirovan ya Nevneteweyi ya NY; berpirsiyariya dewletê ya piştevaniya çalakiyên çandê ya ku xala 15en ya Peymana Mafên Aborî, Çandî û Civakî; û herwiha binpêkirina berpirsiyariya dewletê ya pişteva-niya huner û hunermendan ku di Peyman Parastina Curbicuriya Îfadeyên Çandî ya UNESCO'yê û Biryara Statûya Hunermendan ya UNESCO'yê da hatine diyarkirin.

## Astengiyên Psîkolojîk û Binpêkirina Mafan

**Ş5:** *Ne ez ne jî kesekî ji koma me tûşî êrîşa fîzîkî nehat. Lê me şîdeta psikolojik dît. Polîs li gor dile xwe tê dibêje ezê lîstikê qeyd bikim. An jî li ber derî disekine, ji temaşevanan nasna-meyê dixwaze. Ew mirov tên dîtina lîstikê, vêca venêrîna nas-nameyê çi ye? An jî car caran hin kes tên pirsan dipirsin, bi pirsên eletewş mirovî gîro dikin. Dûvra kirasê xwe radike, ji bin ve tebanceya xwe nîşanî te dike. Ev hemû jî cureyên şîdetê ne… temam e, li te nade, lê li giyanê mirovî şkence dike.*

**Ş7:** *Polîs miheqeq tê nişandana ewil ya lîstikên me. Li ber derî disekinin, bernameyê dipirsin. Belkî midaxeleyeke rasterast nîne, lê ew kiryar hemû rasterast bandorê li temaşevanan di-kin. Hin caran berî lîstikê li kûlîsê bi kuçikan venêrînê dikin. Hin caran li ber deriyê mekana lîstikê makîneyên xwe yên bi zirx park dikin. Ev kiryar hemû hewl didin temaşevana dûr bixin. Hin temaşevan bi rastî jî ditirsin û nayêne temaşeki-rinê. Me çend caran li bin ablûkayê lîstika xwe lîst. Carekê gava çalakiyê bi navê 'Rojên Şanoyê' hate qedexekirin, lîsti-*

*ka me jî hate qedexekirin. Hinek kiryarên rûtîn jî hene: berî hemû lîstikan em metnê lîstikê û agahniyên xwe yên nasnameyê dişinin.*

## Kiryarên Cudakar

Li gor beşdaran kiryareke din a berbelav jî ev e: di serlêdanên bo sehneyan da hem metnê bi Tirkî hem jî yê bi Kurdî tête xwestin. Herwisa hate gotin ku hêzên ewlehiyê têne lîstikên destûrwergirtî û lîstikan di wextê lîstinê da ji metnê bi Kurdî jî dişopînîn da kontrol bikin ka lîstik li gor metnî diherike yan naherike.

> **Ş4:** *Gava em serlêdana sehneyekê dikin bo lîstikeke bi Kurdî, ji bo kîrêya 2 rojan 1600 TL pere dixwazin, lê ji bo lîstikên bi Tirkî 800 TL dixwazin. Ew helwesteke bi temamî cudakar e. Li ser kaxezê her kes dikare wekhev daxwaz bike, lê di kiryarê da cuda ye… Min serî li Şanoya Bajêr a Şaredariyê da. Min puana herî bilind (98) wergirt, lê nehatine qebûlkirin. Sedem jî aksana min bû, jixwe 2 pûanên min jî ji wê hatibûne birîn. Lê pêncî sal berê li hemû cîhanê hate qebûlkirin ku aksan û astengdarî ne pîvan e bo şanogeriyê. Ez ji bo projeyan nehatime qebûlkirin. Gava tu dibêjî em şanoya bi Kurdî dikin, tinazên xwe dikin û dibêjin 'ew çi ye'. Evên ha ne binpêkirinên wisa ne ku bi delîlên nivîskî îspat bikim, lê min ew dîtine.*

Kiryareke din a cudakar ji ev e: Wek ku ji muzîkjenên Kurd dihate xwestin ku stranên bi Kurdî nebêjin, ji şanogeran jî hatiye xwestin ku lîstikên bi Kurdî nelîzin. Di mînaka şanogeran da, ji helwesta fermî cuda, di hin rewşan da ji ber ku bi Kurdî ye pêşkêşiya lîstikê bi awayekî fiîlî hatiye astengkirin.

## Di Pêşkêşiyên Lîstikên bi Kurdî da Astengiyen Fiîlî

Gava lîstikên ji Tirkî an jî ji zimanekî din bo Kurdî hatine wergerandin têne pêşkêşkirin, di pêşkêşiya bi Tirkî ya lîstikê da çu pirsgirêk rû nadin, lê helwestên li pêşkêşiya bi Kurdî ya heman lîstikê nîşan didin ku cudakariya zimanî tête kirin.

> **Ş4:** *Em hin lîstikan werdigerînin ser Kurdî û dilîzin. Ew bi*

> *Tirkî bi caran li şanoyên dewletê hatine lîstin. Em ê bi Kurdî pêşkêş bikin. Prosedûrên derasayî li ser me ferz dikin. Qeyda sicîla edlî, fotokopîya nasnameyê, navnîşana îkametê, kontrolên bi kuçikan, berî lîstika kontrola polîsan li kulîsê û qeydkirina hemû lîstikê bi qemerayê. Ew berê jî karên rutin bûn, niha jî wisa ye. Ne kiryarên wisa ne ku li paş me mane. Ew tenê li şanoyê jî naqewimin, em bi hevalên muzîkjen re diaxivin, berî konsertê bi kuçikan kontrol hatiye kirin. Ya rast ev yeke bûye polîtîkaya çandê ya dewletê.*

Wextê hevdîtinên qadê yên vê raporê dihatine kirin, lîstika Dario Fo ya ku berê bi çend navan bi Tirkî hatibû pêşkêşkirin û bi navê 'Bêrû' bo Kurdî hatibû wergerandin, çend saetan beriya bernameyê ji aliyê Qeymeqamtiya Gazîosmanpaşa ve bi hinceta 'Ewlehiya Civakê' hate qedexekirin. Ew lîstik di çarçoweya projeya 'Projeya Piştevanîya Şanoyê' ya Şanoya Bajêr ya Şaredariya Mezin a Stenbolê da li sehneya Gazîosmanpaşa dê bihata lîstin û heke destûr bihata dayîn, Bêrû dê bûbûya yekemîn lîstika bi Kurdî di dîroka 106 salî ya Şanoya Bajêr da.[32]

Ew biryara qedexeyê ku derkete ser medyayê[33] jî, careke din zordarî û qedexeyên li ser zimanê Kurdî û hunera bi Kurdî dîsa anî rojevê.[34] Derhênerê lîstikê derheqê pêvajoya qedexekirinê da wiha got:

> **Ş1:** *Piştî biryara Şanoya Bajêr a Stenbolê bo piştevaniya şanoyên taybet, di dîroka xwe ya 106 salî da cara ewil dê cih bidana lîstikeke bi Kurdî jî. Li ser nûçeyên rûreşker û krîmînalîzeker yên rojnameyên nêzikî hikûmetê, sehmeke mezin çêbû di dilê me da… Roja lîstikê hat. Servîsa şaredariyê dê biribana sehneyê. Ne gotin bi xêr hatin, ne rûgeşiyek. Di navbera xwe*

32 Kaymakamlıktan Kürtçe Oyuna Son Dakika Yasağı, https://www.dw.com/tr/kaymakaml%C4%B1ktan-k%C3%BCrt%C3%A7e-oyuna-son-dakika-yasa%C4%9F%C4%B1/a-55265101

33 Kürtçe oyun Beru'nun yönetmeni: 3 yıldır her yerde oynanan oyun şimdi mi propaganda oldu?, https://tr.euronews.com/2020/10/14/kurtce-oyun-beru-nun-yonetmeni-3-y-ld-r-her-yerde-oynanan-oyun-simdi-mi-propaganda-oldu

34 Oyun Kürtçe… Sahne İBB'nin… Yasak kaymakamlığın, https://www.diken.com.tr/ibbnin-sahne-verdigi-kurtce-oyuna-kaymakamaliktan-yasak/; İBB Şehir Tiyatrosu'nda oynanacak oyuna yasak, https://www.sozcu.com.tr/hayatim/kultur-sanat-haberleri/ibb-sehir-tiyatrosunda-oynanacak-oyuna-yasak/

> *da gotin ew koma dê biçe Gazîosmanpaşayê ev e, dûvra qet li gel me neaxiftin. Du rojan berî hingê ez di lîstikeke bi Tirkî de xebitîbûm ku dîsa li şanoya bajêr hatibû pêşkêşkirin, hingê em bi kêfxweşî pêşwazî kiribûn û me di rê da sohbet kiribû. Gava ji bo projayê em çûna sehneyê, min dît ku salona biçûk dane me. Ez bi hindê gelek aciz bûm.*

Du saetan berî lîstikê polîs hatine binaya pêşkêşiyê û ragihandine ku lîstik hatiye qedexekirin. Derhênerê lîstikê rayedarên Şanoya Bajêr wisa rexnekirine ku ew li pişta wan nesekinîne:

> **Ş1:** *Ez li hêviyê bûm ku rayedarên Şanoya Bajêr tiştekî mina 'Ev lîstik ya nivîskarekî bi navê Dario Fo ye ku xwedanê Xelata Nobelê ya Edebiyatê ye û lîstik gelek caran bi Tirkî jî hatiye lîstin.' bibêjin û li ser biryara xwe bin. Me sala 2017an li Mîhrîcana Şanoyê ya Moskowê bi vê lîstikê xelat wergirtiye, me metnên bi Tirkî û Kurdî dayîne we. Me go belkî hûn piçekê pişta me bigirin. Lê wan gotin 'Tiştek ji destên me nayê.' Em li gel midûr derketine ser sahneye, me jê ra mijar rave kir. Dûvra min jê ra got me du roj berê li ser vê sehneyê lîstikeke bi Tirkî pêşkêş kir, polîs nehatin. Nexwe pirsgirêk ew e ku [lîstik] bi Kurdî ye. Mamosteyên me jî ji wan bûn ên bi Tirkî şano îcra dikir, wan bi sedan lîstik lîstin. Niha gava lîstikek ji ber zimanê xwe hate qedexekirin, ma hûnê hema wisa besekinin û qebûl bikin…. Gotin nexêr, em ê hevdîtinê pêwîst bikin û em jî dê daxuyaniyekê bidin. Me dekoren xwe dane hev û em derketin.*

Derhênerî sehma dilê xwe ya derbarê daxuyaniyê wiha rave kir: 'Di wan rewşan da îstîfadekirina ji mafan li gor atmosferê diguhere, ji wê zêdetir guncaviya atmosferê jî her ji aliye kesên din ve tête dîyarkirin.'

Daxuyaniyên rayedaran yên derbarê qedexeyê jî li ser helwesta dewletê ya li hember çalakiyên hunera bi Kurdî fikrekê dide mirov. Piştî ku qedexeyê bertek dîtin, rayedaran daxuyaniyek da û gotin 'lîstik ne ji ber zimanê wê, lê ji ber propagandaya rêxistinê hatiye qedexekirin'. Li ser wê

daxuyaniyê jî wisa got:

> **Ş1:** *Heke wisa be çima heta niha çu lêpirsîn nehatine pêkanîn li ser vê lîstika ku ev sê sal in tête lîstin… bi min li vir kiryareke bi temamî keyfî û konjoktûrel heye… ji ber wan kiryaran Kurdî zimanekî qedexe ye, yan nîne em nizanin…. dibêjin qedexe nîne, lê bi fîilî her car qedexe dikin. Ziman bi xwe wek gefeke civakî tête dîtin.*

## Şîdeta Bêdengiyê – Min Nedîtîye… Nebihîstîye… Nizanim… Destûrê jî Nadim.

Cureyekî din yên binpêkirina mafan yê berbelav jî, *şîdeta bêdengîyê* ye ku li beşa binpêkirinên li hember muzîkjenan jî hatibû vegotin. Qismekî beşdaran wisa îfade kirin ku gava li şanoyên dewletê serlêdana sehneyê dikin demek dirêj ji wan re çu bersiv nayên dayîn. Li gor beşdaran ew dirêjkirina bersivnedanê rêbazeke berbelav e. Beşdaran diyar kirin ku bi wan kiryaran ve mafên wan ên îfadeya hunerî ji destan tê wergirtin. Hunermendekî beşdarê lêkolînê got gava carekê wan li Şanoyên Dewletê serlêdana sehneyê kir û demeke dirêj bersiv wernegirt, ew çûye cem nasekî xwe yê rayedar û ji wan ev bersiv wergirtiye:

> **Ş6:** *Jixwe armanca vebûna şanoyên dewletê li herêmê ew e ku Tirkîyê bi milet bide hezkirin û berbelavkirin. Hûn jî radibin ji bo lîstikên bi Kurdî destûrê dixwazin. Ew li dijî polîtîkaya çandê ya dewletê ye. Heke ji lîstikên bi Kurdî re destûr bê dayîn, ew dibe detûra berbelavkirina Kurdî li herêmê. Lewma neminkûn e ku em destûrê bidin vê yekê.*

Beşdarê me hesta xwe ya derbarê wê bersivê bi van gotinan rave kir: “ *Mirov her car dixwaze bawer bike ku hin tişt guherîne, lê her car jî dibîne ku tiştek jî neguherîye.’*

Têkilîya di navbera mewzûata fermî û politikaya çandê li ser tecrûbeyên hinek beşdaran yên li saziyên dewletê xwe baş diyar dike. Beşdarekî din ku derhêneriya şanoyê jî kiriye, tecrûbeyên xwe wisa vegot:

> **Ş2:** *Me sala 2009an ji bo lîstikeke bi Kurdî serî li şanoyên dew-*

*letê da. Ji aliyê qanûnî ve çu astengî nînin. Di pêvajoya aştîyê da Midûrê Giştî yê Şanoyan gotibû ma çima li şanoyên dewletê lîstikên bi Kurdî jî neyên lîstin. Bo wê serlêdana me gotin sehneya me tune, dûvra gotin te'dîlat heye li sehneyê û wisa daxwaza me qebûl nekirin. Ez jî li wan gerîyam, min gotê ev kirinên we cudakarî ne û heke îzeheke maqûl nekin ez ê mijarê bidim medyayê. Gava peyva medyayê bihîstin, hinekê tirsîyan û destûr dan ji bo pêşkêşiya lîstikê. Hingê cara ewil lîstikeke bi Kurdî bi awayeki fermî li Şanoyên Dewletê hate lîstin. Mirov aciz dibe bi wê şêweya destûrwergirtinê. Cihê acizîyê ye ku em enerjiya xwe ji bo van tiştên eletewş xerc dikin.*

**Ş4:** *Kiryareke balkêş heye… Ewil me zêde fehm nekir. Em ji bo sehneyê serlêdanê dikin. Dibêjin cereyan xerab bûye. Em dibêjin temam, piştî we çareser kir tehsîs bikin, hingê bersiv nadin. An jî dibêjin bername tijî ye, em dibêjin bo tarîxeke din cih bidin, hingê jî bersiv nadin. Dûvra me fehm kir ku ew di eslê xwe da polîtîkayek e. Qedexe nake an jî bersiva neyînî nade, heke wisa bike dê li dijî qanûnên xwe be. Lê bi awayekî fîîlî nahêle tu ji wî mafî îstîfade bikî.*

Hevdîtinên vê xebatê bi daneyên girîng nîşan didin ku cudakarî bi saziyên dewletê ve sînordar nîne û li nav komên şanoyê yên zanîngehan jî berbelav e. Beşdarekî got wan serlêdan kiriye bo mîhrîcaneke şanoyê ya zanîngehekê, lê belê serlêdana wan nehatiye qebûlkirin. Wek sedem jî jê ra gotine ew tenê organîzator in, jûrîyê biryareke wisa daye. Beşdarî ew bûyer wiha rave kir:

**Ş2:** *Ez li organîzatoran gerîyam. Bi acizî û xemgînî min jê ra got 'ma hûn qet meraq nakin ka şanoya vî gelê ku eve hezar sal e hûn pê re dijîn çawa ye? Hêvîdar im we ji ber zimanê wê qedexeyek nekiribe.' Piştî nîv saetê li min vegeriyan gotin 'em ji dil lêborîna xwe dixwazin…. Gava me dît ku lîstik bi Kurdî ye, me nezanî ka çi bikin… em hinekê tirsîyan û sehmê da dilê me.' Dûvra lîstik daxilî bernameya mîhrîcanê kirin. Li zanîn-*

*geheke din jî nehêlan em afîşa bi Kurdî daliqînin. Hevalê me yê ku çûbû daliqandina afîşan gotibû ‘Lê bi zimanên din afiş hene’, li ser wê gotinê wan jî gotibû ‘wan dewleta xwe heye’. Me ew rewş da medyayê, incax hingê destûr dan ku em afîşê daliqînin. Ji bo mîhrîcaneke şanoyê ya Weqfa Çand û Hunerê ya Stenbolê me bi lîstikeke bi Kurdî serlêdan kir. Ji nav serlêdanan tenê ji bo ya Kurdî metne tam xwestin. Me jî şand. Dîsa jî serlêdana me bêyî hincet red kirin. Me go çima wisa ye, gotin em mecbûr nînin îzeh bikin… Me got ma helwesteke we ya cudakar heye ji hember Kurdî, ma hûn ji me ra dibêjin neteweperwer. Em binpêkirin û cudakariya li ser xwe rave dikin, ew dibêjin Kurd hema her edebiyata mexdûriyê dikin. Êê ma em çi bikin? Li cihekî afîşên me dirandin, hêzên ewlehiyê li şûna ku bergirîyê bike, gotin rewş xerab e, hûn nelîzin baş e…*

**Ş5:** *Gava mirov li qanûnên Tirkîye’yê dinêre, xalên qedexeker ji makezagonê hatine derxistin. Li qanûnan jî qedexeyeke rasterast nîne. Lê huner ne tiştekî wisa ye ku lehzeya serbestî hate dan, bête îcrakirin. Perwerde pêwîst e, sehne pêwîste, kostûm pêwîst e… Dewlet vana bi çu awayî temîn nake. Jixwe îqtîdara heyî piştevaniya şanoyê nake. Nexasma piştevaniya şanoya Kurdî qet nake. Wisa tevdigerin heçkû şanoyeke wisa nîne.*

Beşdaran bi mînakên wekî yên li jorî îfade kirine ku qedexeya zimanî ya bi salan û polîtîkayên çandê yên vederker derbasî Zanîngeh û saziyên taybet yên çandê bûne. Ji ber ku tenê ji lîstikên Kurdî metnê tam dixwazin, bersivê nadin serlêdanan û heke bersiv bidin jî hincetên ji maqûliyê dûr pêşkêş dikin, lewma mirov dibîne ku polîtîkayên dewletê yên ku ziman û çanda Kurdî tune qebûl dikin, ji aliyê rêveberiyên zanîngeh û hinek saziyên sivîl yê civakê ve jî ji dil têne şopandin. Helbet ew ‘rewşa tirsê û neçariyê’ ku ji aliyê beşdaran ve hatiye vegotin, helwesta wan saziyan bêguneh nake. Hêvî ew e ku saziyên li qada hunerê hilberînê dikin, hêzê didin civaka sivîl û xwedan îdîayên piştevaniya çand û hunerê ne, bibin saziyên wisa ku xwedan nirxên demokratik bin û xwedan nêrîna vederki-

rina cudakariyê bin. Hinek beşdaran jî gotin heke şanoyeke bi Kurdî an jî muzîkjenekî Kurd hatibe gazîkirin ji bo mîhrîcanekê, ew têrbar tête dîtin û gava rexneyek hat jî dibêjin 'ma me gazî nekir?' Beşdarekî got 'me wekî rengekî etnîk li navê belav dikin.'

## Bayê Siyasî û Binpêkirina Mafan

Me hewl da derbixin holê ka binpêkirina mafên şanogeran çiqas bayê siyasî ve girêdayî ye. Hunermendên ku di pêvajoya endamtîya YE'da bi awayekî fermî derfeta pêşkêşkirina lîstikên xwe dîtine gotin ku di 'Pêvajoya Çareseriyê' da rewşeke azadtir peyda bûye ji bo îcraya hunerê. Digel hindê jî gotin ku di 'Pêvajoya Çareseriyê' da gelek kiryarên keyfî û binpêkirinên mafan pêk hatine. Rexneya herî giran a li ser 'Pêvajoya Çareseriyê' jî ew e ku polîtîkayên hiqûqî û çandî nehatine bicihkirin ku rê bidin berdewamiya çand û hunera Kurdî. Beşdaran li ser tecrûbeyên xwe wisa îfade kirin ku dewletê venêrîneke şid ya nevrokê pêk anîye li ser hunera Kurdî û wisa xwestiye berê geşedana wê biguherîne. Ji aliyê din ve çu piştevanîya aborî û sazûmanî nedaye hunera bi Kurdî û bi kiryarên keyfî xwestiye bi awayekî fîlî wê qedexe bike. Beşdaran gotin bi wan helwestan dewlet dixwaze di maweyeke dirêj da hunera Kurdî bike yeka wisa ku bê guhdar û temaşevan bimîne.

Binpêkirinên mafan û kiryarên keyfî yên bi taybetî piştî 'Pêvajoya Çareseriyê' pêk hatine ev in: ji hunermendan xwestina sicîla edlî û belgeyên îkametê; xwestina metnê tam yên lîstikan berî hemû pêşkeşiyan; ji temaşevanan pirsîna nasnameyê; berî pêşkeşiya lîstikan bi kuçikan venêrîna kûlîsê; bicihkirina makîneyên bizirx û otoyên polîsan li ber deriyê hemû lîstikan, lîstikên destûrwergirtî têda; qeydkirina lîstikan bi qemereyê, qeydkirin temaşevanan bi qemereyê, hwd.

Beşdaran gotin heke Kêşeya Kurd negehije çareseriyeke siyasî, Kurd nebin xwedan statûyeke neteweyî û hiqûqî, şert û mercên hebûna hunera bi Kurdî dê di rewşên gelek xerab bibe.

Ji ber ku şertên hiqûqî yên guncav nehatine avakirin û piştevanîya sazûmanî nehatiye dayîn hunermend hunera xwe bi naverok û şêweyeke diyarkirî da îcra dikin, li gor beşdaran ew rewş bi xwe jî bi awayekî berfireh divê wekî binpêkirina mafan bêne dîtin. Beşdara gotin herçend gelek kurt kêşa be jî ''Pêvajoya Çareseriyê' ji wî aliyî ve rê daye ku hunermendên

Kurd li kêleka formên klasîk û herêmî formên cuda yên wekî muzîkal û operayan jî pêşkêş bikin digel cureyên cuda ji Shakespeare heta Moliere.

**Ş2:** *Di pêvajoya aştîyê da me ji bo piştevaniya aborî serî li Wezareta Çandê da û wan çar salan li ser hev piştevanî dane me. Me sala 2016an du caran serlêdan kir. Her bi heman şiklî me serlêdana xwe kir û hemû şert û merc bi cih anîbûn. Di herduyan da jî bersiva neyînî dan. Bersivên eletewş ên wekî 'Bûdçeya aborî nizanim li gor çi guncav nîne felan.' Jixwe careke din jî piştevanî nedane me.*

**Ş3:** *Ji bo Kurdan çu caran "Pêvajoya Careseriyê" ya rastîn çênebû. Li Başûr an jî li Yekîtiya Sovyetê ya kevin û demek kurt jî li Komara Mehabadê di warê şanoyê da geşedanên girîng çêbûne. Lê dûvra, di serdemên pevçûna leşkerî da ew xebat dîsa rawestane. Li Tirkîye'yê jî wisa bûye. Piştî salên 2000î li bin banê şaredariyan navendên çandê û konserwatûwar hatine avakirin. Li wan deran perwerdeya hunara Kurdî hate dayîn û gelek xwendekar gehiştin.*
*Sala 2010an ji lîstika 'Berî Cemed Bihele', lîstikek ji aliyê Haldun Dormen û Kemal Uzun bi şêweya muzîkalê hate derxistin. Ew lîstik bi navê 'Çîrokeke Zivistanê' bi derhêneriya Haldun Dormen bi Kurdî hate pêşkêşkirin.*[35] *Sala 2012an lîstika Sophokles ya bi navê Antîgone di çarçoweya 18em Mîhrîcana Şanoyê ya Stenbolê, li Sehneya Haldun Taner bi kurdî hate lîstin.*[36] *Lîstika Shakespeare ya bi navê Hamlet sala 2012an ji aliye Şanoya Bajêr ya Şaredariya Bajarê Mezin a Diyarbekirê bi Kurdî hate pêşkêşkirin. Wê lîstika ku nêzî 50 caran hatiye lîstin, qebûleke mezin dît. Me li bajêrên ji hev cuda çend caran salonên Şanoyên Dewletê bi kar anîn. Polîsan gelek caran midaxeleyî lîstikên me nedikir. Helbet ew azadiyeke gelek*

35 Dormen'in Yönettiği Kürtçe Oyununa Yoğun İlgi -Ünlü Tiyatrocu Dormen'in Diyarbakır Büyükşehir Belediyesi Tiyatrosunda Kürtçe Olarak Sahnelediği 'Bir Kış Öyküsü' Adlı Müzikali 1 Ayda 3 Bin Kişi İzledi, https://www.haberler.com/dormen-in-yonettigi-kurtce-oyununa-yogun-ilgi-unlu-haberi/ Dormen'in yönettiği Kürtçe tiyatro oyunu, https://www.hurriyet.com.tr/gundem/dormenin-yonettigi-kurtce-tiyatro-oyunu-13949198;

36 Antigone, https://www.istanbul.net.tr/etkinlik/tiyatro/antigone/5182/14,

*sînordar bû, lê gava niha lê dinerim, di dilê xwe da dibêjim ew serdemeke wekî cinetê bûye. Dûvra rewş xerabtir bû. Carekê polîsan bi ser lîstika me girt, gotin emê bi qemereyê qeyd bikin. Dûvra gotin emê êdî her lîstikê qeyd bikin. Me go ew neqanûnî ye. Guh nedane me, gotin hingê hûn nikarin bilîzin. Me piştî qayûman şanoyeke taybet ava kir û wisa xebatên xwe berdewam kirin. Vê carê jî polîs bi şiklekî din aciziyê dide. Erebeya xwe li ber derê mekanê dihêle, yên têne hundir kontrol dike. Em diçin xwarinê, me dişopîne. Dixwazin aciziyê bidin.*

**Ş5:** *Bandorên gelek erênî yên 'Pêvajoya Çareseriyê' çêbûn. Bo mînak tirs ji holê rabû. Me li Navenda Çandê ya Cegerxwîn lîstik pêşkêş dikirin, saloneke 373 kesî heye, ew salon tijî dibû, gelek caran me kursî datîna navberan. Wekî biharekê bû. Her kes gelek bextewar bûn. NÇM dihat bîra min, ya ku salên 1990î li jêrzemînê dest bi xebatên şanoyê kiribû. Hingê hem derfet kêm bûn, hem temaşevan ji tirsan nedihatin. Heke hûn ji min bipirsin hingê em qasî serdema 'Pêvajoya Çareseriyê' qanûnî nebûn, lê azadiya me jî kêmtir nebû. Tenê bedelê wê giran bû. Divê mirov ji bo atmosfereke azadiyê bitêkoşe ku bedelê wê giran nebe. 'Pêvajoya Çareseriyê' ji wî aliyî ve hêvîyek bû… Lewma em kelecanî bûn, hêvîdar bûn…*

**Ş4:** *Bi min li "Pêvajoya Çareseriyê" ji bo hunermendên Kurd zêde tiştek neguherî. Li Batmanê şanogerek salên destpêka 2000î çi pirsgirêk kêşabana, serdema "Pêvajoya Çareseriyê" jî dikêşan û niha jî dikêşîne. Ez ji wan hevalan cuda difikirim yên ku derbarê wê serdemê nirxandinên erênî dikin. Dewletên qenalên weşana bi Kurdî hene, weşanên wê hene. Mesele ne meseleya zimanî ye, dewlet dixwaze nasnameya Kurdî tune bike. Çand di pêvajoya demê teşe digire û ji cilûbergan bigire heta xwarinan li ser her tiştî xuya dibe. Niha dewlet me bi temamî ji van pêpar dihêle. Dewletê polîtîkaya xwe ya înkar, asîmîlasyon û mişextiyê ya berdewam heye. Van bîst salên dawiyê zêde tiştek neguherî. Belê, nispeten hinek başbûn hene lê di mantixa qedexeyê da guherîneke mezin çênebû…*

**Ş7:** *Wek kesekî ku ji salên 1990î û vir ve bi hunerê ve eleqedar dikarim bêjim hunera bi Kurdî herdem bi mecbûrî li bin sîya siyasetê hate birêvebirin. Reform jî, vebûnên serdema 'Pêvajoya Çareseriyê' jî bi siyasetê ve têkildar bûn. Ji ber ku huner bi siyasete re ev qas ji nêz ve girêdayî ye, ew nîşan dide ku huner ji palpişteke hiqûqî û makezagonî dûr e. Em behsa welatekî wisa dikin ku walîyek an jî qeymeqamek dikare bi însîyatîfa xwe lîstikekê nede lîstin. Di 'Pêvajoya Çareseriyê' da şaredariyên hinek bajarên rojavayê em pêşwazî dikirin û cih jî didan. Lê niha newêrin silav jî bidin. Wek tiştekî gelek tirsnak tête dîtin. Ez dixwazim Shakespeare bi Kurdî bilîzim, lê bifikirin ku salonekê peyda nakim lê bilîzim. Ew ditirsim.*

**Ş8:** *Ji ber ku ziman û çanda Kurdan hatiye qedexekirin, ji bo hunermendên Kurd huner herdem bûye hunera berxwedanê ku roniya xwe dide ser hebûna Kurdan a înkarkirî. Ji tevgerên berxwedanê yên Ewrûpî bigire heta tecrûbeya Yekîtiya Sovyetê mînakên wisa hene ku huner bo xizmeta îdeolojî û têkoşînê hatiye îcrakirin. Lewma derfet çênebûye ku li xwe vegere û nêrîneke rexneyî derbirîne li ser xwe û herwisa nerîtên cuda geşe nedane. Em li navbera zordariya dewletê û otosansûra xwe asê mane. Heke 'Pêvajoya Çareseriyê' piçeke din dewam bikira û piçeke din em pêşve biçûna, ew ê tesîra xwe hebûya li ser hunera Kurdî û bi min li nav Kurdan ji aliye hunerî ve dê piranîparêzî dest pê bikira. Niha şanogeriya bi Kurdî heye lê şanogeriya Kurdan nîne. Ji ber ku me polîtîkayeke neteweyî ya hunerî nîne. Jixwe siyaseta Tirkîye'yê jî rê nade vê yekê. Li Fransayê li ser mêtînkariya li Cezayîrê fîlm têne kêşan, lîstik tên lîstin, lê kesek bi wan miameleya xayîntiyê an jî endamtîya rêxistinê nake. Ew li nav sînorên rexneya hunerî têne dîtin. Lê li Tirkîyeyê mirov nikare tiştekî wisa bifikire. Înkara dewletê te dide zorê da ku hunera berxwedanê îcra bikî. Ew jî li ser hilberîna hunerî sînorên xwe ferz dike.*

**Ş12:** *Siyaset ji destpêkê heta niha hêmaneke sereke ye ku bandorê li hunera Kurdî dike. Lewma bayê siyasî û şertên îcra-*

*kirina hunera Kurdî ji nêzik ve têkildar in. Ew rewş zordariyeke mezin e li ser hunermendên Kurd. Li cihekî mesele dibe parastina xweseriya hunerê. Ji gotina we zêdetir lê dinerin ka tu girêdayî kû derê yî. Ev yeke ziyaneke mezin dide geşedana hunerê. Lê hevalên me jî, saziyên me jî hewldanên we yên xweseriyê baş nabînin û bi çavê gumanê lê dinêrin. Dibe ku ambargoyê deynin ser mirov. Ev cihê acizî û xemgînîyê ye û gelek ziyandar e ji bo geşedana hunera Kurdî. Di 'Pêvajoya Çareseriyê' da piçeke din azadî hebû lê dewlet li ser her karê me bi guman e. Gava destûr dide jî bi temamî dixwaze bizane ka tu çi dikî? Bo mînak, polîs dihatine lîstika me. Wergera lîstikan dixwestin. Me jî wergera têkûz didayê. Hem li metnê dinêriyan hem ji lîstik temaşe dikir ka em guharîna têda dikin yan nakin. Carekê lîstikvan dibêje 'em jî dixwazin Kurdistanê azad bikin'. Ew di eslê xwe tîpekî neyînî ye ku bi sloganan diaxive. Lê polîs qeyda lîstikê temaşe dike û bi ser sehneyê da digire. Ew hevalê me 40 rojan li girtîgehê ma. Me got herin wergêrê sondxwarî bînin, bila metnê lîstikê ew ji we ra rave bike. Lê heke wergêrê sondwarî bînê, ew ê zimanî bi awayekî fermî nas bike, lewma nayîne. Ew bi xwe werdigerînin. Dadwer jî li hevalê me nihêrî… got vî tenê slogan avêtine, cizayê wê 40 roj nînin, ev gelek razaye û wî azad dike. Rojekê min ji polîsekî re got arşîva li ba we heye li ba me nîne, qet nebe arşîva xwe bi me re parve bikin. Bi rastî jî hemû lîstikên me li ba we hebûn. Di 'Pêvajoya Çareseriyê' da zêde polîs kom nedibûn li pêşiya sehneyê, lê niha komeke polîsan berhev dibin. Ma çi bûye law! Mirov ev çend polîsan bo şerekî naşîne. Ew rewş temaşevanan ditirsîne û sehmê diêxe dilê wan. Ew dibên ka gelo em hatin kû dere?*

**Ş11:** *Ez wisa bawer dikim ku hunera Kurdî bi çîroka her Kurdekî li vî welatî hemdem diherike. Lewma heke Kurd li vî welatî piçekê aram bin, huner jî hinekê aram dibe. Lê heke Kurd bixenikin, hunera wan jî dixeniqe. Heke rastîyê bixwazî, ewil ew rewş bandorê li ser hunerê dike. Eve 17 sal in şanogeriya bi Kurdî dikim û salên 1990î jî têda min gelek serdem bi çavên xwe dîtine. Salên 90î hinek hevalên me bi kostûmên*

*xwe ve hatine desteserkirin. Gava em niha lê dinêrin, em di sala 2020an da ne û hema bêja di rewşa wan sala da ne. Bi min çu ferq nîne ku yek bê desteserkirin an jî li ser lêpirsîn bê vekirin. Dibe ku tenê ji ber zimanê wê, ku Kurdî ye, li ser lîstikekê lêpirsînê vekin. Xuyabariya Kurdîyê li nav civakê wan aciz dike. Ew qedexe û astengî hemû jî rê li ser me digirin ku em debara xwe bi hunerê bikin. Pêvajoya Rewşa Awarte û li ser wê jî rewşa pandemîyê karê bi zortir kirin. Ez hewl didim bi lîstikvaniyê debara xwe bikim, lê malbata min jî alîkariya aborî dide min. Piştevana min a herî mezin jî hevjîna min e. Ew hem hevakariya dide hunera min jî hem jî jiyana min a rojane.*

**Ş10:** *Ez nikarim bêjim ku hemû pirsgirêk çareser bûne, lê 'Pêvajoya Çareseriyê' bi min tiştekî erênî bû. Gelek xwendekar derçûn ji navendên çandê yên wekî Cegerxwîn, Aram Tigran û Nûda. Wan hilberîna hunerî jî dikir. Heke wê pêvajoyê wisa berdewam bikira, pêşveçûneke mezin dê bibûya. Me li Wanê salona Şanoyên Dewletê jî bikar anî. Lê dûvra qayûm tayinkirin, ew navend hemû hatine girtin. Fêrkar û hunermand ji kar avêtin. Xwendekar belav bûn. Wê serdemê çend caran ew wernegirtine bajarên ku mîhrîcanên şanoyê lê hene. Sala 2018an em hemû hatine desteserkirin. Em nehatine girtin, lê pirsên wisa ji me kirin: Ma Şanoyên Dewletê têra we nakin? We çima ev koma şanoyê ava kir? Hûn çima şanoya bi Kurdî dikin? Negotin ka em ji ber çi tewanê hatine girtin, lê pirsên wan her tiştî zelal dikin. Em hatine berdan. Lê qedexeya çûna derveyî welat, îmzeya heftane felan li ser me ferz kirin.*

## Sansûr û Otosansûr

Beşdaran anîn ser ziman ku şidandinên li atmosfera siyasî û di wê pêvajoyê da rakirina keyfî û fîîla ya hiqûqê berê wan daye hindê ku ew di hilberînên xwe yên hunerî da otosansûrê pêk bînin. Berdewamî û berbelavîya otosansûrê, yek ji astengiyên herî mezin e li ber îfadekirina azadane ya hunerê. Astengkirina azadiya îfadeya hunerê ku rê dide vî cureyê sansûrê divêt yek ji binpêkirinên herî mezin bête dîtin.

**Ş3:** *Me lîstikek hebû, têda helbesteke polîtîk dihate xwendin. Em çûne bajarekî din, polîs hat go emê lîstika we qeyd bikin. Me jî ew helbest nexwend. Yan jî gava em hinek li kafeyên servekirî û parkên ku bo herkesi vekirî ne pêşkêşiyan dikin, em wekî pêşkêşiyên li salonê rehet nabin. Ji ber ku li der ve muheqeq qeydê digirin. Tu binêrî hemû jî 10 kom nînin ku şanogeriya bi Kurdî dikin. Lewma bi min divê me xwe biparêzin.*

**Ş2:** *Gelek cureyên cuda yên sansûrê hene. Li hisabên medyaya civakî dinêrin, li peyamên bi Kurdî dinêrin û li gor hindê helwestekê ava dikin. Sansûr wisa bi awayekî derqeydî tête tetbîqkirin ku nayê îspatkirin, lê em hemû encamên wê dibinin. Serlêdana ku bê sedem hatine redkirin, astengiyên berî lîstikê ku armanca wan astengkirina pêşkêşiya lîstikê ye, hemû jî di eslê xwe da cureyên sansûrê ne… Ji sala 2004an heya niha em li hember van cure sansûr û qedexeyan li ber xwe didin. Em wan bi raya giştî ra parve dikin û wan îfşa dikin, ji ber ku tenê wisa mirov dikare dîwarên aliyên din piçekê xerab bike yan jî ew wî derî li ber mirov vedikin.*
*Dîsa jî em naxwazin her car bi mijarên qedexe û sansûrê bêne rojevê. Lewma dikarim bêjim em otosansûrê dikin ku hemû binpêkirinên mafan bi çapemeniyê ra parve nekin.*

**Ş8:** *Helbet… me gelek sansûr li xwe kir. Em li sehneyên şaredariyê derdiketin, lewma wan bi xwe zordarî nedikir ku em sansûrê pêk bînin, lê me bi xwe sansûr dikir da ku serê me pê neêşe. Bo mînak me nedigot Kurdistan. Û li gor bajarê em diçûnê jî me replîkên xwe diguherandin.*

**Ş5:** *Ez derbarê otosansûrê da gelek hesas im. Hin tiştên wisa nînin ku ez bi taybetî xwe jê dûr bêxim, lê belê sîstemeke zordarî û astengkirinê ya nexuya û nenivîskî heye û wisa jî bandordar e ku mirov hin caran dibîne ku li ser hinek tiştan baldartir e. Ji ber ku di qanûnê da nayê nivîsîn ka bi rastî jî çi*

*qedexe ne. Û ji ber ku tiştên qedexe jixweber têne dîyarkirin, mirov dibêje 'gelo dibe ku ev jî qedexe be' û wisa xwe dibîne ku li şûna dewletê difikire. Bo mînak straneke dinivîsî bo lîstikê, dibînî ku li gotinên wê baldar î. Li stranan... an jî şêweyê pêşkeşiya lîstikê, wêneyên tên bikaranîn, mirov baldar dibe... anku bêyî we jî otosansûreke nîvênîv heye. Bi taybetî jî piştî 'Pêvajoya Çareseriyê' em li van tiştan bêtir baldar dibin.*

**Ş4:** *Gava ez miameleyeke astengker û cudakar dibînim, ji bilî hêrs û aciziyê, endîşeya min a sereke li ser pêşkêşiya lîstikê ye. Lewma hin caran dibînim ku ez her daxwaza wan bi cih tînim bo xatra hindê ku pêşkêşiya lîstikê asteng nekin, anku ez li gel wan nakevime nav nîqaşên li ser derhiqûqîya kiryarên wan. Lê hingê jî dikevî bin nîrê hindê ku derbarê her tiştê xwe da ewlehiyê agahdar bikî. Hingê jî mirovî didin zorê ku mirov ji nasnameya xwe ya polîtîk dûr bikeve... Gava hêzên ewlehiyê lîstikê bi qemereyê qeyd dikin, em nikarin gotinên jixweber bêjin yên ku parçeyek in ji lîstikê. Hinek otosansûrên me yên wisa biçûk hene. Bi taybetî em xwe jê didin paş ku peyva Kurdistanê bi lêv bikin. Bi taybetî jî gava em li Tirkîye'yê dilîzin, berpirsiyariyeke min heye li hember lîstikvan û koma teknîk. Divê ez wan biparêzim. Lewma, belê, em otosansûrê dikin.*

Ji beşdaran hate pirsîn ka bandora TRT 6/TRT KURDÎ û mîhrîcanên çand û hunerê yê rêvebiriyên herêmî yên di dest HADEP/HDP çi ye li ser xuyabariya şanoya Kurdî li nav civakê û meşrûbûna wan.

## Mîhrîcan û ji TRT 6'ê ber TRT KURDÎ'yê ve 'Vebûna' Kurdî ya Dewletê

Derheqê bandorên mîhrîcanan yên li ser şanoya bi Kurdî, piraniya beşdaran nirxandinên erênî anîn ser ziman. Digel hindê jî 5 beşdaran nêrîneke rexneyî destnîşan kirin. Wan beşdaran gotin ji ber kêmasiya hinek pîvanan ew ji bo festîvalan nehatine vexwandin û ew yek li ba wan bûye sedemê xemgîniyeke giran.

**Ş5:** *Bi raya min ya girîng nirxê hunerî yê karê we ye, lê ew*

*nayê wateyê hindê ku naveroka mijarên we jî bêqîmet e. Divê ew dengê xwe bigehînin jiyan, êş û hêvîyên gel. Min bi xwe bi çavekî neyînî li TRT 6'ê nenêrî. Di destpêkê da karên bi qelîte jî pêk anîn. Lê her ku diçû mîsyoneke wisa derxistin pêş ku Kurdan û Kurdîyê bi pergalê ve girê bidin. Wan êdî ji xizmetê bêtir ziyan dida ziman û çanda Kurdî.*

**Ş12:** *Wextê TRT 6 vebûyî, me şanoya xwe ya taybet ava kiribû. Em bûn yek ji komên ewil ku wê çav lê niqandî. Me jî di navbera xwe da nîqaş kir û biryar da ku nebin parçeyek ji wê. Ji bo me mesele ew e ku em bibin parçeyek ji avakirina hunera Kurdî. Helbet ziman parçeyek ji vê ye, lê ew hemû tişt nîne. Paşxaneyeke berfirehtir a çandî heye. Me di destpêkê da lîstikên werger jî nelîstin da ku em bikarin zimanekî rastîn ê şanoya bi Kurdî ava bikin. Me bi xwe metin ava kirin. Anku li gor me, her çi bête kirin divê bi havênê xwe, li ser ax û bingeha xwe, li ser karakterê xwe, li ser nirxê xwe yê folklorîk, li ser çanda xwe ya devkî, li ser her tiştê xwe, li nav lêgerîna xwe ya azadiyê teşe bigire û rabe ser xwe. Îroj herçend em azadtir nebin û ji aliyê sazûmanî ve bihêztir nebin jî, me gelek bêtir sermîyan bi dest xistiye. Li gor me divê mirov lê binêre ka saziyên wekî TRT 6 bi çi awayî zêdekariyê dikin li ser sermîyana we û geşedana we ya sazûmanî û wisa helwestekê nîşan bide… Binêrin gelek qenalên taybet vebûn… rêzefîlm hatine kêşan… pereyên mezin teklif kirin. Wan ziyanên mezin dane me. Gelek lîstikvanên me yên xwedan tecrûbe çûne wan deran û di karên nehunerî yên popûler da lîstin. Divê polîtîkayeke we çandê û endîşeyên sazûmaniyê hebin.*

**Ş15:** *TRT 6'ê rasterast bandor li ser me nekir, lê wek nîşaneya aramiya hewayê siyasî, wê li ser temaşevanan bandoreke erênî kir û wisa tîna wê gehişte me jî.*

**Ş13:** *Gava li hemberî Kurdan polîtîkayeke asîmîlasyonê ya berdewam hebe, bi ya min vebûna TRT6ê ji dil nebû. Li gor min divê dewlet derheqê polîtîkayên bere yên li ser çanda Kurdan*

*li xwe mikur were û di wê çarçoveyê da reformên berfirehtir bi cih bîne.*

**Ş14:** *Mantixeke wisa ya reforman heye. Bo mînak tu lîstikekê dinivîsî an jî dixwazî bo strana xwe klîbekî çêkî, heke ji kontrolên guncav derbas bibe hingê li TRT 6'ê tê weşandin, lê mirov nikare li qenaleke din a neteweyî an jî herêmî bide weşandin. Ev yeke di eslê xwe da nîşan dide ku qedexeya zimanî bi awayekî berdewam e. Dewlet we bi qenalekî sînordar dike. Platformên îstîfadekirina mafan jî ew bi xwe dîyar dike.*

**Ş2:** *Em her car li ser sansûra dewletê nîqaş dikin lê me bi xwe jî li qada xwe ya desthilatê sansûr pêk anîne. Em jî wekî dewletê hunereke yekreng dixwazin, wê li ser hunermendan ferz dikin. Ez wan kiryaran bi kêmbûna hişmendiya neteweyî ya li nav me girê didim. Heke em ev qas parçebûyî û li dij hev nedibûn. Saziyên Kurdan jî wekî dewletê, yê ne ji xwe veder dike, cih nadê.*

## PÊŞNIYAZÊN HUNERMENDAN DERBARÊ BERTEREFKIRINA BINPÊKIRINÊN MAFAN

Ji beşdaran hate pirsîn ka divê kîjan vesazkirin bêne bicihanîn û pêngavên çawa bêne avêtin da ku binpêkirinên mafan yên li astên cuda pêk neyên.

Hema bêje hemû hunermend derbarê paşerojê da xwedan nêrin û hestên reşbîn in. Dîsa jî hemû hemfikir bûn ku israra li ser hunerê bi taybetî jî bo Kurdan tiştekî jêneger e.

Qismekî beşdaran rêzeke pêşniyazan kirin ji bo demokratîkbûneke giştî û avakirina dewleteke hiqûqî da ku Kurd îstîfadekirina ji mafên çandî garantî bikin li hember otorîteya civakî ku bi kiryar û polîtîkayên heyî ve di binpêkirina mafan da bikerê herî sereke ye.

Hinek hunermendan jî îfade kirin ku vesazkirinên qanûnî bi kêr nayên ji ber ku pirsgirêk ji bêstatûbûna siyasî û hiqûqî ya Kurdan der tên.

Hinek beşdaran din jî gotin divê li herêmên Kurdnîşîn otorîteya herêmî û saziyên çand û hunerê rasterast girêdayî Kurda bin. Li gor qismekî hunermandan jî divê otorîteyên civakî bêne azadkirin da ku huner û hunermend xwesariya xwe biparêzin. Herwisa wan gotin heke dewlet ji helwesta xwe ya astengker û qedekexeker vegere, hunermend dê bi awayekî azadtir bi guhdar û temaşevanan bêne ba hev û dê bikarin ji bazara serbest têra îcraya hunera xwe qezenca aborî bi dest bixin.

Dîsa hate îfadekirin heke saziyên navneteweyî hesastir bibin derbarê binpêkirina mafên qada çandê yên gelên wekî Kurdan ku nikarin ji mafên kêmîneyan jî îstîfade bikin, hingê di demeke nêz da nebe jî, di demên dûrtir da dewlet dê derbarê wan mafan da hesastir bin.

Herwisa hate dîyarkirin heke Tirkîye bête teşwîqkirin ji bo damezrandina polîtîkayên çandî yên ku li ber roniya nirxên demokratik hatibin amadekirin û negirêdayî konjonktûrê bin û dîsa heke ew derbarê aciziyên wî biwarî da bi berdewamî bête hişyarkirin, hingê otorîteyên civakî dê bêtir dil têda hebin bo sazkirina polîtîkayên wihareng.

Li gor beşdaran divê polîtîkayên çandî yên ku di navbera çanda Tirkî

û Kurdî da têkîliyeke pîleyî datînin, bêne terkkirin. Ji bo ku Kurdî di qada huner û çandê da bigehe cihê xwe yê heqkirî û pêş ve biçe, divê vesazkirinên qanûnî û pratîk bêne pêkanîn da ku Kurdî pêşdibistanê têda li hemû astên perwerdeyê bête bikaranîn.

Hemû beşdaran gotin divê pirsgirêkên hunermandên Kurd ên derbarê çalakî û mekanên îcraya hunera wan bêne çareserkirin. Herwisa li gor wan ji bo ku mafên telîfê baştir bêne parastin divê qanûnên derbarê saziyên pîşeyî wisa bêne sazkirin da ku mafê berhemên bi Kurdî jî bêne parastin.

Hunermendan gotin hewce ye di serî da konserwatûwara Kurdî, ji bo hemû qadên hunerê li zanîngehan beş bêne vekirin. Herwisa wan ji bo çalakiyên wekî mîhrîcan, bîanel û konserten ne tenê di asta ‘minakê’ da, lê belê temsîlîyeta bi beşdariya berfirehtir daxwaz kirine.

# NIRXANDIN Û PÊŞNIYAZ

Tirkiye'yê rapora bi sernavê *Cultural Policy in Turkey-National Report*[37] [Polîtîkaya Çandê li Tirkiyeyê-Rapora Neteweyî] sala 2013an radestî Konseya Ewrûpayê kiriye. Ew rapora ku di vê xebatê da jî hatiye behskirin bi helbesta Ahmed Arîf ya bi navê "Anadoluyum Ben" [Anadolî Me Ez] dest pê dike.[38] Berevajî wê destpêka bandordar, li beşa ewil ya 85 rûpelî ya raporê ku têda ji muzîkê bigire heta sinema, şano, bale û weşangeriyê behsa qadên çand û hunerê yên piştavankirî tête kirin, çu nişane nînin ku ew dewlemediya çandî ya li epîgrafê hatiye pejirandin.

Beşa raporê ya bi serenavê '*Pêngavên demokratikkirina qada perwerdeyê û berfirehkirina qada îstîfadekirina ji mafên çandê*' destnîşan dike ku bi zimanên ji bilî Tirkî jî destûra perwerdeyê heye.[39] Di wê beşê da tête gotin ku astengiyên li ber perwerde, weşan û xebatên akademîk yên bi zimanên ji bilî Tirkî hatine rakirin.[40] Li bin serenavekî din jî behsa îmkana perwerde û weşangeriya bi ziman û zaravayên cuda têtе kirin.[41] Li wir têtе nivîsîn ku bi hevkariya TRT û Walîtiya Dîyarbekirê albûmeke stranên bi Kurdî hatiye amadekirin.[42] Herwisa têtе nivîsîn ku sala 2003yan bi guherîneke li Qanûne Nifusê ve êdî hemwelatî dikarin bi dilê xwe navan danin ser zarokên xwe. Dîsa li ser daxwaza rêveberiyên herêmî û hemwelatiyan Wezareta Karên Navxweyî wek nîşaneya rêzgirtina kevneşopî, çanda herêmî û bîra civakî, navên gund, bajar û cihwaran diguherîne û navên wan yên kevin lê vedigerîne.[43] Li gor wê raporê sala 2012an Dîwana Me-

37 STEERING COMMITTEE FOR CULTURE, HERITAGE AND LANDSCAPE (CDCPP) CDCPP-Bu(2013)19, Strasbourg, 8 October 2013, 4th Meeting Of The Bureau Strasbourg, 16-17 October 2013; CULTURAL POLICY IN TURKEY – NATIONAL REPORT https://rm.coe.int/CoERMPublicCommonSearchServices/DisplayDCTMContent?documentId=09000016806963fd

38 B.n.b., 1. Ahmet Arîf îşkenceyên giran kêşane ji ber helbesta xwe ya bi navê 33 Gulle. Ew helbest behsa wan 33 Kurdan dike yên ku sala 1943an li Wanê, bêyî darazandin bi emrê General Muglali hatine gullebarankirin.

39 B.n.b., 87-88.

40 B.n.b., 88.

41 B.n.b., 88.

42 B.n.b., 89.

43 B.n.b., 89.

layê Cizîrî bi wergera Tirkî û faksîmîleya xwe tête weşandin.[44] Dîsa li gor raporê destûra hînbûn û hînkirina bi zimanê ji bilî Tirkî, anku zimanên 'zindî' heye û ji bo xebatên akademîk ên bi wan zimanan enstîtû hatine vekirin û bi wan zimanên dersên hilbijartî tên dayîn.

Gava mirov li rûpelên raporê yên ku behsa proje û berhemên ku ji aliyê Wezareta Çandê piştevaniya wan hatiye kirin dinêre, dibînê ku ji bilî albûmeke bi Kurdî û çend pirtûkên bi Kurdî ku bi awayekî sembolik piştevaniya wan hatiye kirin, hema beje hemû piştevanî ji bo berhem û projeyên çand û hunera Tirkî hatine terxankirin.

Sînorên polîtîkaya nû ya çandê ya dewletê herî baş li qismê derbarê vezaskirinên li ser şanoyê diyar dibin. Ewil tête diyarkirin ku temsîlkirina curbicuriya çandê ya welatî li ser milên Şanoyên Dewletê ye, dûvra dest nîşan dike ku heyama 2009-2010ê lîstika Orhan Asena ya bi navê 'Ölümü Yaşamak [Jîna Mirinê]'[45] ku têda diyalog û zêmarên bi Kurdî hene bi mebesta temsîlkirina *jiyana çandî û kevneşopî ya civata herêmî (local people)* hatiye pêşkêşkirin û hem civata herêmî hem jî li asta neteweyî eleqeyeke mezin dîtiye.[46] Piştî hingê 'bajarên wekî Semsûr, Agirî, Çewlîk, Betlîs, Erzîngan, Colemêrg, Îdir, Qers, Mêrdîn, Mûş, Sêrt, Şernex, Rihan, û Dêrsim ku lê lîstikên Şanoya Dewletê têne lîstin' wekî herêmên paşdamayî hatine destnîşankirin û bal kişandiye ser performansên li wan deran.[47]

Îfadeyên wekî 'gelê herêmî', 'çanda herêmî' nîşaneya zimanê serdest e ku ya neteweyî û ya ne neteweyî/ ya herêmî di heman demê da bi awayekî pîleyî înşa dike. Hilberîna hunerî ya bi Kurdî li şûna ku wekî çandeke neteweyî bête destnîşankirin, wekî çand û hunereke herêmî têtê binavkirin ku têda dîyalogên ji zimanê herêmî hene. Di raporê da ji bo temsîla şanoya Kurdî lîstikeke bi navê 'Jîna Mirinê' hatiye hilbijartin ku mijara wê xwîndarî ye ku li hinek cihan dîyalogên bi Kurdî hene. Ji ber ku ew lîstik wekî yeka wisa hatiye pênasekirin ku çanda kevneşopî temsil dike, bêyî ku navê wê bi lêv bike, çanda Kurdî bi xwîndariyê ve wekhev dike. Ew helwest nîşaneya polîtîkaya medenîker û asîmîlasyonkar ya dewletê ye li hember Kurdan û erdnîgariya Kurdan ji ber ku erdnîgariya Kurdan wekî

44 B.n.b., 93.
45 Lîstikan Jîna Mirinê, behsa xwîndariyê û tehrîba wê diku û sala 1982yan hatiye nivîsîn.
46 National Report..., op.cit., 94.
47 B.n.b., 94.

*herêma ji aliye çandê ve paşdamayî* tête pênasekirin û ji bilî vê lîstikê, lîstikên lê têne lîstin hemû jî lîstikên bi Tirkî yên Şanoyên Dewletê ne. Wek ku di hevdîtinên li gel şanogeran da hatiye behskirin, ev rewş kiryarên li hember daxwazên sehneyan ji Şanoyên Dewletê bo lîstikên Kurdî zelaltir dike.

Di raporê da Sazî û Dezgehên Dewletî, Rêveberiyên Herêmî û Saziyên Civaka Sivîl wek saziyên hevpar hatine pênasekirin ji bo hilberîn û pêkanîna polîtîkayên hunerî.[48] Digel hindê jî Saziyên Civaka Sivîl û rêveberiyên herêmî li derveyî pêvajoya diyarkirina polîtîkaya çandê mane. *Rapora Polîtîkaya Çandê ya Tirkîyeyê bi Çavê Civaka Sivîl* ya ku ji aliyê Zanîngeha İstanbul Bilgi ve sala 2011an hatiye amadekirin rexneyê li wê helwesta polîtîkaya çandê ya fermî digire ku civaka sivîl û rêveberiyên herêmî li der ve dihêle. Herwisa wê raporê, çarçoveyeke giştî bo raporeke piralî, hevpar diyar kiriye û di wî warî da valahiyek dagirtiye. Dîsa jî nêrîna polîtîkaya fermî ya çandê ji aliyê hemû saziyên sivîl ve bi heman awayî nehatiye nirxandin.

Ew helwesta ku di rapora dewletê da hatiye qebûlkirin, tenê nêrîna otorîteyên fermî nîne. Herwisa diyar e ku saziyên sivîl ên ku li Tirkîyeyê çand û hunerê bi rêve dibin jî li ser heman nêrînê ne û wê dipejirînin. Raporên Weqfa Çand û Hunerê ya Stenbolê (WÇHS) ku saziyeke sivîl ya girîng e ji vî aliyî ve eleqeyekê heq dikin. Rapora WÇHS ya bi navê *Jinûvefikirîna Perwerdeya Hunerê li Tirkîye'yê*[49] li qismê ewil amaje bi van herdu belgeyan heye: Daxuyaniya Navneteweyî ya Curbicuriya Çandê ya UNESCO'yê ya ku sala 2001an da hatiye qebulkirin; Rapora Global ya Venêrîna bo Herkesê Perwerde (EFA) ya ku bi salane tête weşandin. Li ser wan amajeyan li gor rapora WÇHS 'divê perwerdeya hunerê çarçoveyeke guncav pêşkêş bike ji bo hînbûna têgehên wekî curbicuriya çandê û dîyaloga navberçandî yên ku li ser demokrasi û mafên mirovan ava dibin.'[50]

Her bi heman şiklî di rapora WÇHS'ê da ku sala 2018an bi serenavê *Bihevrajiyan: Pêşvebirina Piranîparêziya Çandê bi Rêya Hunerê*[51] hatiye amadekirin, tête îfadekirin ku pêla koçê ya ji Sûriyeyê dê bibe sedemê hinek pirsgirêkên çandî û mirov dikare wan pirsgirêkan bi rêya polîtîkayên

48 B.n.b., 11.
49 IKSV, Türkiye'de Sanat Eğitimini (Yeniden) Düşünmek, Aralık 2014.
50 A.g.e., 19.
51 IKSV, Birlikte Yaşamak: Kültürel Çoğulculuğu Sanat Yoluyla Geliştirmek, Haz. Dr. Feyzi Baban. ve Dr. Kim Rygiel.

çandê yên li ser bingeha rêzika wekheviyê ya bihevrejiyanê avabûyî careser bike. Herwisa di raporê da li ser acîlîyeta diyarkirina rêyên avakirina wan polîtîkayên çandê tê rawestan û tête destnîşankirin ku ew rapor bi wê baweriyê hatiye amadekirin ku pêwendiyên bi taybetî bi rêya çand û hunerê têne avakirin dê rê bidin aîdîyetên nû di navbera gelên binecih û yên nûhatî da.[52] Herçend hatiye destnîşankirin ku raporê wek metnê bingehîn pala xwe daye Peymana Parastin û Pêşvebirina Curbicuriya Îfadeyên Çandî ya UNESCO'yê, dîsa jî di raporê da ji bilî Tirkan, behsa çu gel û çandên din nayê kirin. [53]

Raporên WÇHS'ê yên bi serenavên *Pêşniyaz ji bo Kiryarên Hunerê li Qada Civakî ya Stenbolê, 2011; Plansaziya Çandî ji bo Rêveberiyên Herêmî, 2016; Bihevrejiyan: Pêşvebirina Curbicuriya Çandî bi Rêya Hunerê, Tîrmeh, 2018* û *Ji Zarokatiya Ewil Heya Ciwaniyê bi Hunerê Mezinbûn, Cotmeh 2018* xwedî nêrînên hemareng in û analîz li ser qebûla hindê hatine kirin ku qada huner û çandê li kêleka zimanên Ewrûpî tenê bi Tirkî ye.

Li ser wan raporan cihê Kurdan aşkere dibe di polîtîkaya çand û hunerê ya dewlet û saziyên derveyî dewletê da. Divê mirov li ser bifikire ku dewlet li rapora xwe ya ku me bi awayekî gelemperî nirxand jî nabe xwedan û herwisa nabe xwedanê vesazkirinên qanûnî yên roja îro jî.

Lewma di wê peywendê da:

Di encama xebatê da hatiye tesbîtkirin ku hunermendan binpêkirinên mafan dîtine ji ber ku dewletê qewlê xwe yê piştevaniya huner û hunermendan bi cih neaniye û qanûn bi kêfa xwe hatine tetbîqkirin.

Polîtîkaya çandê ya Komara Tirkîye'yê nîşan dide ku ew hêj gelek dûr e ji avakirina demokrasiyeke çandî ku li qada civakî mafê xweîfadekirinê bide çandên ji bilî çanda Tirkî. Qadên lê destûra xweîfadekirinê hatiye dayîn tenê qadên wekî TRT6/TRT KURDÎ ne ku bi temamî li bin kontrola dewletê da ne.

Derbarê temînkirina mekan, sehne û piştevaniya aborî bo hunera Kurdî da dewletê helwesteke cudakar daye ber xwe û rêya hunermendên Kurd asê kiriye ku ji çavkaniyê dewletê îstîfade bikin. Ew astengî nîşan didin ku dewlet xwedan polîtîkayeke çandî ya wisa nîne ku hunera Kurdî nas bike û geşedana wê bo xwe bike armanç.

52 B.n.b., r.10.

53 B.n.b.., r.12.

Ji ber ku dewlet bi refleksên netewe-dewletê polîtîkaya hunerê ava dike, gelek cihên wekî weqfên taybet, saziyên çandê hwd. ku li nav wê polîtîkayê bi cih dibin jî polîtîkaya fermî ya hunerê dipejirînin. Zanîngeh, medya û Saziyên Sivîl bi awayekî aşkere haydar in ji nêrîna dewletê ya li ser Kurdan û gelên din, li ser kêmîneyan û komên din ên etnîk. Lewma ew deriyên xwe ji hunara Kurdî ra digirin û hunera Kurdî tune dihesibînin. Gelek kesên ku hunera bi Kurdî nakin lê xwe wekî Kurd pênase dikin, li wan sazîyan – saziyên medyayê, zanîngeh û Saziyên Sivîl- bi israr wekî 'hunermendên Tirk' têne pênasekirin. Ew jî mînaka heman nêrînê ye. Ew saziyên derveyî dewletî, bi gotara dewletê û atmosfera siyasî ra hevaheng tevdigerin. Ew sazî daxwazên hunermendên Kur li gor wê nêrînê dinirxînin, hin caran bi hinek hincetan red dikin, pir caran jî bêdeng dimînin û pûte pê nadin.

Dewlet ji bikaranîna şîdetê bigire heta îstîsmara aborî her cure binpêkirinên ku ji aliye hêzên ewlehiyê û hemwelatiyên sivîl ve têne kirin ciza nake, ew yek helwesteke din a otorîteyên civakî ye ku di biwara hunera bi Kurdî da binpêkirina mafan teşwîq dike. Mirov dikare wê miafbûna ji cizakirinê wekî nîşaneya helwesta cudakar binirxîne ya ku hunermendên Kurd wekî hemwelatiyên wekhev ên xwedan maf nabîne. Dewlet bi wê kiryara xwe ve qewlê xwe yê nekirina cudakariyî bin pê dike ku hem ji belgeyên neteweyî hem jî ji yên navneteweyî wergirtiye ser milên xwe.

Qedexeya cudakariyê mafekî bingehîn e, lewma divê Tirkîye hemû îhtirazên xwe yên li ser belgeyên navneteweyî rake. Ji ber ku ew îhtiraz li dijî ruhê wan peymanan e.

Diyar bûye ku hunermend pir caran otosansûrê pêk tînin li hember kiryarên cudakar û keyfî da ku astengiyeke hiqûqî nebînin.

Hunermend xwedan wan şert û mercên aborî nînin ku hunera xwe bi azadî îfade bikin, lewma ew berê xwe didin karên derveyî hunerê da ku debara xwe pê bikin. Ew jî bandoreke neyînî dike li ser hunermendên Kurd bo avakirina nasnameyeke hunermendekî azad. Berbelaviya wê rewşê li nav hunermendên ku hunera xwe bi Kurdî îcra dikin nîşan dide ku dewlet li hember hunermendên Kurd xala 64em ya Makezagonê û biryarên piştevaniya huner û hunermendan ku li *Biryara Tembîyê ya UNESCO'yê Derbarê Parastina Statûya Hunermendan* tête destnîşankirin, bi awayekî aşkere îhlal dike.

Roja îro ku bi Kurdî strîna stranan û lîstina lîstikên şanoyê neqedexe ye, nêrînên keyfî yên hêzên ewlehiyê û saziyên rêvebir hunermendên Kurd neçar dihêlin ji ber ku jixwe ew bêpar in ji têkoşîna fermî ya lêgerîna mafan. Hunermend xwedan wan şert û mercên aborî nînin ji bo têkoşîna hiqûqî, herwisa saziyên wan yên pîşeyî jî nînin ji bo lêgerîna mafan bi awayekî girseyî.

Reformên piştî salên 2000î û "Pêvajoya Çareseriyê" nîşan da ku gava qedexe û astengiyên li ser bikaranîna zimanê Kurdî li qada civakî rabûn, hingê dêûbav berê zarokên xwe bi rehettir didin çalakiyên bi hunerê ve eleqedar.

Berevajiyê nêrîna fermî ya ku dibêje Kurd hemwelatiyên wekhev in li Tirkîye'yê polîtîkayeke perwerdeyê ku ziman û çanda Tirkî dike navend û polîtîkayeke çandê ku berhem û çalakiyên hunera bi Tirkî dike navend têne tetbîqkirin, piştevaniya wan tête kirin û têne pejirandin. Lewma digel vesazkirinên qanûnî jî di fiîliyatê da îstîfadekirina ji wan mafan tête astengkirin, li ser kesên ku asteng dikin çu kiryar nayên pêkanîn û kiryarên li dij qanûnan bêcizakirî dimînin.

Vesazkirinên piştî sala 2000î di pêvajoya hevahengiya YE'yê da hatine pêkanîn bandoreke erênî kirin li ser nêrîna hunermend û malbatan a îcrakirina hunera bi Kurdî. Herwisa vekirina qenala televîzyonê ya fermî û beşên perwerdeya bi Kurdî li zanîngehan di serdema wekî 'Pêvajoya Çareseriyê' tête binavkirin, rewşeke qanûnî da zimanê Kurdî, wê yekê jî bandoreke erênî hebû li ser helwesten malbat û hunermendan. Wekî ku di hevdîtinan da xuya bû, di wê pevajoyê da hinek malbatan bi xwe berê zarokên xwe dane navendên perwerdeya hunera bi Kurdî. Qismekî hunermendên ku salên 2000î hunera xwe îcra dikirin, li wan saziyan perwerde wergirtiye. Dîsa jî hewla krîmînalîzekirina çalakiyên çand û hunerê yên ku li derveyî kontrola dewletê dimînin, dike armanç ku destkeftiyên wê qadê berteref bike. Bo mînak di serdema Rewşa Awarte da qayûm danene ser hemû yekîneyên çand û hunere yên şaredariyan û hema bêje li hemû saziyên çalakiyên çand û hunera bi Kurdî bi wî şiklî îcraya hunera bi Kurdî bi awayê fiîlî hema bêje hate rakirin.

- Divê ev xalên li jêr bêne bicihanîn da ku mafên hunermendên ku muzîk û şanoya bi Kurdî îcra dikin bêne parastin û binpêkirinên mafan bi temamî bene bertereflkirin:

- Di hunerên wekî muzîk û şanoyê da ku deng û ziman di navendê da ye divê perwerdeya bi zimanên dayikê yê îcrakarên hunerê û mixatabên hunerê bikeve bin garantîya makezagonî û divê pergela perwerdeyê demildest li gor wê bête nûvejenkirin. Ji ber ku zarokên Kurd bi zimanê xwe yê dayikê perwerde nabin, 'mafê perwerdeye bi zimanê dayikê' ku mefekî bingehîn e, tête binpêkirin û zarokên Kurd ji zimanên xwe tên dûrxistin. Di paşerojê da îcrakarên hunera bi Kurdî hebin jî ji ber ku girseya ku bi vî zimanî diaxive dê gelek kêm bimîne, hingê çu wateya wê namîne ku mirov bi Kurdî muzîkê na jî şanoyê îcra bike.
- Divê ji pirtûkên dersan îfadeyên vederker û heqretamîz ên derbarê gelên cuda û komên dînî bêne derxistin. Divê mifredatek li ser bingeha piranîparêziya çandî bête tetbîqkirin.

Divê vesazkirinên derbarê naskirina Kurdî û bikaranîna wê di qada civakî li Makezagonê bêne bicihkirin da ku ew vesazkirin bikevin bin temînata Makezagonî. Temînata Makezagonî şert e ji ber ku mafên qanûnî dibe ku dîsa bi rêya qanûnê jê bêne stendin.

- Digel vesazkirinên makezagonî û qanûnî divê hinek vesazkirinên wisa bêne bicihanîn ku li ser hin sazî û rexistinan cihdana hunera bi Kurdî ferz dike. Divê ew vesazkirin bi polîtîkayeke hunerê ya pirçandî û ligel hunermendan bêne bicihkirin.
- Divê li Şanoyên Dewletê, Şanoyên Bajêr û navendên çandê yên girêdayî dewlet û şaredariyan cihekî berfireh bête dayîn ji bo hunera Kurdî û hunermêndên Kurd. Dîvê li ser wan bête ferzkirin ku di bernameyên xwe yên salane da cih bidin lîstik, konsert û çalakiyên hwd.
- Divê di serî da hêzên ewlehîyê, hemû rayedarên îdarî yên ku bi tevgerên xwe yên keyfî ve li dijî vesazkirinên qanûnî û peymanên navneteweyî yên ku armanca wan parastina rêzikên cîhanî ye, bêne agahdarkirin, heke hewce be perwerdeyên navxweyî bêne dayîn bo wan.
- Divê li ser rayedarên dewletê yên ku li dijî qanûnan bi awayekî keyfî ve mafên îcrakarên muzîk û şanoya Kurdî bin pê dikin, lêpirsîna qanûnî bête vekirin. Herwisa divê derheqê kesên din ên binpêkar kiryarên pêximker bêne tetbîqkirin.
- Divê para hunermendên Kurd ya ji bûdçeya huner û hunermendan wekhev be. Divê Wezareta Perwerdeyê bêyî cudakarî piştevaniyê bide muzîk, şano û sinemaya Kurdî. Divê Şanoyên Bajêr û Şanoyên Dewletê hemû sehneyên xwe vekin bo lîstikên Kurdî.

- Divê vesazkirinên derbarê hunera bi Kurdî ne wekî parçeyek ji pêvajoyên siyasî yên weki 'pêvajoya hevahengiyê' û 'Pêvajoya Çareseriyê' lê wekî mafekî bingehîn bêne dîtin û bicihkirin.
- Divê hunera bi Kurdî daxilî mifredata perwerdeya her astê bibe. Divê li dersên muzîkê yên xwendingehên seretayî û navîn cih bidin agahiyên derbarê muzîka Kurdî. Divê li Beşên Hunerên Ciwan ên Zaningeh û Konserwatûwaran beşên muzîk û şanoya Kurdî bêne vekirin. Ev vesazkirinên bi vî şiklî li akademiyê berê hunermendên Kurd vedike û girseya ku Kurdî bigehê mezintir dike.
- Divê saziyên navneteweyî erkên xwe yên venêrîn û hişmendkariyê bi awayekî bandordartir bi cih bînin. Divê bête zanîn ku guherînên qanûnî bi tena serê xwe têra îstîfadekirina ji mafan nakin. Raporkirin di vî warî da gelek girîng in, divê hejmara wan zêde bibe û ew bêne berbelavkirin.
- Îcrakarên hunara Kurdî yên ku nikarin ji dewletê têra xwe alîkariya aborî wergirin, herwisa ji alîkariyê Zanîngeh, Şaredarî û Saziyên Sivîl jî bêpar dimînin. Ew hunermendên ku ji bo xebatên xwe li çavkaniyên aborî digerin ji saziyên alîkariyê yên navneteweyî jî têne vederkirin bi hinceta ne 'profesyonelî' û 'pêparbûna ji piştevaniya saziyî'. Divê ji bo îcrakarên hunera bi Kurdî fonên cuda yên navneteweyî bêne veqetandin. Divê di serî şaredarî hemû sazî çalakiyên wekî mîhrîcan, bîanel, pêşengeh hwd. li dar bixe da ku xuyabariya zimanê Kurdî û hunera bi Kurdî li nav civakê zêdetir bibe. Divê naveroka wan bi temamî ji aliyên hunermendan bêne amadekirin û midaxeleya dewletê û saziyên civakî têde nebe.

**ME DI DIL DA HEYE NAREK KU DISOJIT SEQERÊ**

XEBATEK DERBARÊ BINPÊKIRINA MAFÊN HUNERMENDÊN KURD LI SER MÎNAKA MUZÎKJEN Û ŞANOGERAN

İSMAİL BEŞİKCİ VAKFI